



K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**TEKNÎKA DUBAREKIRINÊ DI AVAKIRINA
RÎTMA NAVXWEYÎ YA HELBESTÊN
KAMÎRAN BEDIRXANÎ DE
-DÎWANA *DILÊ KURÊN MIN* WEK NIMÛNE-**

HARIWAN MOHAMMED AHMED

15711019

Şêwirmend

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Mêrdîn 2017

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**TEKNÎKA DUBAREKIRINÊ DI AVAKIRINA
RÎTMA NAVXWEYÎ YA HELBESTÊN
KAMÎRAN BEDIRXANÎ DE
-DÎWANA *DILÊ KURÊN MIN* WEK NIMÛNE-**

HARIWAN MOHAMMED AHMED

15711019

Şêwirmend

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Mêrdîn 2017

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Teknîka Dubarekirinê di Avakirina Rîtma Navxweyî ya Helbestên Kamîran Bedirxanî de Dîwana *Dilê Kurên Min* wek Nimûne” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

HARIWAN MOHAMMED AHMED

KABUL VE ONAY

Hariwan Mohammed AHMED tarafından hazırlanan “eknîka Dubarekirinê di Avakirina Rîtma Navxweyî ya Helbestên Kamîran Bedirxanî de Dîwana *Dilê Kurên Min* wek Nimûne” adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihi tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

Doç.Dr. Abdurrahman ADAK

Doç. Dr. Refik SULAIMAN

Yrd.Doç.Dr. Osman ASLANOĞLU

PÊŞGOTIN

Teknîka dubarekrinê di helbestê da alaveke karîger û girîng e, çunkî ev teknîk bi şêwazekê hunerî beşdariyê di dirustkirina piraniya regezên avakirina helbestê de dike. Dubarekrin di nav helbestê de gelek raman û watayên cuda cuda bi helbestê dibexşe, karîgeriyê li ser hest û derûna xwandevanî dike, lewre me jî viyaye em dubarekrinê bikin mijara babeta xwe da ku seng û hêza wê di nav helbestên dîwana *Dilê Kurên Min* ya helbestvan Kamîran Bedirxanî dê aşkera bikin. Sebaret destnîşankirina vê dîwanê bo wê çendê vedigere ku helbestvanî bi endazeyeke ciwan teknîka dubarekrinê di nav helbestên vê dîwanê de bi kar anîye û rîtma navxweyî bi hêzeke mezin afirandiyê, ku wate helbestvanî piraniya teknîkên dubarekrinê di nav dîwana xwe de berceste kirine, awaz û zengeke xweş xistiye di nav helbestên vê dîwanê de.

Dema nivîsîna vê tezê de gelek heval û mamostayan alîkarî dane min, loma li vir ferz e ez spasîyê bo wan bikim. Ji dil spasîya serperşîtêxwe (Doç.Dr. Rafik Suleiman, dikim, ku bi têbinî û zanyariyên xwe teza min dewlemend bû. Spas bo P.H.D. Şêrzad Sebrî 'Elî ji bo alîkariya di wergêrên jêderên biyanî de. Spas bo P.H.D. Ebu 'Ubîd 'Ebdula Ziyab ji bo dabînkirina jêderan. Spas bo mamostayên hêja D. Nî'metula Hamid Nihêlî, D. Mes'ud Cemîl, D. Huda 'Ebdulqadir, M. Kamîran Mişextî. Spas bo her du hevalên hêja Luqman Ferîq û Beyar Necîb. Sipas bo Enstîtuya Kurdî li Zanîngeha Mêrdînê, ku ez weke qutabiyê masterê wergirtim. Sipas bo Prof. Ebdilwehab Xalid bo alîkariyê.

KURTE

Ev vekolîna me ya bi navê “Teknîka Dubarekirinê di Avakirina Rîtma Navxweyî ya Helbestên Kamîran Bedirxanî de Dîwana *Dilê Kurên Min* wek Nimûne” girîngiyê di biwarekî ta radeyekî vala di nav edebiyat û rexneya edebî ya kurdî de dide. Ew jî dubarekirin e, dubarekirin weke teknîkeke avakirina rîtmê di nav hemû helbestan de. Ev vekolîna me hatiye dabeşkirin li ser sê beşan, di beşên yekem û duyem de me bi teoriyê behsa rîtmê û erkê wê di nav helbestê de, her wisa me bi şêweyekî berfireh behsa rîtma navxweyî û dubarkirinê kiriye. Di beşa sêyem de teknîka dubarekirinê di avakirina rîtma navxwe ya vê dîwanê de me şîrove kiriye û pratîk kiriye, li dumahîkê jî em gihîştine çendîn encaman ku helbestvanî bi desthelîya xwe û serbora xwe ya hunerî şiyaye sud û mifayê ji piranîya teknîka dubarekirinê wergire û di helbestên vê dîwanê de berceste bike mîna dubarekrina fonîman, peyvan, risteyan, dubarekirina bazineyî û ya dengvedanê.

Peyvên Sereke: *Dilê Kurên Min*, Kamîran Bedirxan, helbest, rîtim, dubarekirin.

ÖZET

“Kamîran Bedirxan’ın *Dilê Kurên Min* Adlı Divanındaki Şiirlerinde İç Ritmin Oluşturulmasında Tekrar Tekniği” adlı bu çalışma, Kürt edebiyatı ve eleştirisi alanında pek çalışılmamış bir konu olan şiirde iç ritmin oluşturulmasında tekrar tekniğini işlemektedir. Bu çalışma üç bölümden oluşmaktadır. Birinci ve ikinci bölümlerde ritim, şiirde ritmin işlevi, iç ritim ve tekrar tekniği kapsamlı bir şekilde ele alınmıştır. Üçüncü bölümdeyse söz konusu şiirlerde iç ritmin oluşturulmasında kullanılan tekrar teknikleri incelenmiş ve yorumlanmıştır. Bu çerçevede söz konusu şiirlerde şairin etkili bir şekilde fonemlerin, sözcüklerin, cümlelerin, tekrarlanması ve döngüsel tekrar ile yansımali tekrar tekniklerini kullandığı ortaya konmuştur.

Anahtar sözcükler: *Dilê Kurên Min*, Kamîran Bedirxan, şiir, ritim, tekrar tekniği.

ABSTRACT

This research paper titled “*Repetition technique in creating internal rhythem in Kameran Badirxan’s poetry, in his collection of poems ‘Dile Koren Min’ as an example*”. This research pays a special heed to the neglected field of use of rhythem in Kurdish literature, which is repetition technique. Repition as a rhythemic technique is found in general types of poetry, and adds artistic effects to the poetry. This research paper is divided into three sections. first and second sections is dedicated to the theoretical explanations of rhythem and its functions in poetry, and internal rhythem is elucidated as well. Additionally, it covers repition technique and its function in poetry in detail. In the third section, repetition technique in creating internal rhythem in this collection of poems is analyzed and investigated. Eventually, this paper reached some results, the poet intelligently and skillfully with his experience was able to benefit from repition technique and in his poems are embodied, such as repetition of “phonemes, morphemes, sentences, anaphoric, epistrophic”.

Key words: *Dilê Kurên Min*, Kamîran Bedirxan, poem, rhythm, repeat.

NAVEROK

PÊŞGOTIN	III
KURTE	IV
ÖZET	V
ABSTRACT	VI
NAVEROK	VII
KURTEBÊJE	2
DESTPÊK	3
I. GIRÎNGIYA VEKOLÎNÊ	3
II. EGERÊ HILBIJARTINA VEKOLÎNÊ	3
III. ARMANCA VEKOLÎNÊ	4
IV. RÊBAZA VEKOLÎNÊ	4
V. ARÎŞEYA VEKOLÎNÊ	4
VI. PEYKERÊ VEKOLÎNÊ	4
1. BEŞA YEKEM	6
ÇARÇOVEYA TEORÎK	6
1.1. RÎTIM JI LAYENÊ ZARAVÎ VE	7
1.2. TÊGEHA RÎTMÊ	7
1.3. RÎTIM DI HELBESTÊ DE	15
1.4. ERKÊ RÎTMÊ DI NAV HELBESTÊ DE	24
1.5. TÊGEHÊ RÎTMA DEREKÎ	28
1.6. KÊŞ Û RÎTIM DI HELBESTA FOLKLORÎ DE	28
1.7. KÊŞ Û RÎTIM DI HELBESTA KLASÎKÎ YA KURDÎ DE	32
1.8. KÊŞ Û RÎTIM DI HELBESTA NÛ YA KURDÎ DE	35
1.9. TÊGHÊ RÎTMA NAVXWEYÎ	38
1.10. RÎTMA NAVXWEYÎ DI HEBESTÊ DA	40
2. BEŞA DUYEM	48
2.1. TÊGEHÊ DÛBAREKIRINÊ	49
2.2. DUBAREKIRIN DI HEIBSTÊ DA	50
2.3. ERKÊ DUBAREKIRINÊ DI NAV HELBESTÊ DE	60

3. BEŞA SÊYEM.....	67
TETBÎQA LI HELBESTAN.....	67
3.1. DUBAREKIRINA FONÎMAN	68
3.2. DUBAREKIRINA PEYVAN	78
3.3. DUBAREKIRINA RISTEYAN.....	94
3.4. DUBAREKIRINA BAZINEYÎ.....	100
3.5. DUBAREKIRINA DENGVEDANÊ	105
ENCAM.....	113
ÇAVKANÎ.....	Hata! Yer işareti tanımlanmamış.

KURTEBÊJE

r. rupel

weş. weşanxane

wer. wergêran

h.j. heman jêder

h. hijmar

DESTPÊK

Helbest yek ji janrên edebî yê herî kevn e, mirovên edîb penayê bo dibin da ku ewa di nax û derûnê wan de heye bi baştirîn şêwe derbirînê jê bikin û bigihîne xwendevanan. Ev janrê edebî bi rêya gelek regez û pêkhatayan tê afirandin. Yek ji wan regezan jî dubarekirin e. Dubarekirin binemayeke herî kara û karîger e di nav helbestan de, lewre helbestvan girîngiyeke yekcar mezin pê didin. Dubarekirinê buhayekî mezin û bêsinor heye di dirustbûna helbestan de. Helbestvan dema ku di vehandina helbestekê de hizir dikin, gelek bi hişyarî vî regezî di nav wê helbestê de bi kar tînin, çûnkî helbestvan baş dizanin ku bi rêya dubarekirinê helbesta wan dikare rastiya xwe û karîgeriya hunerî li ser xwendevanan dirust bike. Her wisa dubarekirin dê rîتما navxweyî di nav helbestê de berhem bîne. Rîtim jî mîna henaseyê ye hem bo helbestvanî û hem bo xwendevanan.

I. GIRÎNGIYA VEKOLÎNÊ

Rîtim weke Birbra her helbestekê di helbesta her neteweyekî de tê jimartin û senga sereke ya rîtmê dikeve li ser teknîka dubarekirinê, ango dubarekirinê roleke sereke di her helbestekê de digire, nexasim di helbestên nû de, çûnkî piraniya helbestvanan piştbesteke yekser li ser teknîka dubarekirinê dikin.

Sereray girîngiya teknîka dubarekirinê di helbestê de, belku weke pêdivî di vekolînên akademî yê kurdî de pûte pê nehatiye dayîn, lewre me bi ferz dît vê vekolînê li dor teknîka dubarekirinê encam bidin.

II. EGERÊ HILBIJARTINA VEKOLÎNÊ

Egerê hilbijartina vê navûnîşanê bo wê çendê vedigire da ku em jêdereke pêdivî û girîng li dor teknîka dubarekirinê daynin li ber destê xwendevan û vekolerên kurd. Dîsa bi dîtina me sereray zîqî û diyariya vê teknîkê di helbestên

dîwana *Dilê Kurên Min* de, lê ta niha jî vekolîneke bi vî cureyî li ser nehatiye encamdan. Bi hêviya wê çendê ku ev vekolîn bibe dergehê bo vekolînên piştî vê vekolînê bèn encamdan. Her wesana egerên helbijartina evî helbestvanî û dîwana wî ew bû ku şewaz û staylê evê dîwanê gelek yê cidaye ji hebest û dîwanên hevçaxên xwe, ji ber evê çendê me ev dîwane kire mijara babetê xwe.

III. ARMANCA VEKOLÎNÊ

Armanca vê vekolîna me ew ku em bizanin teknîka dubarekirinê bi hemû cureyên xwe ve çî karîgerî li ser layenê rîtmî navxwe ya dîwana *Dilê Kurên Min* de kiriye, her wisa teknîka dubarekirinê çî karîgerî li ser layenê delalî û wateyî yê vê dîwanê kiriye.

IV. RÊBAZA VEKOLÎNÊ

Ji bo encamdana vê vekolînê me her du rêbazên *wesfî* û *şirovekerî* bi kar aniyê. Jiber ku siruştê evê vekolîna me di xazîte evê çendê lewra mejî rêbaza *wesfî* û *şirovekerî* bi kar înaî ne.

V. ARÎŞEYA VEKOLÎNÊ

Her karê ku mirov encam bide dê hinek arîşe derkevin pêşiya mirov, nexasim eger mirov wî karî bi şeweyekî sade û sakar wernegire. Dema nivîsîna vê vekolînê hinek arîşe bo me peyda bûn, mîna kêmbûna jêderên taybet bi babetên me ve bi zimanê kurdî, her wisa hinek şaşî hebûn di çapa vê dîwanê de.

VI. PEYKERÊ VEKOLÎNÊ

Ev vekolîna me ji destpêkekê û sê beşan pêk hatiye. Di beşa yekê de me bi dirêjî behsa zarav û têgeha rîtmê kiriye. Her wisa me behsa erkê rîtmê di helbestê de kiriye û rîtim di helbesta folklorî, klasîkî û nû de me daye nasîn. Di beşa duyem de rîtmî navxweyî me bi têrûteselî behs kiriye, her di vê beşê de me behsa dubarekirinê

û erkê wê di helbestê de kiriye. Di beşa sêyem de alav û teknîka dubarekirinê li ser dîwana *Dilê Kurên Min* hatiye praktîzekirin. Li dumahîkê jî em gihîştine çendin encaman.



1. BEŐA YEKEM

ÇARÇOVEYA TEORÎK



1.1. RÎTIM JI LAYENÊ ZARAVÎ VE

Binekok û nîjada peyva rîtmê vedigere bo Grîkîyên Kevin“ Peyva rîtim ji peyva rhythmos grîkîya hatye, ewşî Ji karê rheim Hatîye dariştin ko ramana zan, bilqdan, rabûna rûbarî di det.”⁽¹⁾ Di zimanê erebî de zaravaya , îqa', li hember zaravaya *rhythm* a îngilîzî tê bikaranîn.⁽²⁾ Ew jî ji peyva eltuqî' hatîye. Mebest jê cureyekî birêveçûna bilez e ku bo pirtir ronkirinê ereb dibêjin: Weq'e elrecil Wate bilez birêveçûn.⁽³⁾ Di nav edebiyat û rexneya kurdî de ji bilî zaravaya *rhythm* a îngilîzî çendîn zaravayên dîtir tên bikaranîn, mîna zaravayên tirpe, awaz, musîqa, îqa'. Ev zarava jî di çendîn pirtûkan de berceste bûne. Ebdalirzaq Bîmar di pirtûka xwe de ewa bi navê *Kêş û Musîqay Helbestî Kurdî* peyva *tirpe* li hember zaraveya îqa',ya erebî bikar aniye⁽⁴⁾ û di pirtûka *Şêwazî Şî'rî Goran* de peyva *awaz* bo rîtmê hatiye bikaranîn.⁽⁵⁾ Ji layê xwe ve Hisîn Xazî di teza xwe ya doktorayê de ya bi navê “Rewtî Nwêkirdinewey Şî'rî Kurdî le Başûrî Kurdistan” peyva *musîqa* li şûna rîtmê bikaranîye.⁽⁶⁾ Nivîskar Arif Hîto dema ku pirtûka *Tîwra Wêjeyî* ya Ustin Warrîn û Rîne Wellek wergerandîye ser zimanê kurdî, peyva *îqa'* li şûna zaravaya rîtmê bi kar aniye.⁽⁷⁾ Ev yek wê çendê diselmîne ku heta niha jî di nav rexneya kurdî de zaraveyeke destnîşankirî nîne ku vekoler û rexnegirên kurd li şûna zaraveya *rhythm* a îngilîzî, bi kar bînin.

1.2. TÊGEHA RÎTMÊ

Rexnegirên edebî û zanayan bi gelek şeweyan behsa têgeha rîtmê kirine. Her yekî jî li dîv pisporîya karê xwe têgeha rîtmê daye nasandin. Serbarî wê çendê jî ku

¹ Ezîz, Gerdî, *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî û Berawirkirdinewey legel 'Erûzî 'Erebî û Kêşî Şî'rî Farsî da-Lêkulîneweyekî Şîkarî Berawirde*, Çapxaney Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr 1999, r. 71.

² Mibark Mibark, *m'cim almusteilhat elelsinisyê, dar alifkir ellbnanî, bîrut*, 1995,255.

³ Fehîma Îsma'îl, *Rîtim Dinavbera Hunerî û Jyanê da*, govara peyv, Êketiya Nivîserên Kurd Tayê Dihokê, h. 23, 2002, r.65.

⁴ Bdalirzaq Bîmar, *Kêş u Mosîqay Helbestî Kurdî*, çapxaney dar alhiryê, Bixdad,1992, r.6.

⁵ pexşan 'elî Ehmed, *Şêwazî Şî'rî Goran*, weş.Melbendî Kurdolocî, çapxaney Renc, Slîmanî, 2009, r. 55.

⁶ Husên Xazî Kak Emîn, *Nwêkirdinewey Şî'rî Kurdî le salî 1932-1949 le Kurdistanî 'Îraqda*, weş.nawendî blawkirdinewey Hewlêr, çapxaney rojhlat, Hewlêr, 2008, r. 87.

⁷ Ustin Warîn û Rînî Wêlîk, *tîwrya wêjeyî*, wer: 'arf hîto, ji weş. Êketiya Nvîserên Kurd Tayê Dhokî, Çapxana Hawar, Dihok, 2008,r.227.

rîtim di piranîya diyardeyên siruştî û nesiruştî de heye û regezeke karîger û hevpişk e ku dişê hebûna xwe di nav hemû huneran de biselmîne. Ev çende ye bûye egera hindê ku têgeha rîtmê ji wan têgehên aloz û temumjawî bin, heta vê rojê rexnegir û zana neşiyane têgeha rîtmê di çarçoveyêke destnîşankirî de pêname bikin. Lewre her ji berê de zana û filesopan giringîyeke mezin daye rîtmê.

Zana û fîlesofên kevin rîtim bi bizav û livînê ve girê dida. Platon dibêje: Rîtim bi frîna balinda û lêdana demaran û pêngavên semayê û birgên axiftnê ve grêd ddet.⁽⁸⁾ Bi buhurîna çendîn sedeyan jî her zanayan rîtim ji bo livînê vegeandîye di serdema nû de rîtim bû cihê girîngpêdana zana û filesopan. Derûnnasê Elmanî Funtî rîtim bo birêveçûnê vegeand jî layê xwe ve. Buşerî jî rîtim ji bo livînên leşî vegeand û gelekên di rîtmê bi qanûna livînê siruştî dizanin.⁽⁹⁾ Ku wate rîtim dişê serederîkirinê ligel gişt bîyavan bike û bibe regezeke cêgîr di nav gewherên bîyavên curbicur de. “ Rîtim di hemî bîyavên jîyanê de wêneyekê hestê karîger peyda diket, ew jî ji egerê zivrin û dûbarebûna lêkhatin û guncandinê ye, yan ne guncan bo haletekî, yan navendeka bi hêz bo watayê yan jî livînên wê dyar dibin, di rastyê da rîtim çîye, coreke ji corên êkbûnê, çunkî bo damezrandin û berêxodana her livînek û awaz û axiftneka dîyar krî di zmanî da bi kar dihêt.”⁽¹⁰⁾ Arîsto dibêje: Rîtim xerîzeke siruştî ye li cem mirovan.⁽¹¹⁾ Dema rîtim li cem mirovî bibe tiştê xerîzî, wê demê hemû kiryarên mirovî yê asayî dibin rîtim, ango pêkhatiya mirovî li ser rîtmeke rêxistî kar dike, lewre mirov giyandarekî rîtmî ye. Hemû kiryarên wî yê fîzyolojîk bi rengekî hişk dewrî ne, dilên me di haletên asayî de bi şeweyekî rêxistî xwe dikutin, ango xwîn di nav laşê me de li dîv rîtmeke rêxistî tê û diçe. Em henasê di haletê asayî de bi rengekî rîtmî encam didin û kêşan û berdanê bi rêxistneke hişk encam didin. Bi gotineke di oksicîn bi şeweyekî rîtimdar diçe di nav sihên me de.⁽¹²⁾ Ev pêname cextiyê li ser wê çendê dike ku mirov bi xwe di bin

⁸ Ebdilxefur el-Neîme, *el-RÎBAD el-MUQEDES BEYNE EL MUZÎQ WE SEÎR* micle elqelem eded 5 1998, r.92

⁹ H.j., r. 91.

¹⁰ Azad Ehmed Mehmûd, *Bunyatî Ziman le Şîrî Hawçerxî Kurdî da*, (çapa2), weş. Ekadîmyay Kurdî, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr 2012, r. 74.

¹¹ Eristu Talîs, fen alş'r, tircme: 'bdalirhmin bduy, altib'e alsanye, dar alpqafe, Bîrut, 1973, r. 13.

¹² S.M.Bundî, *li dûr Rîtmê*, wer. ji Rusî: 'Ebdî Hacî, wer. ji 'Erebî: Mis'ud Cemîl, weş. çap û belavkirinê li Dihokî, çapxana parêzgeha Dihokê, Dihok, 2013, r. 43.

karîgeriya rîtmê de ye, rîtim wekî sîtafkê ye û nayê dûrxistin ji mirovî û ne ji hîç tiştekî li ser rêkxistinê kar bike, ango rîtim sîbera rasteqîneya regezên rêkxistî yên livok e. “Rîtim pêkhatyêke reha ye, lewre lêdanên dilê me, birêveçûna me, lidûhev hatina şev û rojan, guherîna werzan, zîvirîna heyvê li dora erdê û ya erdê li dora hetavê bi şêweyên rîtmî ne. Rîtim li vir dubarekirineke rêkxistî ye bo erk û çalakîyên mirovî û siruştî.”⁽¹³⁾ Di hemî wêneyên jîyanê de rîtim elementeke sereke ye. Li vir hêdî hêdî em nêzîkî wê rastîyê dibin ku em bi tiştên derdora xwe ve di bazineyêke rîtmî de dijîn. Rîmî Wellek Ustin Warrîn di pirtûka *Tîwra Wêjeyî* de têgeha rîtmê di diyardeyên siruştî û nesiruştî de berceste dikin: Siruştê rîtma xwe heye û karkirinê jî rîtma xwe heye, îşaretên ronahîyê jî rîtma xwe heye, her wisa muzîkê jî rîtma xwe heye, ligel wê yekê wateya mecazî jî rîtim bo hunerên şêwekarî heye.”⁽¹⁴⁾ Van her du rexnegiran gelek bi şarezayane têgeha rîtmê daye nasîn, ji ber ku bi şêweyekî hûr serederî ligel pêkhatyê rîtmê kirîye. Di *Ferhenga Zaraveyên Edebî Erebi* de rîtim bi vî awayî hatîye pênasekirin: Rîtim lidûhev hatinek e di navbera du tiştan de wekî deng û bêdeng, ronahî û tarîfî, livîn û rawestan, hêz û bêhêzî, kurt û dirêj, lez û hêdîtî... Rîtim pêwendîyek e di navbera parçeyek û parçeyekî dîtir de, yan di navbera parçe û gişt parçeyên dîtir ên berhemên hunerî û edebî de. Ev çende jî bi şêweyekî livok û rêkxistî yê şêwazê edebî yan di ruxsara hunerî de dirust dibe... Helbestvan bi çend rêyan piştbestinê li ser dikin, yek ji wan rêyan jî dubarekirin e.”⁽¹⁵⁾ Ev pênase tekezîyê li ser wê çendê dike ku dubarekirin binwaşê sereke yê dirustibûna rîtmê ye. Rexneya rojavayî ya nû bo wê yekê diçe ku têgeha rîtmê tekezîyê li ser hindê dike ku “rîtim haletêk e ya girêdayî bizavê ye, zêdebarî wê çendê ya taybet e bi gişt rûberê tekstî ve ne ku bi tenê beşekê jê.”⁽¹⁶⁾ Eger di bîyavê şîrovekirina rîtma hunerî de layenek yan parçek jê bê firamoşkirin, wê demê dê lengî û sistî bikeve di wê vekolînê de “rîtim û têgeha wê dûvhevhatina

¹³ S'îd Aluertî, loxe *Alş'ri Al'rbî Alhedis* (muqamatha alnifsye û taqatha alîbda'î, aldeb'e alsalie, dar alnehse al'ribye lltîba'e û alneşir, bîrut, 1984, r. 159.

¹⁴ Ustin Warîn û Rînye Wîlk, *Nezerye Eledeb*, tircme: Mihî Aldîn Êbhî, alimclis all'î lir'aye alifnun û aladb û al'lum electuma'ye, dimeşq, 1973, r. 212.

¹⁵ Micdî Wehbe û kamil Elmuhendis, *M'cim Almustelhat Al'erbîye* fî alulxetî û Aledeb, eltib'e alsanye, mekteb libnan, bîrut, 1984, r. 71.

¹⁶ Mes'ud Weqad, cemalyat elteşkîl elîqa'ye fî ş'r 'bdilwehab elbeyatî, dîrase fî elcizur elcemalye lîlîqa', etruhe Diktura, Kulye el-Adab, Cam'e Elhac Lîxzir Batîne, 2011, r.25.

regezên wekhev û dirust bi xwe ve digire, ev jî taybetmendiyeke e ji taybetmendiyeke prosa rîtmê.”⁽¹⁷⁾ Ji layê xwe ve nivîskar Mihemed 'Yaşî têgeha rîtmê li ser sê bizavan dabeş kirîye:⁽¹⁸⁾

1- Bizava wêjeyî, mebest jê helbest e.

2- Bizava dengî, mebest jê muzîk e.

3- Bizava lerizînê, mebest jê sema ye.

Rîtim di teoriyaa hunerên bînraw de jî tê bikaranîn û watayêke wêneyî heye, dûbarebûna li pey hev a regezên wêneyî di tabloyan de çarçoveya dîtinê, rîtma dîtinê pêk tînin.⁽¹⁹⁾ Huner bi hemî liqên xwe ve di çarçoveyêke rêkxistinê de kar û xebata xwe dike, angî rîtma vî karî dê bîte eger ku huner her dem bimîne ew regeza karîger li ser mirovî, lewre armanc û mebesta hunerî gihandina xweşî û estetîkê ye bo mirovî. “Di nav hemû karên hunerî de, rêkxistinek û lihevhatinek heye. Ev lihevhatin, xweşî û ciwanîya karê hunerî ye û bandora xwe li ser hestên mirovî dike. Ji ber ku karê hunerî navlerya mirovî û xwezayê de dike, girîngîya naveroka wê jî afrandina lihevhatinê ye. Bi wateya yekgirtina di navbera mirovî û xwezayî de, mirov tiştêkî diafirîne. Ev yekgirtin, dibe ku di karekî de yan di bizavekê de dîyar bibe. Her karekî jî di her demê de divê xwedî armanc be. Yekgirtin dîtineke di cih de ye, rêkxistin e di pîvan û bûnê de. Lê dema em ji aliyê demê ve lê binêrin, weke karekî dibe bizaveke lihevhatî yan rîtmek ji bo pirtir eşkere be, dema bizaveke şewekarî wêneyekî taybet dîyar bike, rîtim dê bibe regezê yekem.”⁽²⁰⁾ Di bîyavê muzîkê de jî rîtim “ew karabûn e, ewa hêmayên bigor dide jîyanê ku ev jî di pêvajoya wê de derbirînen muzîkê dirust dîkin.”⁽²¹⁾ Mêjûnivîs wisa hizir dîkin ku

¹⁷ Yurîrî Lutuman, Tihlîl el-Nnes elş'ri, *Mihad Elneqdi, Tircime*: Mihimîd Ahmid Fituh, eltib'e ula, elnadî eledebî elsqafî, cide, 1999, r. 95.

¹⁸ Mihemed al'yaşî, neserye îqa' alş'ri al'rbî, elimtib'e al'êrye, tunis, 1976, r.40.

¹⁹ 'bdilmecîd Hsînî Zade, *Mebanî Hunirhay Tecisimî*, qisimit ewl, şirkî çap kitabhay dersî îran, Tihran, 1382. r. 156.

²⁰ Fehmî Balayî, *Rîtim di Helbest û Şewekaryê Da*, govava havîbûn, h. 18, ji navenda havîbûn ya lêkulîn û weşanên kurdî li Berlîn der di kevî, 2007, r. 202-203.

²¹ Kemal Ebu Dîb, *fî albinye aîqa'ye fî alş'ri al'rebî*, neheu bedîl cîjrî l'rus alxilîl û miqdme fî 'lim alimqarin, altib'e alsanye, dar al'lim alimelayîn, Bîrut, 1981, r. 231.

muzîk ji rîtmê dest pê kiriye.⁽²²⁾ Bi derbirîneke dîtir “ Rîtim berî muzîkê û helbestê dihêt.”⁽²³⁾ Rîtmê, her dem karîgeriya xwe heye bo aramkirina derûna mirovan. Ev karîgerî dibe egera wê çendê ku mirov her dem hizra bizava bi destvehanîna çêja rîtmê bike, “rîtim roleke karîger û girîng li ser mejî û derûna mirovan dike.”⁽²⁴⁾ Rîtim sînoran derbas dike dema diçe di nav bîyavê karê hunerî de. “Dema ku em hest bi dîyardeya rîtmê dikin, bi tenê em kela xwe aram nakin, bi rengêkî ta ku di xew de biçin û arezû bi tenê berê me nade encamdana bizavên rîtmî. Belê, ya girîng di hunerê de tiştêkî dî ye; dema ku ev rîtim giyanên me dihejîne, em hest bi hemî hîrkarîyên vê kiryara rêkxistî dikin, ya ku kartêkirinê li me dike, ya bi zehmet e dema guherîna nerêkxistî û nerîtmî ya dangan em bişên lezâtî û hêdîtîya dangan ji hev cuda bikin, pêdivîyê em bi hûrî girîngîyê bi hindêk dengên bihêztir bidin, da ku guherînên dikevin tê de dîyar bibin. Hesta rîtmî ya asayî ya mirovî bi rengêkî hûr û nazik bi hemî lereyan karîger dibe.”⁽²⁵⁾ Ev boçûn rastîya wê çendê dupat dike ku rîtim di gewherê xwe de vejîneke bêsînor dide karên hemû huneran ku nivîskar û hunermend çu caran neşên di nav pîşeya karê xwe de rîtmê feramoş bikin. “Rîtim rêkxistneke muzîkî ya ciwan e... Helbestvan û hunermend pêşkêş dikin, da ku razmendîyeke piledar di nav me de peyda bikin, ew dengvedaneke rastexwe ye ji bo helçûna helbestvanî bi ezmûna xwe, di darêtineke berz de.”⁽²⁶⁾ Ku wate rîtim bi têgeha xwe ya hunerî ve binemayeke wijdanî ye ku di derûnî de dirust dibe û tê wênekirin. Her wesa serkeftin e di navbera du semtên hevdij de, ew jî giranî û sivikî ye. Ev jî binereta bizavê ye, ku sîstemeke rêkxistî ye berev wê çendê tê arastekirin.⁽²⁷⁾ Ji ber vê çendê hunermend piştbestineke mezin dike ser rîtmê da ku pileyeke serincrakêş pêşkêşî xwînerî û bînerî bikin, ango rîtim di bîyavê karîgeriya hunerî de hevbend e bi pêwendiya di navbera parçeyekî û parçeyekî dîtir ve. Ev ji layekî ve, ji layekî dîtir ve parçe û hemî parçeyên dî pêkve girê dide.⁽²⁸⁾

²² Enwer Qeredaxî, *Îqa' û Jîyan*, govara karwan, h. 64, çapxaney (dar elhirye) Bexdad, 1988, r. 73.

²³ Azad Ehmed Mehmûd, h.b, r. 82.

²⁴ 'Bdalqadir Eburîşe û Hesên Lafî Qîzeq, *Metxil îla tihlîl alnes aledebî, teb'e arab'e*, dar alfikir, 'man, 2008, r. 82.

²⁵ S.m.bundî, h. b, r. 46-47.

²⁶ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî û Praktîk Vekulîneke Di Byavê Hozanê da*, weş. dezgehê spîrêz, Dihok, çapxana Hacî Haşm, Hewlêr, 2007, r. 196.

²⁷ Mihemed al'yaşî, *Neserye Îqa' Alş'ri Al'rbî, Elimtîb'e Al'êrye*, Tunis, 1976, r. 62.

²⁸ Azad Ehmed Mehmûd, h. b, r. 73.

Pêwendîyeke rastexwe di navbera rîtmê û mirovî de heye. Ev pêwendî pêwendîyeke xuristî ye, ango rîtim gelek nêzîkî mirovî ye û mirov bi xwe jî bi tamamî dikevin li jêr wizeya rîtmê. “Karîgeriya rîtmê li ser me gelek bihêz e, em bi şeweyekî yekser hest bi vê karîgeriyê dikin, ne ku bi alîkariya xeyalê, dîsa çawa em bi layê teknîka hunerî dikin, ne ku bi rêya hizra lojîkî... Bi alîkariya rîtmê hunermend (muzîkjen, şair, ekter) me ligel xwe dibin, kontrolê li ser lêdanên dilên me dikin, ku hêdîtir yan bileztir xwe biqutin.”⁽²⁹⁾

Her wisa nimûneyên sereke yê bikaranîna zanistîya peyva rîtimê di van xalan de dîyar dibin:⁽³⁰⁾

- 1- Li jêr lidûvhevhatina dîyardeyên ji layê curetîyê ve ji hev cuda gelek caran têgeha rîtmê (pirraniya caran di pirtûkên xwendinê de) di nav dubarekirina dewrî ya asayî de tê ixtîzalkirin. Pênaseya nimûneya vî cureyî jî ew e ku rîtm dubarekirin e bi rêya navbirên demên yeksan ên dîyardeyên yek watayî. Li vir peyva rîtimê berawrid ligel wateya wê ya berî niha hate sînorkirin. Li dîvê pênasayê bi tenê ew kiryar rîtmê vedigirin, ewên bi şeweyekî rêkxistî û rêkûpêk çêdibin, ewên siruştê wan pirtir asayî û dewriyetê bi xwe ve digirin, ango dubarekirina komeke dîyardeyên wek hev. Bi rastî kiryarên bi vî rengî dewrî yê rêkxistî, di hemî huneran de hene.
- 2- Karanîna bi vî rengî ya peyva rîtmê di zanistên din jî de heye. Ew karanîna merem jê bizaveke sade ya dewrî, belê ev têgeh bi hişyarî ji hesta yekser a mirovî tê cudakirin û wê ji sîmayê xweyetî bêbeş dîke. Lewre hinek caran peyva rîtim di fîzîk û fîzyolojî û zanistên hûr ên din jî de tê bikaranîn. Li vir ev peyv ligel bizavên dewrî yê nesta endamên navxwe yê mirovî digunçe, dîsa ligel dûvhevîya şev û roj û werzên salê û qonaxên guherîna heyvê û stêrkan ya guncaw e. Ji layekî dî ve ligel dûvhevhatina dewrî ya dengên pêlan li jêr sitrêseke (nibre) muzîkê (berovajî dûvhevhatina dewrî ya wê li dema qerebalixîyê)... digunçe, dibêjne evê hemiyê rîtim.

²⁹ S.m.Bundî, r. 46.

³⁰ h.j. r. 15-17.

3- Peyva rîtmê wateyeke dî jî heye, ew wateya em di karên nivîskî yên li dor hunera nîgarkêşiyê, zimanê hunermend, peykertaş û telarsazan de bibînin. Ji heman têgeha berbelav a vê peyvê, pisporên biwarê hunerê nîgarkêşiyê û li dîv rêkên xwe radibin bi guherîn û berfirehkirina wateya wê ta dumahîk rade, dîsa tê de parastin li ser sîmayê siruştî û rêkxistina regezên vê dîyardeyê dikin. Zêdebarî hindê, rîtmê her dem renekî hilçûna estetîkî ligel vê hestê heye.

4- Rîtmê têgeheke dî jî heye, ew têgeh piranîya caran em di nav karên zimanî da dibînin, di şîyan de ye em bibêjin ku ev têgeh li dîv naveroka ewê hevdij e ligel têgeha berî niha hatiye baskirin. Li vêr derê sîmayê yekane ye wesîfkerê vê têgehê, sîmayê rîtimî ye ye ku di bikaranîna hunerî ya zaraveya rîtmê de hatiye ladan. Merema zimannasan jî rîtmê rêkûpêkî û rêkxistna regezan nîne, dîsan hestkirina yekser a bi vê rêkxistinê jî nîne, belku dabeşkirina demî ya regezên jêkcuda ye (ji layê curetîyê ve), lewre merc nîne ev dabeşbûn û jêkcudabûn rêkxiste bin (rîtimdarbin) hemî dabeşkirinên regezan di demê de û hemî dabeşkirinên axiftinê û kiriyara axiftinê bi rîtim di hêne navkîrn.

Eger em bi nêrîneke zanistî berê xwe bidin têgeha rîtmê, yan vekolînê li ser têgeha rîtmê bikin, em ê bibînin ku cudahîyeke yekcar mezin heye di navbera wan bîyavên rîtimê di nav de tê bikaranîn. Ev çend xalên li xwarê hinek cudahî ne di navbera têgeha rîtmê di bîyavên cuda cuda tîn eşkerekirin:⁽³¹⁾

1- Rîtma xwe bi xwe ya nemebestdar: Di vî cureyê rîtmê de çî mebest û armanc nînin, belku cureyekî ji cureyên karîgeriyê, weku livînên (bendulê) û lêdanên demjimêran ...hwd.

³¹ Mihmed 'Iwan Salman, elîqa' fî ş'ri elhdase dîrase fî elîqa', dar el'lim û elyîman llnişir û eltuzî', el-Eskindirye, 2008, r. 15-16.

- 2- Rîtmê mebestdar ya hunerî: Regez û sîmayên vî cureyê rîtmê di nav bîyavên hunerî de eşkere dibin, weku helbest, muzîk, sema. Mebest û armanca vê rîtmê pêdana karîgerîyê û hilçûnê ye li ser derûna wergirî û guhdarî, ji ber ku ew di bineretê de derbirînê ji hest û sozan dike.

Ji layekî dî ve pêwendîya di navbera pêkhate û regezên van her du cureyan jî bi temamî ji hev cuda ne, ango her yek ji van rîtman li ser hinek mekanîzmayan tê afirandin:⁽³²⁾

- 1- pêwendî di navbera regezan de di cureyê yekê de dîyardeyê sade û sakar e, bi sanahî dişê bê pîvan, belê di cureyê duyan de pirtir pêkhatî, veşartî û aloz e.
- 2- peywendî di cureyê yekê de wisa guman tê de heye ku temamî ya hestiyar be, ji ber vê çendê mirov di têgihîştina wê de jêkudahîyan nabîne, belê pêwendî di cureyê duyan de, ya huşekî û hestî ye, belku hest bi tenê jî neşê têbigihê, lewre pêdivî bi şarazayî û rewşenbîrîyêke berfireh heye, ji ber vê çendê mirov di têgihîştin û çêja wê de ji hev cuda dibin.
- 3- peywendî di navbera regezên cureyê yekê de kêm ya rêkxistî ye belê pêwendî di navbera cureyê duyan de komkirinek e di navbera rêkxistina van regezan bi regez û rêkxistneke temam. Ji ber vê çendê bi zehmet e sîma û nîşanên rîtmê li dîv cureyê duyan bê destnîşankirin, çunkî peywendî di navbera pêkhate û regezên wê de bi sanahî nîne.

Ku wate rîtmê mebestdar a hunerî her dem faktoreke kara û zindî ye bo gihandina armancake dîyarkirî, ku ew jî zalbûn e li ser derûn û mejîyê xwendevanî û wergirî.

³² Mihimed 'Iwan Salman, h.b. r. 16.

1.3. RÎTIM DI HELBESTÊ DE

Rîtim di helbestê de bi binemayeke sereke ya helbestê tê zanîn û kar dike ji pêxemet bilindkirin û buhakirina gişt regezan di nav teksta helbestê de. Bê rîtim helbestê çi buhayên estetîkî û ciwanîyê namînin. Rîtm, zimanê helbestê diafrîne û wî zimanî dike zimanekî cuda ji zimanê asayî û zimanê rojane. Ev ziman dibe hilgirê wata û ramanên cuda cuda, guman tê de nîne ku yek ji wan amraz û rêkan ku bişê karîgerîyê li ser hest û sozên xwînerî bike; rîtm e. Lewre “rîtim çalakîya xwe ji guherîn û livînê di nav hemî arasteyan de werdigire û diçe di nav teksê edebî de, xwe di nav livîna pêkhateya wê de cîgir dike. Lewre mercê rîtmê yê sereke, li dûvhevhatin cihgirî ye. Binyatê rîtmê di helbestê de, parçeyek e nayê jêkvekrin di nav binyatê zimanî de, rîtma helbestê çalakî û livîna xwe ji pêwendiyên zimanî werdigire. Ew pêwendiyên watayê di nav binyata wê de nayê cudakirin, ji ber ku rîtim bizaveke tevgir e, lewre ew weku xwedîkekê ye ji bo dîyarkirina sîstema delalîyê ya tekstên curbicur.”⁽³³⁾ Ev pênase gelek gunca ye bo rîtma helbestê çunkî helbest bi hîç renekî renekî neşet xwe dir bixe ji berjengên rîtmê. Ew rîtma di nav helbestê de bercestebûyî bi hîç şeweyekî di nav janrên dî yên edebî de nayê dîtin, yan bi wê hêz û karîgerîyê di nav çî janrên edebî de eşkere nabe. “Gotara ş'ri bi rêkxistina xwe ya taybet û rêkûpêkîya xwe ji gotara pexşanê cuda dibe. Rîtma ku di gotara ş'rida tê hejmartin, bi binemayê vê rêkxistinê, bi renekî dî jî tê gotin ku ş'ri û gotara ş'ri xwedî sîmayeke taybet in ku dibêjinê rîtimkarî û ev sîma di gotara pexşanî û neş'ri de nayê dîtin.”⁽³⁴⁾ Rîtim regezeke kara ye, bo hemû janrên edebî belê, rêjeya bikaranîna wê di nav helbestê de gelek zaltir û pirtir e ji janrên dî yên edebî. Ev jî dabeşeke vebir e û bi hîç şeweyekî cihê gumanê nîne, çunkî helbest pirtir ji hemî janrên dî xwedî pêkhateya estetîkî ye. “ Rîtmê di hemî têksitên edebî da hebûna xwe heye, belê rade û pileyeya rîtmê ji janrekî bo janrekê dîtir di hêt gohrîn, bo nmûne : ew rîtma di helbestê da hey zor bi hêz tir û karîger tre ji ewê rîtma di nav pexşanê da hey, çunkî ew muzîka pexşanê hey ne êxsiyê di nav qalibekê dest nîşankirî da û yasaya pêkhatnê nîne, belê rîtma helbestê ya rêkxistîye

³³ N'metulla Hamd Nhêlî, h. b. r. 198.

³⁴ S.m.Bundî, h.b. r. 9.

û yasa û destûrê taybet bi xwe ve yê heyî.”⁽³⁵⁾ Ango helbest ji janrên dîtir ên edebî pirtir ya rêkxistî û guncaw e, ne ku bi wî pîverî ku helbest ya bendkirî be bi hindêk yasayên cêgîr ve, mebest jê ew e ku helbest bi rêya regezên xwe yên avaker pirtir ya rêkxistî û gunca ye. Rîtim bi gewher û gîyanê helbestê tê nasîn, helbestvan neşên çî caran helbestê biafirînin bê hebûna rîtmê. “ Rîtim regezekê mîkanîkyê rît nîne di duyvêhatna corên dengî bi sepînît, belku livîneka zîndî ye li ezmûna helbestê vedkolît, û li astê lvîna navekî de ya pêkhata helbestê kom ve dibît, û di astê dengyê ji derekî da rengvedana livîna ji navda jî brêtî ye ji ewê dinav êkdaçûna çalak û dahênerane,ku di nav regezên karê hunerî da ruyd det.”⁽³⁶⁾ Di nav helbestê de çendîn cureyên rîtmê hene, her cureyek ji wan rîtman hêz û kargîrîyeke mezin heye di avakirina temamîya binyatê teksta helbestê de. Bi van şeweyên li xwarê ev cureyê rîtmê tên polînkirin:⁽³⁷⁾

- 1- Muzîka ji derve wate 'erûz.
- 2- Muzîka rexî wate qafî ye û pît û her tiştêkê dî yê ku ewî erkî dibînît.
- 3- Muzîka navxoyî ku birêtî ye ji kumeka hevahinga, ku bi rêka beramber êk danana dij êkan (dengdar û bê deng) di helbestê da bi cih dihêt, herwesan hemî corên (cînasan) bi giştî paşmawên taybetin bi muzîka navxoya helbestê ne.
- 4- Muzîka me'newî mebest jê hemî ew peywendyên nihênî û veşartîne, ku di nav pêkhatên dû niv beytan da, yan jî beyteka helbestê da heye, ku brêka dijî êkan bi cih dihêt.

Ji layê xwe ve nivîska Şaho Se'îd di teza xwe ya masterê de rîtma helbestê bi ser sê cureyên û binyatan dabeş dîke, ew jî evên li xwarê ne.⁽³⁸⁾

- 1- Binyatê rîtma stûnî: Ev rîtim li dîv sîstemê klasîkî ye, ku li ser binemayê yekîtiya kêş û serwayê dirust dibe.

³⁵ Safye mihemed Ehmed, *Şewazî Şî're Kurdîyekanî Pîrbal Mehmûd*, weş.Yeketî Nûseranî Kurd Melbendî Giştî, çapxaney Roj helat, Hewlêr, 2014, r.43.

³⁶ 'ezîz Gerdî, kêşî şî'rî klasîkî kurdî û berawirkirdnewey legel 'erûzî 'erebî û kêşî şî'rî farsîda, r.77-78.

³⁷ Lihon Qadir 'Ebdulrehman, *Dwalîzmî Dijyek le Honrawe Lîrîkîyekanî Mewlanay Romî u Mewlewî Tawegozîda*, weş.nawendî roşenbîrî û hunerî endêşe, çapxaney rcayî, taran, 2014, r. 85-86.

³⁸ Şahu S'îd Fethla, *Delalat Elbîna Elîqa'î Fî Elş'r: Dîrase Muqarne Fî Eledeb El'rbî u Elfarsî u Elkurdî, Rîsale Macsîtir*, Kulye Elluxat, Cam'e Elsilîmanyê, 1999, r.17.

- 2- Binyatê rîtma serbest: Her wek ji navê wê dîyar e. Ev rîtm bi hîç şêweyekî naçe li jêr hîç yasayeke negor, bi derbirîneke dî ev cureyê rîtmê ne wekî rîtma stûnî ye, belku di nav wan helbestan de tê afirandin ewên destûrên beytî û dubeytî şikandin, her wisa pîtên wê helbestê ji dêrekê bo dêreke dî cuda û neyeksan bin, belê ya pabend e bi serwayê.
- 3- Binyatê rîtma vekirî: Ev cureyê rîtmê piştbestinê li ser rîtma navxweyî dike, ango naçe li jêr sîstemê cêgîr û pêşwext, ku wate ev cureyê rîtmê beşdarîyê nake di avakirina rîtma derekî de, belku senga wê rîtma navxwe ye.

Rîtim dibe taybetmendîyeke sereke bo helbestê, ev taybetmendî di rastiya xwe de ji siruştaya helbestê bi xwe bi destve tê, ev serbore pêdivî rêkên hestî ye ji bo bercestekirina hebûna wê.⁽³⁹⁾ Her wisa taybetmendîyên rîtmê di helbestê de gelek in, rexnegir û vekolerên edebî çendîn taybetmendî bo rîtma helbestê danîne.

Bi şêweyekî giştî ev çend xalên li xwarê çend taybetmendî ne ku girêdayî gewherê rîtma helbestê ne, ew jî:⁽⁴⁰⁾

- 1- Rîtim hêleke stûnî ye destpêka helbestê vedigirt û ta ku dumahîya helbestê vedikêşt, gişt hêlên asayî jî dibirîn.
- 2- Rîtim elementeke berze ye, li serformê dangan êşkere dibe.
- 3- Rîtim binemayeke tevger e, gişt teksta helbestê vedigire.
- 4- Rîtmê pêwendîyeke rastewxo bi demê û rawestîyanan ve heye.

Ev her çar taybetmendî bi rengekî giştî rîtma helbestê bi şêweyekî zanistî dîyar dikin, ku hindêk ji wan taybetmendîyan pêwendîyeke rastewxo bi rîtma derekî ve heye û hindêkên dîtir rîtim girê daye bi rûberê gişt helbestê ve.

³⁹ Seyd Elbihrawî, h.b, r. 109.

⁴⁰ Lewy Haşmî, *Felsefe Îqa' fî Elş'ri El'rbî, Etib'e Alulî*, elmuesise el'ribye lîldîrasat we elneşir, Bîrut, 2006, r. 25-26.

Rîtim di helbestê de, bo karabûna gişt pêkhatayên dîtir ên helbestê kar dike. Ji ber vê çendê rîtim bihêza karîgerîya helbestê tê nasîn (girîngtirîn taybetmendiyên rîtmê ku pirtirê wan amadebûn hebû, di dirustkirina bineretên destpêkî bo binyatê tekstî dahênerane, her wisa rîtim dibe regezeke estetîkî di karê edebî de ew jî wê demê em rîtmê bixin di nav bîyavê karî de, eger me temaşekerê ji rexên pêwendîya wê bi helbestê ve, taybetî rîtim tê hejmartin hêza helbestê ya sereke û wazeya wê ya bineretî).⁽⁴¹⁾ Rîtim di helbestê de ne tiştê hecu heye, belku helbest hêza xwe ya sereke ji rîtmê werdigire, rîtim bo helbestvanî baştirîn alav e bo layenê hest û soz û derbirînê û ev derbirîn bi rêya rîtmê rastewxo karîgerîya hunerî çalak dike ango helçûnên helbestvanî bi rêya afirandina rîtma helbestê tîne veguhestin bo xwendevanî (Muzîk helkulana derbirîna helbestê ye û ew bo helbestê ya havî nîne, çûnkî her gaveka peyvek di mêşî da peyda bi bît, muzîka wê li gel drust di bît, bi vî rengî muzîka helbestê çî ji derbirîna peyvê kêmtir nabî ji ber hindê lawazî ya muzîkê kêmtir û kurtî yeka zor bo derbirînê drust di ket, eve jî ji ber hindê ye ku muzîka helbestê ji derbirîna peyvê kêmtir tîne belkî ji ewê zêde tre jî, çûnkî muzîka helbestê ewê keş û heway drust di ket ewê ku hizi û wata têda der di kevî, û her muzîke sîbera hzir û sozdaryê di dete watayê û ew sîber di watayê da ji derûnî çalaktir dibî).⁽⁴²⁾ Ev pênasê pirtir layenê bihêzê rîtma helbestê bo me ronî û eşkere dike, bi derbirîneke dîtir (Di binert da muzîk ji helbestê ya xerîb nîne, yan bi serda hatîne çespanandin, yan ji hunerên dî hatîne xwastin, belku ew bi xwe dahênana derbirîna helbestê ye, çûnkî muzîka helbestê êk ji ewan amrazayê yê derbirînê ji nedyarî ya delaletan di ket ku peyv neşet derbirînê jê bi ket).⁽⁴³⁾ Ku wate rîtim di helbestê de (hijyan û pêlan di êxîte di nava tekstî de û berê peyvan vediguhêzîne rêrewekê destnîşankirî, da delaleteke destnîşankirî bide, nexasim eger bizanin niha ew dîtîni hatiye guhartin ku berê xwe bidin rîtmê wek paşkoeyê derveyî gotara helbestî, çûnkî teoriya helbestê wisa rîtmê vedikole wek binaxeyeke avaker bo

⁴¹ Mihemed Sabir Ebeyî, *Elqesyîde El'ribye Elhidîse Byîne Eldelalye u Elbinye Elîqa'ye*, minşurat îthad elkutab al'rib, Dmîşq, 2001, r.20.

⁴² pexşan 'elî Ehmed, *şêwazî şî'rî goran, weş.melbendî kurdolocî, çapxaney renc, slîmanî, 2009, r.54.*

⁴³ Erselan Payz Îsma'îl, *Sîmay Şî'rî Kurdî dway Raperîn (1992-2002) be nmûney şî'rekanî rojnamey kurdistanî nwê. weş. belawkirdnewey dezgay çap û pexşî Serdem, Slîmanî, 2002, r. 182.*

helbestê).⁽⁴⁴⁾ Belê eger rîتما helbestê derbirînê ji livîna derûniya helbestvanî û germîya wijdanî û helçûna wî derûnî bike, li vir pêdivî ye bo her serboreke helbestî rîtmeke taybet hebe, ku ligel bi rê ve biçê û ligel ya guncay be.⁽⁴⁵⁾ Ev boçûn wê çendê di selmînît ku her cureyekî helbestê rîتما wê ya cuda ye ji cureyekî dîtir, ev çende jî bi şêweyekê eşkere dihêt bercestekirin di nav gişt cureyên helbestê de.

Helbesta nû gelek pabend e bi derbirîna hizir û barûdoxê helbestvanîve pirtir ji cureyan dîtirên helbestê ji ber ku di helbesta nû de helbestvan bi gelek şêweyan dişê dahênanê di ruxsar û naveroka helbestê de bike (Bnaxê muzîka helbesta hevçerx, birêfî ye ji binyatê rîtmî yê taybet û bi barê hest û sozên helbestvanî da di hête grêdan, ev bare jî di wêneyekê helçunî da reng venadet, wekî di helbestên kevin da di hate dîtin, belku ev muzîke di wênekê tmam guncay da bi barê hest û sozên taybet deng veddet, û dibîte navendek daku xwandevan di qalibê hest û sozên xwe da bi gunçînît û bê arîşe di gel da berdewam bît, eve jî cwannasî ya pêkhata nuya muzîka helbestê ye, ku bi tmamî ji muzîka helbesta kevin ya cudaye, belê ev cudahî ye bo her êk ji ewan delaletê ji taybetmendî ya ewa di ket, lasengî û ne rêku pêkî îyê na gehînît, junke ka çawa muzîka helbestê di qesîda kevin da, xoşî û lezeteka taybetî ya xwe hebû, muzîka helbesta hevçerx jî, çêj û xoşî yeka taybeta xwe heye).⁽⁴⁶⁾ Helbestvan dema ku helbestê vedihîne wê rîtmê diafirîne, helbestvan bi wirdbînî rîtmê ji bo veguhestina haletên xwe yên dilînî û sozdarî û gihandina naverokê, girîngiyeke mezin dide rîtmê, rîtim di helbestê de bi yek ji edgarên şewazî tê nasîn.⁽⁴⁷⁾ Rîtim di helbestê de derbirîneke rasteqîne ye ji bo aramkirina naxê helbestvanî, her wisa bi alîkariya rîتما ku helbestê wergirtîye hest bi aramiya derûnê xwe dike (Rîtmê peywendî bi layenê derûnî yê mirovîve heye demê mirov helbesteka awazdar di xunîtin aramî û asuyê di dete mrovî û hestê mirovî di lvînît û mirov di çîte di nav helbestê da û mirovî nêzîkî wataya helbestê di ket).⁽⁴⁸⁾ Bi vê çendê wesa bo me eşkere dibe ku rîtim di helbestê de hem alavekî gunca ye ji bo

⁴⁴ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê Di Ş'ra Nûya Kurdî* da, (devera behdînan 1970- 1991). weş. dezgehê Sîprêz, Dihok, çapxana Hacî Haşm, Hewlêr, 2007, r. 15-16.

⁴⁵ Mistefa Suyf, *elusus elnefsye lîlbida' elfeinî fî elş'r xase, dar elm'arif, elqahîre*, 1959, r.7.

⁴⁶ Azad Ehmed Mehmûd , *bunyatî ziman le şî'rî hawçerxî kurdîda*, r.85.

⁴⁷ Sîma Dad, *ferhingî îstîlâhat edebî, çap pincim, întişarat mirwarîd, tihran*, 1390, r.65.

⁴⁸ Saman 'îzdidîn, *Binyatî Hunerîy Le Şî'rî Letîf Helmet da*, çapxaney kemal, Slêmanî, 2010, r. 124.

helbestvanan û hem bo xwendevanan, da ku pê bigihîne pileya şadbûna derûnî (rîtim regezeke cêgîr û nelive di helbestê de, ku dibe binemayê bizava derûnî û delalî tê de, rîtim radibe bi kumkirin û buhjinê, her wesa bizaftina regezan tê de, rîtim helbestê beref şepulên dengî dibe ji pêxemet wê çendê bigihîne armanca xwe, hindêk rîtim eşkere ne û hindêkên dîtir jî veşartî ne, li vir dîyar dibe ku hindêk helbest ji hindêkên dîtir ciyawaz in, her wisa karekî edebî ji karekî dîtir).⁽⁴⁹⁾ Ango karê wergirî ew e bi hosteyane nêrîneke wird bo gişt helbestê bike, da ku buhayê rîtmê wê helbestê bizane (Arut kupland) wisa bo diçe ku bitnê xwendineke rîtmê dişê wateya helbestê berceste bike.⁽⁵⁰⁾ Heta wî radeyî em dişên bibêjin ku rîtim (bi sîmayê eşkereyê gotina helbestê tê nasîn).⁽⁵¹⁾ Heta em bişên vê pesendbûnê li ser buha û giringîya rîtmê di helbestê de bidin, pêdivî ye em temaşeyî barûdoxê wergirê rîtmê bikin. Ji ber ku pêwendiyê yekser di navbera helbestvanî û wergirî de heye, ev pêwendî jî ji encamê wê karîgeriyê dirust dibe. Dema teksta helbestê bi rêya wizeya rîtmê wergirî dikeve armanca xwe, her wisa karîgerîya hunerî temam nabe, eger du wize di nav de berceste nebin, ew jî.⁽⁵²⁾

- 1- Wizeya di nav teksta helbestê de, ev wizeye bizav û dirêjpedanê dide peyvên derbirî û wêneyên wê yên hunerî û buhayê wê yê muzîkî, her wisa pêkhateya wê ya rewanbêjî jî dide.
- 2- Wizeya dema ku wergirtinê peyda dibe, ev wize tê saloxdan, bi bizav û dirêjpedan bo yê beramber, her wisa ev wizeye hindêk layenên estetîkî û rewşenbîrîyên ciyawaz bi xwe ve digîrt, gelek caran jî ev her du wize digihîne yek ji pêxemet wê çendê karîgerîyeke berza hunerîya temam di nav teksta helbestê de biafirînin.

⁴⁹ Xelîl El Musî, *Qîraet fî Ş'rye Alş'ri Al'rbî Alhedîs (Mirhiltha Laha u Alrumanisye)*, dar abin kesîr, Dmîşq, 2001, r. 37.

⁵⁰ Mihemed Bekir Mihemed, *Harmonya (Rîtim) û (wata) yê, di hozana (czîrî)da*, govara peyv, h.j.31 Êketya Nvîserên Kurd Tayê Dihokê derdixît, 2004, r. 11.

⁵¹ Selah Fesil, *elneserye elbînaye fî neqîd eledebî, eltib'e elsanye*, dar şiwon elseqafye el'ame, Bixdad, 1987, r. 71.

⁵² Dahu Asye, *Elîqa' Elm'newî Fî Elsure Elş'rye (Mihmud Derwêş)* Nimusecen Rîsale Macsitîr, Kulye Eladab, Cam'e Hesîbe Bin Bu 'Lî, 2009, r.78-79.

Buha û girîngîya rîtmê di helbestê de gelek girîngtir e ji buhayê kêşê, çunkî kêş nayê sepanin li ser gişt cureyên helbestê. Belê rîtim pêdivîyeke herî cêgîr û neliv e di nav gişt cureyên helbestê de (helbesta bê kêş her helbest e, belê helbesta bê rîtim helbest nîne, di vê dabeşê de furalîstan gelek hişyar bûn ku nekevin di xapandina 'eruznasên klasîk de, dema dibêjin kêş û rîtim êkin).⁽⁵³⁾ Rîtim binemayekê negore di nav helbestê de (Furmayist bi ewê rastî yê temaşey helbestê di ken, ku kêş taybetmendî ya hemî helbestên cîhanî nîne, belku rîtim wekî regezê serekî bi rêka kartêkirna astên cora û corên zimanê helbestê bnaxê helbestê pêk di înit).⁽⁵⁴⁾ Her wisa furalîstan ji riwângê têgehê rîtmê ve ew a ku pêwendî bi gewherê zimanê helbestê ve heye, piştî ku gotar dişê sîmayê xwe yê rût winda dike, derencamê hindê ku gotar dişê her bimîne helbest, xwe eger hat û kêşa xwe ji dest bide, li ser wî binemayê ku rîtim pê radibe, rîtim ew regez e ku bi gelek rêk û şeweyan bi dest ve tê ne bitnê bi rêya kêşê, ev ji ber wê yekê ye teksta helbestê hindêk pêkhatayên dî jî hene ku bibin egerê heme cureyên rîtmê, ku helbestvan bi rêya rêkxistina hizir û wateyê û bilin kirna delaletan bi dest ve tîne. Her wisa xwendin û bersivdana xwendevanî jî bi şeweyekî estetîkî rîtmê eşkere dike, ango karê hunerê yê rîtmê helbestvan dirust dike û xwendevan ji layê estetîkiyê ve tamam dike.⁽⁵⁵⁾ Ew rîtma di nav helbestê de gelek karîger û serincrakêş e, bo rakêşana xwendevanî bo teksta helbestê Ku wate rîtim di helbestê de (xeteke stûniye ji serê teksta helbestê tê xwar heta dikeve binê wê, ligel xwe hemî xetên asoyî di xaleke lengerîya tewerekî de di birît, bi gotineke dî, rîtim elementeke bilind e, mîna rimiyê, diyar nabe bitnê. Eger bi rêya şîwarên wê di leşê tekstî de nebe, ku endamên vî leşî û girêçk û xet û hemî elementên wê bi hindêk livînên rîtmî, ligel yek di kevne semayê û hemaheng bi hev re tîn livandin, li vir em digihêjin encamekê ku rîtim bi xwe taybetmendîyeke binyatgerî ye, ji komeke rîtman pêk tê, mîna xelekên biçûk in. bi hev re kar dikin da ku rîtma giştî bînin pêş, ku dibin alîkar bo destnîşankirina hemî layenên binyatê tekstî).⁽⁵⁶⁾ Ku wate em serederîyê ligel janreke edebî dikin, ku ji dengî heta ristan

⁵³ Yasrê Hesenî, h. b. r.17.

⁵⁴ Mihemed Bekir Mihemed, *Kêş u Rîtmî Şî'rî Folklorî Kurdî*, weş. dezgay çap û blawgirdnewey Aras, Hewlêr, 2004, r. 56.

⁵⁵ Mes'ud Weqad, *Elbinye Elîqa'ye Fî Ş'r Feduy Tuqan, Rîsale Macsitîr*, Kulye el-Adab, Cam'e Werqlê, 2004, r. 15.

⁵⁶ Yasrê Hesenî, h. b, r. 35.

mişt e ji rîtmê, ev rîtim jî wergirî naçar dike ku bizane di teksta helbestê de cîhaneke estetîkîya bêsinor heye (rîtim derbarê wergirî karabûneke hestên nazik û xoş bo vediguhêze, ew jî hebûna culaneke zindî ya geşekirî ye. Her wisa dûvêkhatineke livok ya yekeyên kûr pêşkêş dike).⁽⁵⁷⁾ Her ev çend e bûye eger ku helbest di pêvajoya xwe de bimîne janrekî zindî û nemir (rîtma helbestê ew regeze ya dişê helbestê ji her tiştêkê dîtir ciyawaz û cuda bike, rîtim eger çû dinav binyatê rîtimyê karîda ew regezên zimanên ev çende pê dirust dibe bi siruştê rîtmê di hête afirandin, ku bi hîç rengêkî zimanê asayî û rojane neşêt vê çendê dirust bike).⁽⁵⁸⁾ Lewre helbest ji her janrekê dîtrê edebî rastewxo serinca mrovî bo xo radkêşît, çunkî rîtim di navda dibe hokarê evê çendinê (rîtim ew xîvete ewa hemî astekî vedigire û pêwendîyên rîtmê digel gişt astekê de ne, her wisa rihûrîşalên xwe di nav pêkhatyên astên hemerengên teksta helbestê de mikum dihêle).⁽⁵⁹⁾ Helbest bi xwe jî ya hevbende bi rîtmê ve, rîtim dibe xala sereke ku helbestê berev cih û kinarên bilind ve bibe, rîtim çalakîyeke bihêz dide teksta helbestê, ev çalakî yekser kartêkirinê li ser hest û hişên mirovî dikin, ev e eger û hokarê wê çendê ku helbest her bimîne cihê serincrakêşa rexnegir û vekolerên edebî helbest jî bi rêya binema û regezên xwe yê avaker, kar dike ji bo cîbicîkirina rêjeyêke bilind ji rêkxistin û guncanê, rîtim di helbestê de palpiştîyê û dûpatîyê li ser wê hesta giştî dike bi şêweyekî rêkxistî û serincrakêş).⁽⁶⁰⁾

Bi rêya van xalên li xwarê rîtim di helbestê de hebûna xwe diselmîne.⁽⁶¹⁾

- 1- Ciwanîya pêkhatyê û rêkxistina wê pêkhatyê.
- 2- Temamî û dirustiya kêş û wateya wê.
- 3- Xweşî û çêjatîya regezên bûyine egerê dirust bûna rîtmê, mîna (fonîman, peyvvan, destewajan, ristan...).

Helbet rîtim di helbestê de girîngîyê bi tenê bi layenekî nade da ku ya serincrakêş be belku (Buha û nîrxê rîtmê bi tnê di berifrehî û rêkxistna gotin û

⁵⁷ Hamid Salim Derwêş elirewaşde, *Elş'rye fi Elneqid El'rbî Elhidîs* (dîrase fî elnisirye û eltetbîq), Utruhe Dikturæ, Kulye Eluxat, Cam'e Mote, 2006, r. 111.

⁵⁸ Yurîfî Lutuman, h.b, r.96.

⁵⁹ N'metulla Hamd Nhêlî, h.b. r. 197.

⁶⁰ Kemal Ebu Dîb, h.b. r.231.

⁶¹ Tbirmasîn'bdalirhmin, h. b. r.96.

lêvkirnê da nîne, bigre ji bê snûrî ya buhayê çawanî û hêza îstatîka yê û ciwansasî û mkom trîn delalet û derbirîne bejdaryê di helbestê da di ket).⁽⁶²⁾ Lewre helbest jî (sîberke ya girêdayî bi rîtmêve, bi hukmê erk û siruştê wê, her wisa bi hukmê alavên wê).⁽⁶³⁾ Guman tê de nîne ku helbestvanê desthel ew ê ku wergirî bejdar dike ligel wê lezeta di vehandina helbestê de heye, çunkî helbestvan bi teknîk û şêwazên hemreng rîtmê dikin hêvênê helbestên xwe, rîtma helbestê zor ya pêdivî ye da ku bê gîrobûn wergirî bike armanca xwe û wergir jî ligel yekem xwendina xwe bo wî teksta helbestê hest pê bike ku ew ê ligel baştirîn tekstê edebî serederiyê dike, berovajî eger di nav teksta helbestê de sîmayên rîtmê hatine windakirin wê demê bi hîç renegekî em neşên wê tekstê bi helbest binasîn, yan wê tekstê bixin di nav çarçoveyekî yan cureyekî helbestê de (Ji ber hindê bi ramalîna hemî ewan huner û teknîkên bejdaryê di bunyatnana rîtma helbestê da di ken helbest dê bîte qesîdeka ruyt û ya asay, li vêrê şyan û zîrekî ya helbestvanî zora gringe di bercestekirna bunyatekê muzîkî yê mikom û karîger bo têksitî, bi şêweyekî bi şêt hêleka peywendyê di navbera sercem astan da drust bi ket û hevsengî yê di navbera kiryara gehandin û têgehiştên da bi ket, çunkî her çende rîtim û muzîk helkulana zimanekê derûnî ye û bi pleya êkê karîgerî yeka rastewxo dê li ser derûnî hebît).⁽⁶⁴⁾ Rîtim di helbestê de li ser binemayê teknîka dubarekirinê tê berhemînan, ne ji hev veqetiyaye û heremekî be, bi vî têgehê destnîşankirî sîstemeke rêkxistî dirust dibe, ku regezên dirustker bo karê helbestê bi xwe vedigirt, çunkî eger ji hev veqetiyabin wê demê di şîyan de nîne wan regezên ji wate û wêne û hizra bîn kontrolkirin û ev çende jî dê bibe egerê wê çendê ku ew wekî helbest nemîne, belku bibe pexşan.⁽⁶⁵⁾ Ji ber vê çendê (Furmalîst rîtmê bi egerekê serekî û bunyatnerê helbestê di danin ku karîgerî li ser astên dî yê helbestê heye: deng û peyv û riste, herwesa bi egerê êklaker di danin di cudakirna helbest û pexşanê da, çunkî hindek helbestên serbest hene bi

⁶² Azad Ehmed Mehmûd, h.b .r.76.

⁶³ Seyd Elbihrawî, *Musîqa Elş'ri 'Nide Ş'ra Ebullu*, kulye eladab, cam'e elqahre, r.10.

⁶⁴ Safye Muhemed Ehmed, *Ladan Le Şî'rî Hawçerxî Kurdîda*, weş.belawkirdnewey ekadîmay kurdî, çapxana Hacî Haşm, Hewlêr, 2013, r. 223.

⁶⁵ Fath 'laq, *Mefhum Elş'ri 'Nde Riwad Elş'ri El'rbî Elhir*, menşurat îthad elkîtab el'rib, Dîmişq, 2005, r. 238.

aşkrayî muzîk têda nahête dîtin, di gel ewê çendê jî ji sîstemê giştî yê helbestê nahête ladan).⁽⁶⁶⁾

Di biyavê rîtma helbestê de divê çendîn xal bi girîngî ve bèn wergirtin, ew jî:

1-Kumeleka asay ya pêşwext hebûna xo nîne ku helbestvan pêve yê grêdaybît belku helbestvan bi arezuya xo û bi şarazayî li bi karînana helbestvanî ya zimanî rîtma taybeta xwe drustkirina ewan ji layê çend helbestvaneka ve wekî êk dûbare nabne ve.

2-Dûbarekrin û berifrehkirina sereyên giryê bi kersitên cuda cudayên zimanê helbestê bêzar bûnê li dev xwandevanî û guhdarî drust naken, çunkî hemî rêrewê watayî û muzîka têksitî bi hêz tir di ken û ptir çêjê li dev xwandevanî peyda di ken.⁽⁶⁷⁾

Helbestvanê xwedî şiyar û deshêl wê demê helbesta xwe diafirîne dê çawa kersitên zimanî bixê li jêr dewlemendkirina rîtma helbestê.

1.4. ERKÊ RÎTMÊ DI NAV HELBESTÊ DE

Erkê rîtmê di helbestê de seng û buhayeke yekcar mezin heye, bê rîtim helbestê çî layenên estetîkî û hunerî nabin û ew peyama pê radibe ji dest dide. Lewre dê bînin ku gelek ji vekoler û rexnegirên edebî bi berfirehî behsa erkê rîtmê kiriye girîngîya rîtmê di helbestê de gelek zêde bûye. Ew jî piştî rexnegirê îngilîzî (Tumas Ilîwt)î serinca rexnegir û helbestvanan rakêşa, ku rîtim dişê peyvên helbestê ji cîhana hişiyê derbixê û bigihîne sînorê cîhana bêhişiyê.⁽⁶⁸⁾ Çend em lêgeriyane li dûr erkê rîtmê bikin, em hêştê neşên weke pêdivî wî erkê bidin nasîn ji ber ku rîtim bi bizwênera bihêzkirina helbestê tê nasîn (Eger huner derbirîne ji buha û dîtna

⁶⁶ Cebâr Ehmed Hsên, *Îstatîkay Deqî Şî'rîy Kurdî* (Kurdistanî 'Îraq 1950 – 1970), weş. blawkirdnewey dezgay çap û pexşî Serdem, Slîmanî, 2008, r. 82.

⁶⁷ Mihemed 'abdulkerîm Îbrahîm, *Pêkhatay Zimanî Şî'rî Le Rwaney Rexney Edebîy Nwêwe, Ezmûnî Şa'îranî Heştayyekanî Hewlêr* wek nmûne, weş.dezgay twêjînewe û belawkirdnewey Mukiryani, çaphaney Mukiryani, hewlêr, 2012, r. 113.

⁶⁸ Mes'ud Weqad, *Elbinye Elîqa'ye Fî Ş'r Fedua Tuqan*, r. 31.

watayê bi ket, rîtim rêk û egerekê evê derbirînê ye, çunkî ew bi xwe zimanê helçûnê ye.⁽⁶⁹⁾

Em dişên bibêjin ku helbest neşê erkê xwe yê delalî û wateyî bigire, eger ya bê rîtim be, helbest bi rêya rîtmê wê payeberzîya heyî diselmîne. Ku wate erkê rîtmê ye helbestê nasnameya xwe ya zindî parastîye (helbest bûn bi dîtina rexneya nû bi rêya komeke dîyardeyên rîtmî û taybet ew ên binyatên dahêner û ciwankarane dirust dikin û dihêne zengînkirin. Van binyatan roleke sereke heye ji bo pêdana siruştê rîtmî di darêtnê de, weke pirkirina valatîyekê ye. Ew a di nav rîtma derekî de peyda bûy mil bi milê rola wê ya delalî. Ji ber vê rola girîng û berçav ya rîtmê di teksta helbestê de û ji bo rawestan û şîrovekirin û dîyarkirina şêwazê her tekstekê hebe, fere bi hûrî binyatê rîtma wê tekstê dîyar bikin û vekolîne tê de bikin, da ku sîma û taybetmendîya rîtmê tê de bê dîyarkirin. Ev ji layenê xwe ve alîkareke ji bo dîyarkirin û eşkerebûna şêwazê wê tekstê).⁽⁷⁰⁾ Erkê rîtmê yê sereke di nav helbestê de ew e ku helbestê dîr bike ji ramanên bêşûd û bêmaf, ev çende dê bibe egerê wê çendê ku helbest erkê xwe yê rasteqîne biparêze. Ew jî ew e ku helbest ya havî be ji derbirînên sade û zimanê kolankî (Helbest bê rîtim axiftneka rojane ye derbirîna watayên ewê sade û sakar di bin, belê delaleta rîtmê buhayê karîgerî û dîr êxistna ewê sadey yê bi stuyê xwe ve di grît, ji ber hindê bnaxê rîtmê di helbestê da bo raman û mifayê wate bexşê aramyê ye, di qesîdê da ciwantirîn û pesend trîn guncandin di deng û awazê da bi dest ve di înit).⁽⁷¹⁾ Her wisa (mehmud zamdar) di pirtûka xwe de ewa li jêr (le banîjey şî'rewê) bi şêweyekî hunerî behsa hebûn û erkê rîtmê di nav helbestê de kiriye, dibêje: (çawa gerdon bi rîmeka bê dem û dûmahîye wesa helbest jî. Helbesta bê rîtim).⁽⁷²⁾ Ji pêxemet dewlemendkirina layenê delalî û serincrakêşa xwendevanî bo teksta helbestê, rîtim bi erkekî sereke di cîbicîkirina binyatê helbestê de radibe. Ev wê çendê digihîne ku rîtim her dem di helbestê de ya papende bi çêj gihandinê bo wergirî, ligel xwest û hestên wergirî digunce (Ji berku xasyetê rîtmê lêgeryane, lewra di bunyatê qesîdê da di şet erkê astê pêwaneyî û

⁶⁹ Azad Ehmed Mehmûd, h.b. r. 74-75.

⁷⁰ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî û Praktîk*, r. 201.

⁷¹ Azad Ehmed Mehmûd, h.b. r.79.

⁷² Mihmud Zamdar, *le Banîjey Şî'rewê, komeley roşnibîrî kurdî*, metb'e crîde al'raq, Bixdad, 1981, r. 32.

delalî bi bînît, û regezên wekî êk û newekî êk wekhev di ket, li ewan chên ku arîşe lê di hêne hevsenkrin pîr dupatî li ser di hête kîrn).⁽⁷³⁾ Helbest di gişt qonaxên nûkirinê de û ew guherînên bi ser de hatin. Her rîtim weke elementeke herî kara şiyaye roleke aktîf bigire ji pêxemet zalbûna hejmûna helbestê li ser naxê wergirî û xwendevanî (ji ber van erkên girîng e ku rîtim weke regezeke zindî di gişt qalib û cureyekî helbestê de roleke yekcar mezin digire. Her ji helbesta stûnî erûzî bigire û ta ku tê helbesta nûxwaz ku li ser binyatê regezê rîtmê hatiye avakirin û sistemeke rîtmî yê vekirî bi xwe ve dibe. Lewre dema nûkirin yan jî guherînek bikeve di qalb û pêkhate û topografiya avahiyê helbestê de. Beramberî vê guherînê, erkê rîtmê di zêdebûnê de ye, berebere eşkere û diyar û bihêz dibe di buha û girîngiya xwe de).⁽⁷⁴⁾ Eger helbestvan di teksta helbestê de bi şarezayane serederiyê ligel rîtmê neke wê demê bitnê ew yê bo me tiştê hecûheyî pêşkêş dike. Ku wate ew tekst nabe tekstê xwedî pêkhateya karîker. Belku çî ciyawazî di navbera wê tekstê û tekstê ne xwedî pêkhateyeke nimûneyî de nabe. Berovajî eger bidirustî helbestvanî rîtim kire hêza hebûna helbesta xwe wê demê çî bahane namînin ku xwendevan nekevin li jêr karîgeriya wê helbestê (erkê rîtmê, erkekî xweşî û ciwankar e û derûnî ye. Erkekî xweşî ye, çunkî her dem kukiyê li ser hebûna sistemeke wir dibin di karê hunerî de dike. Erkekî ciwankariyane ye, çunkî keş û hewayekî dirust dikin di doxekê hizirkirin û aşupîkirinê de. Ew ên ji layenê xwe ve cureyekî hebûnê didin berhemî, erkekî derûnî ye. Çunkî jiyana me jiyareke rîtmî ye).⁽⁷⁵⁾ Helbest bi rêya regezên xwe yê avaker radibe ji bo cîbicîkirina rêjeyeke bilind ji rêkxistin û guncandinê di teksta helbestê de, rîtim jî bi erkê palpiştiya vê hesta giştî bi şeweyekî estetîkî diguncîne.⁽⁷⁶⁾ Rîtim di helbestê de bi ser rîtma derekî û rîtma navxweyî dabeş dibe lewre ev her du cureyên rîtmê bi erkê jihev cudabûna helbestê ji gişt janrên di yê edebî radibin (Erkê bunyatê rîtmê di têksitên edebî da bi wî şewey ku rîtim regezekê dyarê layê ji derve û navxoy ya helbestê ye rengvedana ewan soz û helçûnaye ku di ezmûna helbestê da peyda di bît, û di gel bunyat û astên dîtrên têksitî da têkel di bît, û peyundîyeka grîng di navbera regezên bunyatî da pêk di hêt,

⁷³ Azad Ehmed Mehmûd, h.b. r. 75.

⁷⁴ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî û Praktîk*, r. 198-199.

⁷⁵ h.j. r. 198.

⁷⁶ Cun Kuhîn, *Binye Elluxe Elş'rye*, tircime: Mihim Elwecî û Mihim el'mrî, dar tubqal lilnişr, elmixrib, teb'e alawlî, 1986, r. 86.

grîngî di ewê çendê daye ku her dû ser bi ewî corê hunerî vene ku bi hunerên dengî di hêne nyanîn).⁽⁷⁷⁾ Nivîser (muhemed rxêmî) Çendîn amajên girîng ew ên pêwendî bi pêkhateya rîtmê ve pêşkêş dike û dibêje: (rîtim li ser binemayê wê bi mirovî ve rehindê derûnî heye, rîtim piştbestinê li ser kersitên zimanî dike. Ew ên tê de hatine bikaranîn, bi vî şêweyî du erkên girîng li ser rîtmê zêde dike, ew jî ev ên li xwarê ne:

1- Çêjwergirtin, ew a dahênerê teksta helbestê dema prosa dahênanê cîbicî dike. Her wisa guhdar jî dema prosa wergirtinê çêjek ji wê tekstê werdigire.

2- Dabêşeya kontrolê ye li ser kersitên zimanî, ew ên hatine ristîn bi livîna tewjîmê rîtmê. Bi wê wateyê ku rîtim wî zimanî diguncîne û endaze dike li dîv hest û sozan. Her wisa mebesta hizir û helçûnên wijdanî jî).⁽⁷⁸⁾

Pêvegirêdana gişt regezên avakerên helbestê ji karên rîtmê ye û rîtim bi erkê xirvekirin û danîna wan di nav helbestê de radibe (Erkê rîtmê bi hemî wêne û derbirînan ve bi corekê zal di hête bi nav krîn di têksitî da ku di bîte regezê serekî û kartêkirnekê li ser xwandevean û guhdarî bi cihdihêlît, kewate hemî lvînên me yên rîtmî li dîv corên wêney û bunyatê cora û corên wê me berev erkekê rîtmî di bet).⁽⁷⁹⁾ Rîtim di helbestê de pêwendîyeke yekser di navbera xwendeveanî û helbestvanî de dirust dike (rîtim weke pêkhênerê sereke di helbestê de, roleke yekcar mezin dibîne ji bo rakêşana xwendeveanî û guhdarî û guncandina hest û nestên helbestvanî ligel yên xwendeveanî, dîsa weke faktoreke eşkere û rastewxo rolê xwe digire, ji bo sepandina hizra nivîserî (helbestvanî) li ser hoş û hestê xwendeveanî).⁽⁸⁰⁾ Rîtim bi pira gehandina hest û sozên helbestvanî bo wergirî û xwendeveanî tê nasîn, xwendevean jî ligel xwendina wê helbesta helbestvanî hest bi çêjeke bêsînor dike.

⁷⁷ 'Bdalqadir Hme Emîn Mhimd, *Binyatî Karnameyî Le Deqî Nwêy Kurdîda*, weş.belawkirdnewey Melbendî Kurdolocî, Slîmanî, çapxaney Tîşk, 2008, r. 186-187.

⁷⁸ Qidur Rihmanî, *Binye Elxîtab Elş'arî Fî Elfituhat Elmekye Lîbin 'Rbî*, rîsale macîstir, kullîye eladab, cam'e elcezayr, 2006, r. 192.

⁷⁹ 'Bdalqadir Hme Emîn Mhimd, *Binyatî Karnameyî Le Deqî Nwêy Kurdîda*, r. 192.

⁸⁰ N'metulla Hamd Nhêlî, Plên Rexneyî Kumeka Vekulînaayî Di Têksitîda, weş. Êketiya Nvîserên Kurd Tayê Dihokî, Çapxana Hawar, Dihok, 2005, r. 159.

1.5. TÊGEHÊ RÎTMA DEREKÎ

Rîtma derekî pêdvîyeka hetmî û gringe di nav pêkhata helbestê da bi cwanî û afrandina helbestê di hête niasîn, bi taybet di helbesta klasîkî da, Şengistê dahênana rîtma derekî di kevîte li ser dû regezên here gring ew jî kêş û serwaye, wate ev her dû regeze rolekê kara di gêrn di bercesterkirna rîtma derekî di nav heabestê da (Rîtma derekî bunyat û delaleta ewê wek astekê rîtmî yê serekîye di helbestê da, pêkhata rîtma derekî di nav peywendyên hevguncandin û dûbarekrinê da dîyar dibît, di navbera deng û birge û serwa di kevne li jêr pîverên 'erûzî û kêş û serwaya da her weku di nav bunyatê rîtimyê stûnî da dîyar, yan jî ewa di kevîte li jêr hejmûna wêda bi awayekê rêjeyî û di nav bunyatê rîtimyê azada, dibît guhên wergirî dîyardên giştî yên wê pêkhat û darêtna derekî bi awayekê xwebixwey wergirî)⁽⁸¹⁾ Bi renegeê giştî rîtma derekî pitir di nav ewan core helbestan da aşkra di bît ewên bi yasa û destûrave xwe grêdiden, ev xwe grêdane jî çarçuvekê bo mewdayê karê helbestvanî dest nîşan di ket, anku afrandna karê wî di hête snûr darkrin (Rîtma derekî li dîv yasa û destûrên pêşwext di hête danan, anku çend yasa û destûrên helbestê yên dyarkirî hene û helbest li ser di hête vehandin, hindek caran ev yasaye gelek di sadene, wekî yasayên helbesta folklorî û hindek caran jî zêde di alozn wekî helbesta klasîkî)⁽⁸²⁾ Ev corê rîtmê muzîk û awazeka karîger di nav helbestê da berhem di înit, ji layê xweve wergir her êkser hest bi çêj û xweşîya ewê muzîk û awazê di ket, bi evê çendê karê helbestvanî yê here serekî ewe demê dest bi vehandna helbesteka xwedî kêş û serwa di ket pêdvîye zor yê agehdar bît di afrandin û drustkirna rîtim ewê ya derekî da çunkî resenetîya têksitê helbesta ewî helbestvanî ya di dahênana rîtma derekî daye, berovajî dê lengî û şikestin kevîte di nav prosa dahênanê da.

⁸¹ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r.99.

⁸² Mes'ud Cemîl Reşîd, *Kêş u Serwa Di Hozana Kuraîada*, weş.dezgehê Nalbend, Dihok, 2017, r. 23.

1.6 KÊŞ Û RÎTIM DI HELBESTA FOLKLORÎ DE

Folklor ew gencîneya pir dewlemend e, ya ku bab û papîrên me bo me hêlaye, ev car çî kersitên wî folklorî regezên madî bin ya yên me'newî bin, milletê kurd ji wan milletan e yên ku folklorê wan bûye cihê girîngî pêdana zana û vekolerên bîyanî, wan zana û vekoleran bi sersurmanî ve berê xwe daye vî serwetê milletê me.

Yek ji wan çeqên ku serinca van vekoleran rakêşaye helbesta folklorî ya kurdî ye. Helbesta folklorî ya kurdî gencîneyeke dewlemend e hem ji layê naverokê ve û hem ji layê ruxsarê ve. Ev helbest rengvedana rasteqîneya barûdoxê jîyana milletê kurd e. Bi derbirîneke dî piranîya xweşî û nexweşiyên milletê kurd bûne serçawe û hêvênê afirandina helbesta folklorî.

Ji layê naverokê ve helbesta folklorî ji gelek babetên hemcure pêk hatiye. Hemî babetên wê derbirînê ji jîyar û jîyana rasteqîneya milletê kurd dikin. Ku wate her xweşîyek an nexweşîyek hatîye di rêya milletê kurd de, bûye hêvênê babeta dirustibûna helbesta folklorî mîna babetên evînî, karkirin, şer, ayînî hwd. Ev babet hemî, bi renekî gelek berfireh hatine bikaranîn di nav helbesta folklorî de. Her wisa ji layê ruxsarê ve helbesta folklorî yasa û destûrên xwe ji destûrên helbesta çu milletên dîtir wernergirtiye. Belku berhema verêja wî ya xwemalî ye, ango dahênana milletê kurd bi xwe ye. Bê guman helbesta folklorî ya kurdî çendîn cureyên wê hene, belê piranîya vekoler û rexnegirên kurd li ser wê çendê rêkeftî ne ku helbesta folklorî ji layê kêş û rîtmê ve ji sê cureyan pêk tê. Bo nimûne Dr. Marûf Xeznedar di pirtûka xwe de ya bi navê *Kêş û Qafye le Şî'rî Kurdî da*, helbesta folklorî dabeşî sê cureyan dike:⁽⁸³⁾

1- Guranî

⁸³ M'ruf Xeznedar, *Kêş u Qafye Le Şî'rî Kurdî da*, mitbe alufa, Bixdad, 1962, r. 31-35.

2- Beyt

3- Heyran/lawik

Bo van her sê cureyên helbestê jî vekoler Mihemed Bekir Mihemedî di teza xwe ya masterê de ya bi navê *Kêş û Rîtmî Şî'rî Folklorî Kurdî*, kêş, rîtim û qafiyeyên wan derxistine, bi vî şêweyê li xwarê:⁽⁸⁴⁾

Ji	cor	kêş	rîtim	Qafiye	
				Hunerî	riwalet
1	şî'rî guranî	+	+	+	+
2	Beyt	+	+	+	+
3	Lawk heyran	.	+	+	+

Eger em temaşeyî vê xiştê li jûrî bikin, dê bibînin ku rîtim binema û regezeke sereke ye di nav her sê cureyên helbestê de. Li vir wisa bo me eşkere dibe ku di nav helbesta folklorî de rîtim bi binemayeke sereke tê nasîn, ango buhayê rîtmê gelek girîngtir e ji buhayê kêş û serwayê. Vekoler û rexnegirên kurd ji bo şîrovekirina helbesta folklorî ya kurdî ji layê kêş û rîtmê ve du cure rêbaz peyrew kirine: rêbaza asayî, rêbaza zimanî. Lê belê piraniya wan vekolînên li ser kêş û rîtma helbesta folklorî hatine encamdan rêbaza asayî peyrew kirine. Bi derbirîneke dî ev rêbaz di nav rexneya edebî de li kar bûye. Her çî rêbaza zimanî ye, bo cara yekem Mihemed Bekir Mihemedî ev rêbaz di teza xwe ya masterê de dahênaye, ku wate ev rêbaz li ser helbesta folklorî peyrew kiriye.

Rêbaza asayî bi şêweyekî giştî “piştbestinê li ser sê yekeyên rîtmî û hejmara birgan dike. Bi renekî giştî sê yekeyên rîtmî bi avakirina helbesta folklorî ya kurdî ya kêşdar radibin. Ew jî sê, çar an jî pênc birgeyî ne; ango di helbesta xwemalî de pêdivî ye piştî sê yan çar yan pênc birgeyan rawestiyaneke wateyî hebe. Bi

⁸⁴ Mihemed Bekir Mihemed, *Kêş u Rîtmî Şî'rî Folklorî Kurdî*, r. 122.

watayeke dî pêdivî ye piştî peyv yan destewaje bi dumahîk tên, nebe du parçe (naeyê şikandin). Bi lêkdana du yekeyan dê nîve dêrên helbesta folklorî dirust bibin. Çunkî her nîve dêreka helbesta folklorî ji du yekeyan ne kêmtir û ne zêdetir pêk tê.”⁽⁸⁵⁾ Girîngtirîn kêşên bi rêya van yekeyan di helbesta folklorî de dirust dibin, sê kêşên sereke ne. Di van kêşan de rîtma helbesta folklorî tê zanîn, ew jî bi vî rengê li xwarê:

1- Kêşa (10) birgeyî ku bi rîtma (5+5)

2- Kêşa (8) birgeyî ku bi rîtma (4+4)

3- Kêşa (7) birgeyî ku bi rîtma (3+4) an (4+3)

Ku wate li dîv rêbaza asayî rawestiyanên watayî binaxe û binçênê dirustbûna rîtmê ne di helbesta folklorî de. Li dîv binemayên rêbaza zimanî rîtim bi rêya hêzê (strêsê) dirust dibe. “Ji bo şîrovekirina kêşa folklorî weku kêşeke çawanî pêdivî ye em bibêjin ku hêz (strês) di zimanê kurdî de dibe fonîm, lewre tiştêkî siruştî ye, eger ev diyardeya dengsaziyê biçe di nav binyata rîtmê ya kevintirîn û resantirîn helbesta kurdî de, ew jî helbesta folklorî ye.”⁽⁸⁶⁾ Rîtma navxweyî di helbesta folklorî de, ji encama dubarekirina deng, peyv, riste hwd tê dirustikirin, nexasim helbesta folklorî ya hatiye ristin bi zimanekî petî û şîrîn, ango zimanê helbesta folklorî dîr û havî ye ji peyvên biyanî. Lewre rîtma navxweyî bi zengeke xweş û karîger di nav helbesta folklorî de tê afirandin.

⁸⁵ Mes'ud Cemîl Reşîd, *Qonaxên Kêşnasîya Hozana Kurdî*, r.109.

⁸⁶ h.j, r. 121.

1.7. KÊŞ Û RÎTIM DI HELBESTA KLASÎKÎ YA KURDÎ DE

Helbesta klasîkî ya kurdî ew helbest e ku bi terz û şêwazeke bilind a hunerî hatiye vehandin. Bi derbirîneke di helbesta klasîkî ya kurdî ruxsara wê gelek layên estetîk û watayî bi xwe ve digire. Her wisa ji layê naverokê ve babetên wê piraniya wan girêdayî layênê dînî û felsefeya û tesewifê bûne. Vehandina helbesta klasîkî ne tiştêkî bi sanahî ye. Belku ew helbestvanê helbesta xwe li ser binemayê helbesta klasîkî divehîne, pêdivî ye bîrdanka wî mişt be ji zanist û merîfetê, da ku bişê serinca xwendevanî bo helbestên xwe rakêşe. Ew helbest jî bibe egera wê çendê ku xwendinên ji hev cuda bo wê bên kirin.

Helbesta klasîkî ya kurdî li ser kêşa erûzê hatiye vehandin. Zanista erûzê jî bo yekem car ji layê Xelîl Ehmed Ferahîdî ve hatiye danan. Erûz wek zanist bi zimanê erebî hatiye danan. Ku wate di nav jîngeha milletê ereb de ev zanist peyda bûye. Piştî belavbûna vê zanistê di nav milletê ereb de, hêdî hêdî reh û rîşalên xwe gihandine di nav helbestên gelek neteweyan de. “ 'erûz ku kêşa helbesta 'erebî ye piştî belavbûna îlamê li welatên roj helata naverast, çu di nav helbestên ewan musulmanên ne 'ereb da ku êk ji ewan jî milletê kurde.”⁽⁸⁷⁾ Zanista erûzê di nav xwe de ji çendîn deryayan pêk hatiye. Bikaranîna yasa û destûrên helbestên erûzî di nav helbestên kurdî de li destpêkê li ser destê çendîn helbestvanan peyda bûye, lê yekem helbestvanê kurd ku peyrewa binemayên erûzê kiriye di nav helbestên xwe de, helbestvan Baba Tahêirê Hemedan e, ku di navbera salên 937-1019 de jiyaye. Piştî wî gelek helbestvanên mezin ên kurd helbestên xwe li dîv binemayên zanista erûzê vehandine, yên mîna Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Nalî, Salim, Kurdî hwd. Ku wate li dewrûberên hezar salan zanista erûzê hatiye di nav edebiyata kurdî de. Her çend yekem helbestvanê kurd ku behsa zanista erûzê kiribe di nav berhemên xwe de, helbestvan Ehmedê Xanî ye, ku di *Nûbihara Biçûkan* de, behs kiriye. “ Xanî piştî pêşekî yê, nubhara xwe dabeşî sêzde parçan krîye û li destipêka her parçeyekê dêreka helbestê ya giştî ya wê kêşê înaye ya ku vyay ewê parçê pê bi darêjît û piştî ewê dêrê di dêra duwê da pêngav û navê kêşê înaye, di

⁸⁷ 'Bdalirzaq Bîmar, h.b. r. 17.

dêra sê yê da behsê ferhenga wê krî ye.”⁽⁸⁸⁾ Belê vekolînên rexneyî li ser helbesta klasîkî mêjûya wê nû ye. “Vekolîn û berhemên erûzî wek zanistek di edebiyata kurdî de babeteke gelek kevin nîne; lê nivîser û erûzzanan jî her dem hewl dane, babet û vekolînên xwe li ser pelên kovar û rojnameyan yan namilke û pirtûkên serbixwe di vî warî de bigihîne destê xwîner û erûzdostan, da ku kêşa erûza kurdî jî weke hunerên dîtir ên edebî warekî taybet bi xwe ve bigire.”⁽⁸⁹⁾ Yekemîn vekolîna taybet a bi biyavê zanista erûzê ve, vekolînên nivîser û rexnegir Şêx Nurî Şêx Salihî ne, ku di rojnameya *Jiyanê* de di sala 1926-1927an de zincîreyeke gotaran derbarê edebiyata kurdî de bi navê “Adbyat Kirdî” belav kirine. Di van gotaran de çend zincîreyek terxan kirin ji bo kêşa helbesta kurdî. Derbarê kêşa helbesta kurdî de behsa du cureyên kêşê dike, ew jî kêşa “hîcaf û wezin, û erûz” e ku kêşa erûzê bi berfirehî daye nasîn.⁽⁹⁰⁾ Piştî van gotarên rexneyî yên vekoler Şêx Nurî Şêx Salihî, çendîn vekolînên rexneyî û pirtûkên zanistî yên gelek girîng li dor kêşa erûzî ya helbestê li ser destê komeke vekoler û rexnegirên kurd ve hatine danan. Mîna pirtûkên *Kêş û Qafiye le Şî'rî Kurdî* da ya Marûf Xeznedarî, *Kêş û Muzîqay Helbestî Kurdî* ya Ebdulirzaq Bîmarî, *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî û Berawirdkirdnî Erûzî Erebi û Kêşî Şî'rî Farsî* ya Ezîz Gerdî, *Nirxşnasî* ya Elaeddîn Seccadî, *Erûzî Kurdî* ya Nurî Fars Heme Xan, *Erûz wek Pêwerêk bo Saxkirdnewî Şî'rî Nalî* ya Yadgar Balekî hwd. Di van pirtûkan de bi têrûteselî û bi şêweyekî zanistî behsa zanista erûzê hatiye kirin.

Helbet kêşên erûzê şazdeh deryayan bi xwe ve digire. Belê helbestvanên kurd bi tenê ew kêş di nav helbestên xwe de bi kar aniye, ewên ligel siruştî zimanê kurdî diguncin. Ev yek jî tiştêkî siruştî ye. Ji ber ku malbatên zimanê kurdî û zimanê erebî ji hev cuda ne. Ew kêşên di nav helbestên kurdî de bi berfirehî hatine bikaranîn ev in: hezec, remel, recez, serî', xefîf, muzarî', muctes, muteqarîb, besît. Her wisa ew kêşên kêma hatine bikaranîn ev in: kamil, tewîl, mutedark, munserî', muqtezeb, medîd, wafîr.⁽⁹¹⁾ Derbarê rîtmê di nav helbesta klasîkî de, bêguman rîtmê

⁸⁸ Ezîz Gerdî, *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî u Berawirkirdnewey Legel 'Erûzî 'Erebî u Kêşî Şî'rî Farsîda*, r. 17.

⁸⁹ Helîma Xorşîd 'Ebdulla, *Berawirdîyeka Kêşnasî Di Navbera 'Erûza Kurdî u Farsî* (dîwanên melayê czîrî û hafz şîrazay) wek nmûne, weş. dezgehê sipîrêz. çapxana xanî, Dihok, 2011, r. 225.

⁹⁰ Ezîz Gerdî, *Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî u Berawirkirdnewey Legel 'Erûzî 'Erebî u Kêşî Şî'rî Farsîda*, r. 22.

⁹¹ h.j, r. 135.

bihayekî gelek girîng heye di nav helbesta klasîkî ya kurdî de. Çunkî rîtmê pêwendî bi hemû pêkhatayên helbestê ve heye. Gelek caran jî rîtim kontrolê li ser regezên dîtir ên beşdar di avakirina helbestê de dike. “Du cure lojîk kontrolê li ser şewaza helbesta klasîkî ya kurdî dikin: lojîka zimanî û lojîka rîtmê. Hindek caran di helbestê de lojîka binyata rîtmê li ser lojîka rêzimana zimanî zal dibe û helbestvan neçar dibe rêzimanê li dîv xwesteka rîtmê biguhere, ango helbestvan zimanî dibe û tîne da ku ligel yasa û destûra helbestê biguncîne.”⁽⁹²⁾ Di helbesta klasîkî de rîtma derekî roleke yekcar girîng heye ji bo helbestvanan, ji ber ku helbestvan bi rêya rîtma derekî wizeyeke mezin dide ruxsarê helbesta xwe. Di helbesta klasîkî de rîtim bi rêya tefîlan dirust dibe, ango yeksaniya birgên kurt û dirêj di helbesta klasîkî de, rîtma derekî dirust dikin, lewre hatiye gotin ku “rîtma helbesta klasîkî di piraniya senga xwe de berev rîtma derekî ve diçe.”⁽⁹³⁾ Rîtma derekî di helbesta klasîkî de xwe zal dike li ser helbestvanî, bi derbirîneke dîtir helbestvan pêşwext hindek mekanîzm û alyet di mejiyê wî de ne, dema rîtma derekî di helbestê de diafirîne. Helbesta klasîkî ya kurdî ya resen morkeke kevin heye ku bendkirî ye bi rîtma derekî ve.⁽⁹⁴⁾ Dema em behsa rîtma derekî dikin di nav helbesta klasîkî ya kurdî de, her yekser em hizir li du regez û pêkhatayên dî yên girîng dikin ku roleke yekcar mezin û girîng heye di afirandina helbestên klasîkî de. Ew her du regez jî “kêş û serwa” ne. Kêş û serwa roleke girîng dibînin di dirustkirina rîtma derekî de. “Mebest ji rîtma derekî ew muzîka helbestê ya ji derve ye ku kêş û serwa wê berceste dikin û helbest hindî di pêvajoya xwe ya dirêj de qonaxbirîn û guherîn bi ser de hatin û heta berî peydabûna pexşana helbestê jî, her du elementên kêş û serwayê parastî ne. Vêca ev kêşe çi ew be ku hejmara pêngavên wê hindî yek û neguher, serwa jî ya yekgirtî; yan ew be ku hejmara wan pêngavan ji malikekê bo yeka dî ji hev cuda û serwa wê hemereng ku cureyê yekê helbesta klasîkî ya hev kêş nûneriya wê dike û cureyê duyan helbesta serbest nûneriya wê dike.”⁽⁹⁵⁾ Rîtma derekî di helbesta klasîkî de dibe xala vebir ku helbestê ji pexşanê û gişt janrên dî yên edebî cuda dike. Ji ber

⁹² Mes'ud Cemîl Reşîd, *Rulê Tewrên Helbjartin û Rêzkirîna di Çêkirina Rîtma Hozana Klasîkîya Kurdî da* (Dîwana Melayê Czîrî) wek nmûne, weş. Belawkirdnewey Ekdîmyay Kurdî, Çapxaney Hacî Haşm, Hewlêr, 2014, r. 128.

⁹³ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 305.

⁹⁴ Mihmud Zamdar, h. b, r. 25.

⁹⁵ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê di Ş'ra Nûya Kurdî da*, r. 34.

şewaza wê ya bernas û cêgîr “rîtma derekî piranîya regezên têktê helbestê jê dirust dibin.”⁽⁹⁶⁾ Derbarê rîtma navxweyî di helbesta klasîkî de, helbestvanan bo mesela ciwankariyê girîngiyeke zor daye rîtma navxweyî. Bi gelek teknîkan rîtma navxweyî di helbesta klasîkî de dirust dibe û hindek teknîk jî evên li xwarê ne.⁽⁹⁷⁾

1- Dubarekirin

2- Ristên hevterîb

3- Regezdûzî

4- Hevdijî

5- Rawestan

6- Reng

1.8. KÊŞ û RÎTIM DI HELBESTA NÛ YA KURDÎ DE

Helbesta nû ew helbest e ya dahênan di pêkhatayên wê de hatiye encamdan. Evca çî layenê naverokê be yan layenê ruxsarê be, nûkirin di helbesta kurdî de werçerxaneke zor girîng bû, ji ber ku yekem sûd û mifaya gihîştîye helbesta kurdî ew bû ku helbestvanan ji layenê ruxsarê ve dest ji kêşa erûzî berda, berev kêşa xwemalî ve hatin. Wate, kêşa xwemalî kirine binwaşê dirustkirina helbesta nû. Ji layenê naverokê ve helbestvanan girîngî da wan babetan, ewên milletê kurd pêwistî pê heye. Nûkirin di nav helbestê de ji encama çendîn guherankariyan peyda dibe. Evca ew guherankarî çî guherankariyên abûrî, ramiyarî, civakî hwd bin. Dema nûkirin di nav helbesta kurdî de peyda bûye, çendîn eger û fakteran roleka girîng hebûye, ta ku nûkirin bûye cihê girîngpêdana helbestvanan. Hindek ji wan eger û fakteran pêwendî bi barûdoxê navxweyî ve hebûye û hindekên dîtir jî pêwendî bi wan guherankariyan ve hebûye, ewên ku wê demê cîhanê bi xwe ve dîtin. Bi

⁹⁶ N'metulla Hamd Nhêlî, Şewazgerî, Tyorî u Praktîk, r. 202.

⁹⁷ h.j, r. 230.

şeweyekî giştî van fakterên li xwarê bûne egerê dirustikirin û peydabûna nûkirinê di nav helbesta kurdî de.⁽⁹⁸⁾

Faktorên navxweyî:

- 1- Serhildan û damezrandina komel û rêkxistinên siyasî û rewşenbîrî.
- 2- Damezrandina çapxanêya kurdî û derketina rojname û kovaran.
- 3- Girîngîdan bi xwendinê bi zimanê kurdî li qutabxanan.

Faktorên derekî:

- 1- Karîgeriya ewropî û edeba hevsiy
- 2- Barûdoxê şerê cîhanî yê yekê.

Girîngîdana helbestvanan bi kêşa xwemalî li destpêkê li ser destê çendîn helbestvanan bûye. Ev helbestvan di nav mêjûya edebiyata kurdî de weke serkêş û rêberên nûkirina helbesta kurdî tên nasîn. Piraniya serçawe û jêderan amajeyê bi wê çendê didin ku helbestvan Ebdulrehîm Rehmî Hekerî (1890-1958) yekem rêberê helbesta nû ya kurdî ye ji layenê ruxsarê ve: “Berî ku em kêşa penceyî di helestên şex nurî û goranî û pîremêrdî da bi bînîn her di helbesta runakbîrekê wekî 'ebdulrehîm rehmî hekarî da, evî corê kîşê di hête dîtin.”⁽⁹⁹⁾ Ev yek wê çendê digihîne ku helbestvan Rehmîyê Hekerî berî çendîn helbestvanên kurd, girîngiyeke zor daye mesela nûkirinê. Her wisa vekoler Mihemed Bekir Mihemedî di kovara *Zankoya Dihokê* de vekolîneke akademîk û zanistî derbarê ruxsara helbestên Hekarî de belav kiriye. Di wê vekolîna xwe de, ew çend selmandiye ku helbestvanî bo yekem car di nav helbesta kurdî de xalbendî bi kar aniye. Weku amrazê pirsîkirinê, cotxala lêkdayî, amrazê sersurmanê, kevan û cûotkevanan.⁽¹⁰⁰⁾ Derbarê rîtmê di nav helbesta nû ya kurdî de, rîtim yek ji binemayên girîng ên pêkhateya helbesta nû ye.

⁹⁸ Yadgar Resul Balekey, *Sîmakanî Tazekirdnewey Şîrî Kurdî* (1898-1932), weş.dezgehê spîrêz yê çap û weşanê, Dihok, çapxana wezaretê perwerdê, Hewlêr, 2005, r. 27-47.

⁹⁹ Zedîn Mistefa Resûl, *Edebyatî Nwêy Kurdî*, mitbe alt'îlm al'alî, arbîl, 1989, r. 51.

¹⁰⁰ Mihemed Bekir Mihemed, *Edgarekanî Nwêkirdnewe le Şîrî* (Rehmî Hekarî)da, govara Zankoya Dihok, berbenda duwê, h.j. şeş, çirya êkê, 1999, r. 889-892.

Rîtim di helbesta nû de cuda ye ji rîtma helbesta klasîkî, taybetî di rîtma derekî de. Ji ber ku rîtma derekî di helbesta nû de, ne li ser binemayê birgên kurt û dirêj dirust dibe; belku rawestiyanên watayî di helbesta nû de çêkerên rîtma derekî ne. Em dê hewl bidin bi tenê behsa girîngtirîn yekeyên rîtmê di helbesta nû ya kêşdar de bikin.

Rîtim di helbesta nû de û bi taybetî di helbestên kêşdar de, li ser çendîn kêşên helbestê berceste dibe. Hindek kêşên helbestê yek binyatê rîtmê heye, hindekên dî du binyatên rîtmê hene. Li xwarê girîngtirîn yekeyên rîtma helbesta nû ya kêşdar tên destnîşankirin.⁽¹⁰¹⁾

Ji	Kêş	binyatê rîtmê yê êkî	binyatê rîtmê yê duwê
1	4 birgeyî	4	-
2	5 birgeyî	5	-
3	6 birgeyî	3+3	-
4	7 birgeyî	4+3	3+4
5	8 birgeyî	4+4	5+3
6	10 birgeyî	5+5	-
7	11 birgeyî	4+4+3	3+3+5
8	12 birgeyî	4+4+4	3+3+3+3
9	13 birgeyî	4+4+5	-
10	14 birgeyî	4+4+3+3	4+3+4+3
11	15 birgeyî	5+5+5	4+4+4+3
12	16 birgeyî	4+4+4+4	-

Derbarê pêkhênerên rîtma navxweyî di helbesta nû de, helbestvan di helbesta nû de seng û girîngiyeke yekcar mezin dide rîtma navxweyî. Ji ber ku bi rêya rîtma navxweyî helbestvan derbirîne ji naxê xwe dike û mewdayê hest û sozên wî gelek berfireh dibin, rîtim regezeke herî diyar û karîger e di nav helbesta nû de. Helbestvan rîtma navxweyî bi kar tînin da ku serinca wergirî bo tekstê rakêşin. Em dê di bin beşekî terxan keyn ji bo têgeh rîtma navxweyî û rîtma navxweyî di helbestê da.

¹⁰¹ Mes'ud Cemîl, Qonaxên Kêşnasîya Hozana Kurdî, r. 134.

1.9. TÊGEHÊ RÎTMA NAVXWEYÎ

Rîtma navxweyî têgeheke girîng û stratejîk e, di nav teksta helbestê de helbestvan girîngiyeke mezin pê dide. Rîtma navxweyî helbestê bi awazeke serincrakêş diafirîne, ango rîtma navxweyî dînamîkiyeke navxweyî ye ku ruxsar û rêxistineke pêlan bo beramberî xwe dihinêre. Li jêr têgeha rîtma navxweyî zengeke bihêz û awazeke karîger û serincrakêş di nav teksta helbestê de peyda dibe. Evca çî jêderên vê awazê deng bin an peyv bin an girê û riste bin. Ev yek jî para pirtir bi rêya dubarekirinê dirust dibin, rîtma navxweyî bi roleke karîger û bihêz di nav gotara helbestê de radibe. “ Evê corê rîtmê di hemî têksitên edebî da hebûna xwe heye çunkî gelek caran demê têkistekê helbestê yê bê kêş û serwa di xuynîn hest bi corekê rîtim û muzîkê di keyn eve jî xwe di nav rîtma navxoyî da aşkra di bît, û li gel helbestên kêş û serwadar jî û li gel rîtma derve bejdaryê di drust bûna rîtma giştî ya têksitî da di ket, zaravê rîtma navxoyî zaravekê nuy ye di byavê rexne û vekolîn û şêwazan da, di pertûk û jêderên kevin da nahête dîtin, û li gel hindê jî da gelek ya li ser hatîye nvêsin, û heta nuke weku zaravekê dîyar ne hatîye dest nîşan kîrn.”⁽¹⁰²⁾ Ev yek, wê rastiye dupat dike ku têgeha rîtma navxweyî di nav helbestê de tevger e; helbest bi wê tê nasîn û tahmdan. “Ji ber ku rîtma navxweyî têgeheke berfireh e û gelek kiryarên navxweyî vedigire û çendîn layenên binyata navxweyî ya tekstî hembêz dikin. Lewre gelek dîtin û boçûnên cuda cuda li ser hatine gotin. Her nivîserek li dîv dîtina xwe di kujiyêke taybet re vî cureyê rîtmê dibîne. Ev curbicuriya boçûnan jî wê rastiye diselmîne ku rîtma navxweyî hêşta di qonaxa avakirina xwe de berdewam e û sînor û çarçoveyên ku ew vedigire bê sînor in û di şîyan de nîne çarçoveyên wê giş bê eşkerekirin û weke pîverekî lê bê di destê vekoleran de.”⁽¹⁰³⁾ Bi şêweyekî giştî em dişên çendîn danenasînan bo rîtma navxweyî di van xalên li xwarê de bikin:⁽¹⁰⁴⁾

1- Rîtma navxweyî nayê destnîşankirin, çunkî takekesî ye û tê guherîn.

2- Bi gotinê berceste nabe, di xwendinê de derdikeve.

3- Rîtma navxweyî di darijtnê de erkekî hunerî ye, di helwyistdanê de estetîkî ye, her wisa di wergirtinê de xwendin e.

¹⁰² Safye mhemed Ehmed, *Şêwazî Şî're Kurdîyekanî Pîrbal Mehmûd*, r. 91.

¹⁰³ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 227.

¹⁰⁴ Hatim Elsekir, *Elîqa' Eldaxlî*, mîcele eleflam, el'ded (5), Bixdad, 1990, r. 65-66.

4- Nakokî derbarê vî cureyê rîtmê dê vekêş be, çunkî cemserên çend dabeşên hevdubir e ku peyva şî'rayetî wan kom dike, vê peyvê hêşta cihê xwe weku zarave û çemk negirtiye.

5- Dewlemendiya wê di rûxandina dîwarên di navbera helbest û pexşanê de ye, da ku ji rîtma ciyawaz ev her du behremend bin.

6- Her helbestekê rîtma xwe heye ku egereke zal di asta sîmantikî yan dengsazî yan pêkhatinê de, wê rîtmê dirust dike.

Têgeha rîtma navxweyî piştî ku hêz û senga rîtma derekî nemaye di nav teksta helbestê de, ango dema helbestvanan dest ji wan qeyd û zincîran berdan, ewên kêşa helbestê pê tê dirustikirin, rexnegirên edebî ev cureyê rîtmê kirine meydana karê xwe û vekolînên cuda cuda li ser têgehê rîtma navxweyî encam dan. Helbestvanan jî Bizavên mezin kirin da ku bi berfirehî mewdayeke yekcar mezin di nav helbestên xwe de bidin rîtma navxweyî. "Piştî ku semtên nû yên rexneyî hatine meydana edebî û bi taybetî yên ku girîngî dane dabêşa binyatî, mîna formalîzm û binyatgeriyê, û piştî vekolîn li ser muzîka helbestê hatine kirin û cudahî xistine di navbera kêş û rîtmê, berê vekolînan bo du layan hatiye veguhestin, ew jî:

1- Vekolîna take malika helbestê berev rîtma deqî.

2- Vekolîna li ser rîtma navxweyî."⁽¹⁰⁵⁾

Rexnegirên ewropî cihekî taybet daye rîtma navxweyî di nav vekolînên xwe yên rexneyî de, bi berfirehî têgeha rîtma navxweyî kirine mijarên sereke ya babetên xwe yên rexneyî. " Dyarda gringîdan bi rîtma navxoy ya helbestê ji behsên here dyarên rexneya hevçerxa ewropî ye."⁽¹⁰⁶⁾ Belê hêşta bi dirustî pêgeha têgeha rîtma navxweyî di nav babet û mijarên vekolînên rexnegiran de destnîşan nebûye. Ji ber ku têgeha rîtma navxoy ji rexnegirekî bo rexnegirekê dîtir cuda hatiye şirovekirin.

¹⁰⁵ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê di Ş'ra Nûya Kurdî* da, r. 35.

¹⁰⁶ Dilşad 'elî Mihemed, *Binyatî Helbest le Hunrawey Kurdî* da, Namey Diktora, Kulîjî Adab, Zankoy Selaheddîn, 1998, r. 91.

1.10. RÎTMA NAVXWEYÎ DI HEBESTÊDA

pêkhatiya rîtma navxweyî di helbestê de keresteyekî zindî ye bo gelek ji vekolînên rexneyî. Her wisa gelek dîtînên rexneyî li ser rîtma navxweyî peyda bûne. Piraniya dîtînên rexneyî jî li ser wê, wek hev nebûne. Belê hewl û bizava kontrolkirina rîtma navxweyî destnîşankirina yasaya giştî ya wê heta niha dîr e ji bo destveînana destkeftiyên dîyar û berçav. Ji ber ku rîtma navxweyî vala ye ji pîveran ev cureyê rîtmê piştbestinê li ser yasayên derûnî yên takî dike.⁽¹⁰⁷⁾ Ev boçûn tekeziyê li ser wê çendê dike ku bi zehmet e em bişên çarçoveyekê yan sînorekî bo rîtma navxweyî destnîşan bikin, ev bi xwe gewherê rîtma navxweyî ye. Ji ber ku eger me ew bixista di biyavekî berteng de wê demê çu cudahî di navbera vê rîtmê û rîtma derekî de namînin.

Di nav hemû cureyên helbestên kurdî de rîtma navxweyî hebûna wê pêdiviyeke hetmî ye, belê hêz û karîgeriya wê ji cureyekî helbestê bo cureyekî dîtir cudabûn heye. Bo nimûne di helbesta nû ya kurdî de rîtma navxweyî pirtir zal e li beramber helbesta kevin, ew jî ji ber van egerên li xwarê:⁽¹⁰⁸⁾

1- Ladan ji bunyat û şeweyê nvîserê helbestê bi egerê here serekî di hête danan, bi taybetî guhorîna sîstemê dêr û dû dêra helbestê.

2- Gişt ew ladanên di nav rîtma derve da peydabûyn piştî ku kêş û serwa lawazbûyn, ev çende bû egerê zalbûna rîtma navxoya helbestê.

Ku wate şewaza zalbûna rîtma navxweyî ji cureyekî helbestê bo cureyekî dîtir tê guherîn. Ev yek jî vediger bo wê yekê ku şewaza her cure helbestekê cureyekî rîtmê li ser tê sepandin. "Siruşt rîtma navxweyî di navbera helbesta kevin û helbesta nû de ji hev cuda dibe, lê ne ku di formên helbesta kevin de, rîtma navxweyî pirtir nêzîkî eşkerebûnê ye. Berovajî di helbesta nû de pirtir nêzîkî veşartinê ye. Ew jî ji ber egera bi sanahîkirinê, çunkî dengê zîq ê kêşê di helbesta kevin de ku selîqe heye û heman dubarekirin e, gelekê bilind e ku rîtma navxweyî berev veşartinê biçe."⁽¹⁰⁹⁾ Ev cudabûna rîtma navxweyî ji cureyekî helbestê bo yekî dîtir pirtir pêwendî bi cureyên dîtir ên rîtman ve heye, ewên di nav helbestê de, helbestvan diafirîne. Bo nimûne di

¹⁰⁷ Mihemed Sabir 'Ebeydî, h.b, r. 65.

¹⁰⁸ Safye Muhemed Ehmed, *Ladan Le Şî'ri Hawçerxi Kurdî* da, r. 245.

¹⁰⁹ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê di Şi'ra Nûya Kurdî* da, r.41.

nav helbesta kevin de rîتما derekî pirtir senga xwe heye ji rîتما navxweyî; berovajî di nav helbesta nû, serbest, nûxaz de, rîتما navxweyî hêz û senga xwe pirtir heye ji rîتما derekî. Dema helbestvanan dest ji rîتما derekî berdan, senga hêza helbesta xwe xistine li ser rîتما navxweyî. Wê demê afirandina rîتما helbestê bo rîتما navxweyî ma. “Rîتما navxweyî zaraveyeke nû ye, hatiye di nav rexneya edebî de û di biyavê helbestê de tê bikaranîn. Piştî ku şoreşek li ser têgeha kêş û rîتما derekî hatiye kirin, vî cureyê rîتمê şiya weke cihgîrekî çalak û pir bizav cihê wê rîتما derekî rolê bigêre û wê lawazî û valatiya rîdayî tije bike.”⁽¹¹⁰⁾ Çend vekolînên rexneyî li dor rîتما navxweyî ya helbestê bên encamdan, nagihêjin pileyeke berz ji ber ku rîتما navxweyî nemaye di hindê de ku di şiyana de be yasa û rêkarên rêkxistina wê bên nîgarkirin. Ev jî ji ber amadenebûna pîveran e di nav rîتما navxweyî ya helbestê de. Ev ji layekî ve, ji layekî dî ve rîتما navxweyî piştbestneke yekcar mezin li ser bikaranîna şiyana takekesî dike.⁽¹¹¹⁾ Ku wate girîngpêdana helbestvanî bo rîتما navxweyî, ji ber derbirînên xwe yên sozdarî û derûnî ne û zalbûna helbestvanî ye li ser keresteyên zimanî, ewên di nav tekstê helbesta xwe de bikar anîye. “Mebest ji rîتما navxweyî; hest û sozên helbestvan yên taybet in bi pît û peyv û paragrafan, bi awayekî ku ew hest û soz, wan pît û peyv û paragrafan bi awayekî guncayî û rêkûpêk di nav parçeyekî tekstê yan di tekstê hemiyê de bi kar bîne. Bi watayeke dîtir, rîتما navxweyî hestkirin e bi ciwankariyên zimanî û bihayên wî yên dengî û pêkhateyî. Roleke girîng di nav muzîkê de digêre.”⁽¹¹²⁾ Rîتما navxweyî di nav xwe de dibe du beş û her beşek jî xwedî delaleta xwe ya taybet e, belê keresteyên her du beşan pêkhatî ne ji keresteyên zimanî. Ku wate hêvênê dirustbûna rîتمê, alav û keresteyên zimanî ne. Ew her du beş jî ev ên li xwarê ne.⁽¹¹³⁾

1- Rîتما navxweyî ya eşkere: Ev cureyê rîتمê di ciwankariya peyvê de dîyar dibe, weku regezdûzî, her wisa dubarekirina pîtan jî bi xwe ve digire.

2- Rîتما navxweyî ya veşartî: Ev cureyê rîتمê hest pê tê kirin di nav seqayekî guncaw de ligel hilçûna helbestvanî, herwekî helbestvanî guhekî navxweyî hebe li pişt guhê wî yê dîyar ku her tiştekî guh lê dibe ji bizav û livînan. Ev cureyê rîتمê bi helbestvanan xweş e bi kar bînin.

¹¹⁰ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 225.

¹¹¹ Mes'ud Weqad, *Elbinye Elîqa'ye Fî Ş'r Fedwa Tuqan*, rîsale macsitîr, r. 94.

¹¹² N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 227.

¹¹³ Dahu Asye, *elîqa' elm'newî Fî Elsure Elş'rye (Mihmud Derwêş)* nimusecen Rîsale Macsitîr, kulye el-Adab, Cam'e hesîbe bin bu 'lî, 2009, r. 96.

Bi vê çendê wisa bo me dîyar dibe ku rîtma navxwe ya eşkere tê dirustkirin bi rêya hindêk şêweyên hunerî, ewên helbest li ser tê avakirin. Derbarê rîtma navxwe ya veşartî di nav helbestê de pêdivî ye wergir bi şarezayane serederiyê ligel vî cureyê rîtmê bike, da ku li ser çêja helbestê hilbibe û bigihe rastiya hem şîyanên helbestvanî û hem karîgeriya dewlemendiya rîtma veşartî. Ji ber ku rîtma navxweyî erkekî hunerî yê mezin digêre di binyatnana avakirina binyata rîtmî ya pêkhatiya teksta helbestê de, serhîlbûn yan hestpêkirina wergirî bi rîtma navxweyî di nav helbestê de pêdivî bi paşxaneyê rewşenbîrî û bîrtûjiyê gelek berfireh heye. Ji ber ku ev cureyê rîtmê di nav helbestê de ne eşkere û berçav e her çend radeya hestpêkirin û hestpênêkirina wergirî bo rîtma navxweyî li ser du hokar û fakteran rawestiyaye, ew jî.⁽¹¹⁴⁾

1- Ezmûn û serbora wergirî bi xwe bo wergirtina rîtma helbestê.

2- Cureyê wê helbesta tê pêşkêşkirin, yan ew helbesta wergir werdigire, ew helbest helbesteke stûnî ye yan helbesteke serbest e yan jî pexşane-helbest e.

Lewre ya “girîng di rîtma navxweyî de ew e em bi dîvçûn û dîyarkirina amrazên wê yên derbirînê rabin, ewên kar dikin ji bo pirkirina wê lawaziya di rîtma derekî de dîyar dibe. Evca çî di nav binyata dengî de be weku (*secî'ê*) yan di binyata delalî de be weku beramberiyê yan di binyata dengî ya delalî de be weku regezdûzî, ligel kontrolkirina paşmayê kîr ê van hemî binyatan ew jî dubarekirin e.”⁽¹¹⁵⁾ Ke wate zalbûn li ser rîtma navxweyî, pêdivî bi hindêk mîkanisman e, da ku em di lêgerîna wê de, bişên bi şêweyekî serleber hemî wan pêkhatyan destnîşan bikin yên bûne egerê dirustbûna rîtma navxweyî di nav teksta helbestê de. Çunkî rîtma navxweyî ne pabend e bi hindêk yasayan ve û wergir bi sanahî ligel aşina bibe. Bi derbirîneke dîtir rîtma navxweyî ne wekî rîtma derekî ye ku tefîle û yeksaniya birgan di helbestê de wergir hest bi hebûna rîtmê dike. Rîtma navxweyî bi hîç şêweyekî pêwendî bi zanista kêşnasiyê û rîtma derekî ve nîne. Belku pêwendî bi wê çendê ve heye, ewa dêra ji pît û peyv û risteyan jê dirust bûye. Di vir de helbestvan di afirandina rîtma navxweyî de piştbestinê bi şêwaz û şêweyên hemecor dike, ango piştbestin li ser şarezayî, şîyan, karame û çêja xwe ya muzîkî û zimanî dike.⁽¹¹⁶⁾ Xwegirêdan bi yasayêke cîgîr ve, şîyanên dahênanê lawaz dike û mewdayê hizirkirina helbestvanî bertesk dike. Rîtma

¹¹⁴ Yasrê Hesenî, *Dînamîkya Runahî Taryê Di Avakirina Rîtma Ş'îrî Da* (Sitran u Bevir Ê Agir) wek nimûne, govara peyv, hijmara(65), êketya nvîserên kurd tayê dihok derd êxît, 2012,r.29.

¹¹⁵ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî û Praktîk*, r. 227-230.

¹¹⁶ Dahu Asye, *Elîqa' Elm'newî Fî Elsure Elş'rye (Mihmud Derwêş)*, r. 77.

navxweyî ne pabend e bi çu yasayan, lewre helbestvan di dirustkirina wê de hest bi cure serbestiyekê dike, dema helbesta xwe diafrîne. Ev yek jî dê gelek rêyan li ber helbestvanî veke ku dahênanê di nav helbestên xwe de bike “rola helbestvanî di afrandina rîtma navxweyî de, roleke cêgîr û gewherî ye.”⁽¹¹⁷⁾ Armanca rîtma navxweyî di nav helbestê de, hevgirêdana keresteyên zimanî ye, bi endazeyeke rêkxistî û karîger. Ev kereste alavekî guncaw e bo dahênana helbesteke serincrakêş. “Mebest ji rîtma navxoy ya helbestê pêgvegoncandna ewî rûberê dengdar û bê dengaye yan pît û yekeyên fonetîkî ye ku naçne di çwarçuvê kêşnasî û rîtim nasî ya klasîkî da, çunku rîtma navxoyî milkeçî pîverên pêşwext nîne, pişbestinê bi yasayên deste cem’î naket, belku pişbestinê bi xwastên takekesî di ket, ew jî ji layê hev awazî ya pîtan û bunyatê peyvan û pêkhatên rêzmanî di hête xwandin.”⁽¹¹⁸⁾ Helbestvan neşet bi dirustî peyama xwe bigihîne wergirî eger hindêk yasa û destûr hebin ku mewdayê karê wî berteng bikin. Lewre rîtma navxweyî şiyânên helbestvanî bo wergirî dîyar dike. Wergir bi rêya rîtma navxweyî dişê biryarê li ser dahêneratiya helbestvanî bide. “Li demê em behsê rîtma navxoya helbestê di keyn, wate bi ramana rêkxistna peyvan di nav dêrên helbestê da, yan jî dûbarebûna çend dengekan bo cend caran ew deng ji yê bizwên pît ji ne bizwên bît, evca ev rîtme muzîkeka xweş di dete helbestê, û xwandna wê core xweşî yekê di dete xwandevanî û behremendî ya helbestvanî pitir dîyar di ket.”⁽¹¹⁹⁾ Helbet dahênan di karên edebî de nexasim di biyavê helbestê de hevbend e bi rêjeya bikaranîna regezên karîger ve di nav helbestê de, bêguman yek ji wan regezên herî kara û karîger rîtim e û bi taybetî rîtma navxweyî. Divê em wê çendê ji bîr nekin ku afrandina rîtmê bi taybetî rîtma navxweyî wekî Celal Elxiyat bo diçe, yek e ji egerên ciyawaziya dahênanê, her wisa hokarek e bo pirtir pesendkirina helbestekê ji helbesteke dîtir, çunkî hevbendkirina serkeftî di navbera peyvan de, ku berî hingê nebe, şewaza xweser peyda dike. Her wisa gavên pêkanîna tekstê dema bi ser zimanî de digirin, rehendekî demî yê mikum û di nav êkra yan yê giran, yan sist û xaf yan navnicî disepîne. Ew jî bi hezeke hişyar vî zimanî dorpêç û milkeçî hestê mirovayetiye bike, yan bi nehişyarî be, wê demê xwe yê xweser pê ve datîne, ango gewherê rîtma wê ya navxweyî.⁽¹²⁰⁾ Ku wate mebest û raman ji rîtma navxweyî “Hest

¹¹⁷ 'Bdulrehman Elwecî, *Elîqa' Fî Elş'ri Xeself*, eltib'e eluwla, dar elhesad lîlnişir û eltuzî', Dîmişq, 1989, r.80.

¹¹⁸ 'Bdulqadir Heme Emîn Mhimd, *Binyatî Karnameyî le Deqî Nwêy Kurdî da*, r. 189.

¹¹⁹ Husên Xazî Kak Emîn, *Nwêkirdnewey Şî'rî Kurdî* le salî 1932-1949 le Kurdistanî 'îraqda, weş. Nawendî blawkirdnewe, Hewlêr, çapxaney Rojhlat, Hewlêr, 2008, r. 235.

¹²⁰ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê di Ş'ra Nûya Kurdî da*, r. 40.

pêkirne bi îstatîkaya zimanî û buhayê dengî û avakrinê, kewate rîtmeka bi evî corî pişbestinê bi pêngavan naket, belku bi rêa çend dîyarde û bnema û teknîkên taybet di hête drust kirin.”⁽¹²¹⁾ Bi şêweyekî giştî rîtma navxweyî di teksta helbestê de ji rîtma derekî tê cudakirin, ku cextkirin li ser regezê dengî nîne, bi wê pileya rîtma navxweyî cextê li ser dike, eger piştguh nexe, radibe, dike di nav teksta helbestê de û di nav astên din ên pirtir pêwendî bi pêkhateyên tekstî ve hene, weku ziman, wêne, ceveng û pêkhateya giştî, pêvegirêdana beşên wê her wisa dûratiyê di navbera navxweya tekstî û ji derveyî wê nahêle yan di navbera ruxsar û naveroka wê de.⁽¹²²⁾ Rîtma navxweyî di teksta helbestê de livîneke rêkxistî ye û zal e li ser vehandina helbestê; her wisa sîma û salûxetên helbestê cuda dike ji hemî tekstên dîtir. Ev livîna navxweyî wergir bi sanahî têngahiye bi rêya guhdariyê, çunkî ew livîneke dengî bi tenê nîne. Belku tê famkirin bi rêya têngihîştineke temam bo werara livîna rîtmê di nav avakirina tevgera yek tekstê de. Rîtma navxweyî ew bi xwe stratejiyeke taybet e bo her yek ji axaftinkerî û wergirî, ango helbestvan û wergir li dîv diçin, niha rîtma navxweyî pabend nabe bi demeke dîyarkirî ve, derbirînê ji hêzeke zindî û paqij dike, bi vî şêweyî rîtma navxweyî di nav helbestê de berev rîtmekê diçe, ku wata û hizir û mebestan bi xwe ve digire. Ev cureyê rîtmê bi şêweyekî gelek berfireh di nav helbestê de tê bikaranîn. Ev yek jî ne tiştekî herwe ye belku helbestvan tiştekî serincrakêş pêşkêşî xwendevanî û wergirî dike. Her wisa guncandinê di navbera gişt seqayê helbestê de dike. “Rîtma navxweyî ji encama rêkxistineke hîr û temam, her wisa ciwaniya peyvan û destewajan di nav teksta helbestê de dirust dibe, bi şêweyekî ku pêwendiyê hemahengî di navbera dangan de hebe. Ev çend jî hindek caran helbestvan bi mebest û armanc bizava rêkxistina wan dide û hindek caran jî ji bêhişî û ji nişkê ve di nav teksta helbestê de dirust dibe.”⁽¹²³⁾ Rîtma navxweyî pişbestinê dike ser hindek şêwaz û teknîkan da ku karîgeriyeke hunerî yekser li ser mejiyê wergirî bê kirin, wekî teknîkên dubarekirinê û regezdûzî û hevterîbî. Belê teknîka dubarekirinê ji hamû teknîkên dîtir pirtir karîgerî heye di avakirina rîtma navxwe ya helbestê de. Dubarekirin roleke kara digere di dirustkirina rîtma navxweyî de, lewre dubarekirin regezeke vebir û sereke ye di dirustkirina rîtma navxwe ya helbestê de. “Rîtma navxweyî pêkhatî ye ji wê awaza dangan û pêveguncandinê, her wisa paş û pêşxistina

¹²¹ Cebare Ehmed Hsên, h.b. r. 198.

¹²² Mihemd Sabir Êbîd, h.b, r. 62.

¹²³ Hisîn 'bude, *Eltib'e Fî Elş'r El'rbî Elm'asêr*, rîsale macsîtîr, Kulye El-adab, Cam'e El-besre, 1984, r. 290.

peyvan.”⁽¹²⁴⁾ Helbestvan girîngiyeke mezin didin dubarekirinê ji pêxemet dewlemendkirina rîtma navxweyî. “ Helbestvan rîtma navxoy bi helbjartin û dûbarekirna pît û birge û pyeyv û destewaje û çend ristekan yan bi dûbarekirna peyvekê li ser heman kêş coreyekê rîtmê di dete helbestê.”⁽¹²⁵⁾ Rîtma navxweyî rastexwe “ Peywendî bi barê derûnî û hest û soza helbestvanî ve heye û welê di ket li demê derbirîna hest sozên xwe da ewê rîtma taybetî wer bi grît çunkî rîtim rengevedana barê derûnî yê helbestvanî ye, ji ber hindê bi baştirîn rêk rîtma navxoy di afrînît bo derbirîna hest û sozan, pêdvî ye ev hest û soze jî li ser bna xê rîtma navxoy ya helbestê vekolîn li ser bi hête krin, çunkî hest û sozên helbestvanî ji egerê rîtma navxoyî di hêne derbirîn, wesa dîyar evê jî peywendî ya bi şyan û desthelat û behremendî ya helbestvanî ve ya hey, sebarew ewan deng û peyvên ku bi kar di inît di dahênana helbesta xwe da û çawanya zalbûnê bi ser da.”⁽¹²⁶⁾ Serbora helbestvanî bo rîtma navxweyî gelek girîng e, çunkî ev cureyê rîtmê derbirînê ji naxê helbestvanî bi xwe dike. Ku wate helbestvan rîtma navxweyî alavekî baş dizanin bo derbirîna hest û sozên xwe. “ Ev rîtme bo têksitê helbestê proseyeke gringe çunkî rîtma navxoy proseyeke tak û bê yasa û bi şewekê karekî hebûna xwe nîne belku bi şyanên wî bi hêz bi kevît, helbestvan erkekê gring û serekî di bînîtin di çawanî ya serederîkirna li gel yekeyên zimanî û bercestekirna rîtma navxoyî û serbura xo ya helbestê, xwandevan jî ji encamê şruvekrin û huyirbînî ramanên cuda cuda bi helbestê di bexşît, eve jî ji janrekê edebî bo janrekê dî yê edebî di hête guhorîn, çunkî li dîv ew helçûn û xeyal û barodoxê derûnî yê helbestvan têda û ew wata û mebest û hizra helbestvanî di vêt derbirînê jê bi ket ew rîtim bilind û nizim di ket, û ast û pileya bi hêzî û lawazî di guhorît, ji ber hindê hendik caran em hest pê di keyn li hindek cihan di têksitî da rîtim zora çir û karîgere û di hindek kuplan da ya asay ye û ew hêz nîne.”⁽¹²⁷⁾ Helbestvan di baştirîn halefî de dema prosa nivîsîna helbestê penayê bo rîtma navxweyî dibe ji pêxemet wê çendê wî barê yan wî erkê li ser wî pêdivî bi baştirîn şewe bigihîne wergirî. “ Şewazê nvîserî gelekê gringe bo dest nîşan krin û dîyar kirna bnemayên evî corê rîtmê di têkistekê edebî da, çunkî rîtma navxoyî hest û soza helbestvanî ye, û taybete bi pîtên peyvan ve, helbestvan çawa hest û sozan bi rêka ewan keristan derdibrît, ewan pît û peyv û pergravan bi şeweyekê rêk û pêk di

¹²⁴ Dilşad 'elî Miuhemed, h.b, r. 91.

¹²⁵ Husên Xazî Kake Emîn gelaleyî, *Rewtî Nuykirdnewey Şî'rî Kurdî Le Başûrî Kurdistan(1980-1991)*, r. 87.

¹²⁶ pexşan 'elî Ehmed, h.b, r. 132.

¹²⁷ Safye Muhemed Ehmed, *Ladan Le Şî'rî Hawçerxî Kurdî da*, r.233-234.

nav beşekî yan hemî têksitî da bi kar di înit, bi ramaneka dîtir rîtma navxoyî hest kirne bi cwanî ya zimanî û buhayên dengî û pêkhatên wê, ku erkekê gring di nav bunyatê rîtmê da di gêrin.¹²⁸ Helbestvanên nû gelek senga helbesta xwe dixin li ser rîtma navxweyî. Ev jî ji ber wê çendê ku bi baştirîn şêwe derbirîne ji hest û sozên xwe bikin û derûnê xwe pê aram bikin. “ Helbestvanên nuy di vî byavî da hewl daye bo derbirîna hest û sozên naxê xwe û ezmûna xwe ya helbestê ji kêş û serwaya dyarkirî dîr bi kevin, û bi şêweyekê nuy hizir di avakirna helbesta xwe da bi ken, û peyamên xwe bi rêka hizrên nuy bi gehîne xwandevanî, weku ya dîyar pitir di rîtma navxoy ya helbestê da kar li ser evê çendîç hatîye krin, û gringî ya ewê bo hindê di zivrît, ku drustibûna ewê rîtmê barodoxê wijdanî yê naxê navxoy ya helbestê pêk di înit.”¹²⁹ Dema prosa şîrovekirina rîtma navxwe ya helbestê çî pîver nebin, dê her rexnegirek ji hindêk layenan ve tiştekî têxe li ser rîtma navxwe ya helbestê. Ku wate her vekolerek bi renekî û ji kujyekî berê xwe dide rîtma navxweyî. Ew jî li gor wan encamên ew vekoler di vekolînen xwe yên taybet de li ser tekstên helbestê gihîştîye. Lewre weke xwe parvekirinan bo didanin, ku di hindêk xalan de ji hev cuda ne û di hindêkan de jî wek hev in. Reng e baştirîn rêk bo bi serhîlbûna hemî layenên vê dabêşê ew be vekolîn li ser astên binyata giştî ya tekstî bê kirin, bi taybetî di van astên li xwarê de:

1- Asta fonolojîk: Ev ast girîngiyê dide fonîmê, ku biçûktirîn yekeya dengî ya şîyanên jihev cudakirina peyvan heye. Bi rêya vê astê em dişên vekolîne li ser dubarekirina dengên û belavbûna wan bi renekî destnîşankirî di nav rêzika helbestê de yan li ser asta tekstî bikin.

2- Asta morfolojîk: Ev ast girîngiyê dide morfîmê wek biçûktirîn yekeya sîmantîkî ya serbixwe. Her wisa bi rêya vê astê em dişên wekheviya di navbera morfîman de heyî vekolin.

3- Asta sîntaksî: Bi rêya vê astê em dişên têbîniya cihên peyvan di nava rêzbendên risteyên bineretî û veguhastî de bikin. Her wisa varêbûnen di rêzbenda zimanvaniya bineretî de destnîşan bikin. Li vir eger hindêk riste li ser asta teksta

¹²⁸ Safye Mihemed Ehmed, *Şêwazî Şî're Kurdîyekanî Pîrbal Mehmûd*, r. 92.

¹²⁹ Şaxewan Ferhad Mhemed, *Kurtîle Şî'ri Le Edebî Hawçerxî Kurdîda* be nmûne deqekanî (qubadî celîzade, letîf helmet, dilşad 'abdulla), wej. belawkirdnewey yekêtî Nûseranî Kurd, çapxaney Roj Helat, Hewlêr, 2014, r. 172.

helbestê hemaheng hatin, ev hemahengiya risteyan ne hema dibe faktereke alîkar bo dirustbûna rîtmê, belku reng e bibe elementeke zal ango dirustker di vê prosesê de.

4- Asta sîmantîkî: Reng e siruşt a vê astê ji siruşt astên berî xwe cuda be. Çunkî hestewerên bihîstinê neşên wê mîna astên terkîbî destnîşan bikin. Çunkî asteke veşartî ye, bi rêya hizrê di hête nyasîn.⁽¹³⁰⁾ Vekoler û rexnegiran bizavên xurt kirine ji pêxemet wê çendê ku gişt regezên di nav rîtma navxweyî de hatine bikaranîn şîrove bikin, da ku senga rîtma navxweyî bê selimandin. Lewre rexnegiran çend boçûnek bo wan regezan danîne, ewên rîtma navxweyî di nav teksta helbestê de berhem înane, bi vî şeweyê li xwarê:⁽¹³¹⁾

1- Pêkhateya zimanî di dema hemahengîkirinê de.

2- Dubarekirin li dîv şeweyê bercestekirî tê encamdan, ji bo gihandina wataya xwe.

3- Belavkirin û dabeşkirina pêkhateyên rîtma navxweyî li ser astê pêkhateya helbestê, ji pêxemet armanceke diyarkirî.

4- Cextkirin li ser muzîka hindêk peyvên ferhengî û hevsengîkirin di navbera pîtên wê de.

Ku wate bi şeweyekî giştî em dişên bibêjin ku rîtma navxweyî di nav helbestê de berev rîtmekê diçe, ku wate û hizra pêkhateyan bi rêya keresteyên zimanî bi xwe ve digire. Helbestvan jî bi baştirîn şeweyî rîtma navxweyî bo helçûnên xwe yê derûnî û sozdarî bikar tîne. Ji layenê xwe ve wergir jî çêj û xweşiyeye bêsînor jê werdigire.

¹³⁰ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê di Ş'ra Nûya Kurdî* da, r. 37-39.

¹³¹ Mes'ud Weqad, *Elbinye Elîqa'ye Fî Ş'r Fedwa Tuqan*, r. 136.

2. BEŞA DÛYEM



1.1. TÊGEHÊ DÛBAREKIRINÊ:

Têgehê dûbarekrinê êk ji dîyardên here berbelave û bi şêweyekê ektîf û karîger di gişt têksitên dahênanî da di hête bi kar înan, ev çende jî amajê bi ewê çendê di det ku ev dîyardeyeka cîhanîye, herwesan dûbarekrin rêçkeke ji rêçkên axiftnê û di nav nivêsfîna karên hunerî da bi şêweyekê berfreh di hête bi karînan, çêdbît dûbarekrin di dahênana karê edebî da haletekê derûnî li dev dahênerê têksitê edebî rengve didet, anku dahêner derbirînê ji naxê xwe di ket, wate têgehê dûbarekrinê di sadetrîn astê wêda ewe dahêner peyvekê yan axiftnekê bînît û paşî ewê peyvê yan ewê axiftnê dûbare bi ket, efca ji layê watyêve wekî wê bît yan ya cyawaz bît, yan jî watayekê bînît û dûbare bi ket û eve ji mercên ewê rêkeftna wata êkê duwê ye, eger hat ew peyv û wata di êkgirtî bin sud û mfayê wê ewe cextkirna babetîye, belê eger peyv êkbin û wata ya cyawaz bît sud û mfayê wê cextkirne li ser watayê, eger dûbarekrin bi çîte di nav mewdayê hunerî da li ewî demî şyanên ewê dûbarekrinê bi aşkrayî der di kevin, herwesan di nav karên hunerî da têgehê dûbarekrin mifayên nuy berhem di înit daku bi evê rêkê têgehê dûbarekrinê di nav karên hunerî da xwe bi sepînît⁽¹³²⁾ wate têgehê dûbarekrin di nav biyavên hemeregên jyanê da di hête bi karînan belê wize û karîgerîya ewê ptir di nav dahênanên hunerî da ya zaltre, çunkî karên hunerî xwedî cwanî û îstatîkeka bê wêneye ji ber evê çendê (helbjartna me di kevîte li ser vekolîna bunyatê dûbarekrinê û gringîya ewê di bercestekrin û pêkhata karên hunerî di dahênana berhemê edebî da, herwesan bihayê wê yê delalî û asuyên dûbarekrinê yên cwankarî û ektîfkirna têgehê wê yê karîger)⁽¹³³⁾ li ser evî binemay têgehê dûbarekrinê êk ji gringitrîn rêkên derbirînê ye, ew bi xwe têkistan heldibjêrît ji bo cextkirna gringîya peyamê ewa di vêt bi hête gehandin, herwesan dûbarekrin mîna dergehekê rasteqîneye bo derbirîna hzir û bîrên dahênerî, dnavbera ew kersitên dahêner dûbare di ket ji ewan têksitên helbjartî em di bînîn têgehê dûbarekrinê ji ewan rêbazane ewên gelek di pîşeyên gişt têkistan da di hête bi karînan.

¹³² Mihemed Sabir „Ebeyd, h.b, r. 192.

¹³³ Mihimed Mistef Kelab, h.b. r. 70.

1.2. DUBAREKIRIN DI HEBESTÊDA:

Dubarekirin pêkhatyeke şêwazgeriyê ya berçav e di nav helbestê de. Rexnegir û vekolerên edebî girîngiyê mezin pê didin, çunkî pêkhatiya wê ya hunerî wizeke rîtmê heye. Her wisa dubarekirinê asoyeke me'newî heye. Dubarekirin bi dîtina rexnegir û vekoleran bi teknîkên şêwazgeriyê tê hejmartin. Li ser asta tekstî diaxive. Bizaveke eşkere dide teksta helbestê ku gelek bersivan dide. Ev yek dibe eger ku ew bibe xwedî estetîkiyê veber. Dubarekirin tê hejmartin bi cextkirina rîtmê bi hemî şêweyên wê ve û kar dike ji bo hêzkirin û xurtkirina wê di endazekirina rîtmê de. Teoriya rîtmê piştbestineke mezin li ser dubarekirinê dike bi şêweyê sereke di helbestê de û nehêniya serkeftina gelek layenên ciwankariyê ye.⁽¹³⁴⁾ Dubarekirin di nav helbestê de ne bi tenê bo bihêzkirina layenê ciwaniyê ye, belku dubarekirin bi dînemoyê komkirina watayên hemecor tê nasîn. Faktoreke sereke ye di avakirina rîtma navxwe ya helbestê de. “Dubarekirin di tekstên ne edebî de yan dewrûberê gotara ne şî'rî de berev armanceke giştî ve diçe. Ew jî dupatkirin e li ser peyva dubarekirinê yan destewajê, ji layenê watayê ve. Belê dubarekirin di doxê tekstên edebî de buhayê dengî heye, ku mifa jê tê wergirtin bo darijtna rîtma navxwe ya teksta helbestê, ji ber ku pêkhatiya muzîkê di bineret de ji bineretên vî zimanê helbestê ye, ku ji dabeşkirina sazgeha wê nayê cudakirin. Her wisa dabeşkirina pulên peyvan tê de. Bi vê çendê dubarekirin di teksta helbestê de bi hindek buhayan tê berhemînan, wekî buhayê muzîkê bi rêya dubarekirina pîtan di dêra helbestê de, yan dubarekirina peyvê, ewa zengeke muzîkî dide, ku ligel wê buha û watayeke me'newî heye, dupatîyê li ser wê wateyê dike ewa helbestvan pêşkêş dikin.”⁽¹³⁵⁾ Ku wate dubarekirin di nav gotara neşî'rî de bi hîç rengê naşê bibe egera afirandina rîtmeke kara û serincrakêş bi giştî û rîtma navxwe ya helbestê bi taybetî. “Dubarekirin yek ji fakterên herî girîng e ji bo peydakirina rîtma navxweyî, zêdebarî vê çendê jî, ew bizavê dike ji bo bi samankirina binyatê helbestê bi rîtmeke hemereng û necêgîr û

¹³⁴ 'Bdulletîf Hnî, *Nesîc Elîkrar Beyne Elcemalye û Elwezîfe Fî Ş'r Elşuheda Elcezaîrîn Dîwan Elşehîd elrebî'* buşame nimuzecen, micle 'lum elluxe el'ribye û adabuha, (çapa4), minşurat cam'e elwadî, r.34.

¹³⁵ Mihemed Kemal Silêman Hemade, *el-Xîtab Elş'rî 'Nid Îbin Hemdîs Elseqlî* (dîrase îslubey), rîsale macsîtîr, Kulye el-Adab, Cam'e e-Lîslamyê - Xeze, 2012, r. 7.

digel delaleta giştî ya helbestê, guncandin û rêkxistnekê peyda dike. Lewre ferz e wergir di nav teksta helbestê de bi hûrbînî temaşeyî dubarekirinê bike û radeya pêwendiya wê bi delaletê ve dîyar bike. Dubarekirin bi xwe jî xwe di çendîn wêneyan da berçav dike û di çendîn biyavan de tê peyrewkirin.”⁽¹³⁶⁾ Dubarekirin di helbestê de alavekî zindî û karîger e di destê helbestvanî de. Gelek karên estetîkî û hunerî di nav tekstê de encam didin, lewre helbestvan bi kar tînin da ku pireke mikum di navbera teksta helbesta xwe û xwendevanî de dirust bikin, şiyar û lêhatiya xwe bi rêya teknîkên dubarekirinê bigihîne wergirî. “ Bi kurtî bunyatê dúbare di helbestê huşyarî yeka hunerî ya pêşkeftî ya helbestvanî ye, ew jî bi rêka runkirna formên cora û cor di têksitî da, bi şêwazekê dahênerane bi tnê her çêja rut nebît belkî delalet û şîrîyetê bi dest ve bînît, û bersiv derê ketwarê ezmûn û taybetmendiyên wî bît.”⁽¹³⁷⁾ Binyata teksta helbestê tê xemilandin bi teknîka dubarekirinê. Bi şêweyekî berfireh, ev xemilandina berfireh bi hîç şêweyekî bêzariyê bo xwendevanî dirust nake, eger bi şêwazeke hunerî ev dubarekirin were darijtin. “Dubarekirin teknîk û şêwaza sereke ya dirustbûn û avakirina teksta edebî ye.”⁽¹³⁸⁾ Ango helbestvan dubarekirinê bi kar tînin da ku resentiya teksta helbesta xwe zindî û karîger bihêlin li ser wergirî, feqetyan yan dûrketina helbestvanî ji teknîka dubarekirinê dê bibe egera lawaziyeke serliber bo helbesta wî û neşê hevsengiyêke temam di navbera tekstî û wergirî de peyda bike. Ji ber girîngiya binyata dubarekirinê û belavbûna wê di nav gotara helbestê de û ew pêşvebirina binyatê helbestê ya bidestveînayî. Her wisa ji encama karîgeriya dubarekirinê li ser frêker, peyam û wergirî ev çend bo egereke zor girîng e ku gelek xwendin û vekolînên şêwazgerî li ser bên encamdan. Ev xwendin jî gelek astan bi xwe ve digire da ku pêkhateya wê bi dirustî bê zanîn.⁽¹³⁹⁾

Di nav teksta helbestê de ji bo prosa dubarekirinê du yasayên girîng pêdivî ne, ew jî.⁽¹⁴⁰⁾

1- Yasaya sozdarî: Dubarekirin di rastiya xwe de rijdbûnek e li ser layenekê giştîgîr di nav peyamê de, ku helbestvan gelek girîngiyê pê didin, zêdetir ji regezên dîtir. Dubarekirin ronahiyê dixê ser xaleke girîng di peyamê de, girîngiya helbestvanî

¹³⁶ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 316.

¹³⁷ 'Bdalqadir Hme Emîn Mhim, h.b. r. 206.

¹³⁸ Mihimed Xanmî, *El-Mstilihah Eledebye Elhidîse Dîrase Ê M'cim Înglîzî- 'Rbî*, eltib'e elsalse, elşîrike elmêsrye al'alemye lînişr, 2003, r. 91.

¹³⁹ Mihimed Mistef Kelab, h.b. r. 71.

¹⁴⁰ Nî'me Rebuh, *Zahîre El-Tîkrar Fî Elş'r Elhir 'Nde Nazik Elmelayke Mîn Xîlal Kîtabiha Qezaya Elş'r Elm'asir*, Rîsale Macsitîr, Kulye el-Adab, Cam'e Qasidî Miryah – Werqe, 2015, r. 25.

pê diyar dike. Dubarekirin bi vê watayê xwedî delaletê derûnî ya buhadar e ku alîkariya rexnegirê edebî dike wê vekolînê li tekstê dike.

2- Yasaya hevsengiyê: Ev yasa yek ji yasayên veşartî ye, ewên kontrolê li ser derbirînê dikin. Di her derbirînekê de cureyekî hevsengiyê hîr û veşartî heye, ku pêdivî ye helbestvan di gişt haletan de biparêze. Yasaya hevsengiyê bi vê yekê beşdariyê di afirandina rîtma navxweyî dike, ewa ligel derûna xwendvanî û wergirî digunce.

Karê sereke yê dubarekirinê radeyê mezî ji pêkvegirêdan û guncanê di navbera regezên dirustker ên teksta helbestê de ava dike. Ji ber ku ew parçeyek e û jê venabe û di şîyan de nîne bê ladan, çunkî ew bi xwe dike armanc. Ji ber vê çendê dubarekirin bûye girîngtirîn berjengên dirustkirina şêwaza helbestê.⁽¹⁴¹⁾ Dubarekirin di nav teksta edebî de bi giştî û ya helbestê bi taybetî tişkekî prişingdar dixê di nav helbestê de. Gelek layenên veşartî yên wê têkstê bo xwendevanî eşkere dike. Ku wate dubarekirin tê hejmartin ji dîyardeyên ronak bo ronahîkirina tariyatiya teksta helbestê. Her wisa ev dîyarde kûratiya dîtina dahênerî eşkere û xuya dike, bo me amajekirinê pêşkêş dike ji rexê pêwendiya dahênerî bi dubarekirinê ve. Çunkî dubarekirin şêwazeke girîng e ku helbestvan piştbestinê li ser dikin, ji pêxemet wê çendê da ku dîtina xwe dîyar bikin. Ji ber hindê pêdivî ye em li ser estetîk û ramanên wê rawestin, ango dubarekirin berjengê şêwazgeriya berz e, di nav karê helbestvanî de.⁽¹⁴²⁾ Ango dubarekirin weke şêwazên dî yên derbirînê şîyanên dahênanê bi xwe ve digire. “Eger helbesta zîndî gelek şêwazên û teknîkên huneryên cwanên xwe hebin, evca bê dû dlî dîbarekrin beşeke ji ewî şêwazî, û erkekê cwan û aşkra jî heye.”⁽¹⁴³⁾ Cun Kuhinî girîngiyê mezî daye dîyardeya dubarekirinê di nav teksta helbestê de. Dubarekirin bi egereke herî girîng û pêdivî didît di nav pêkhatiya avahiyê gişt helbestê de. Dîyardeya dubarekirinê bi şêweyekî hîr û babetiyane şîrove kiriye.⁽¹⁴⁴⁾ Dîyardeya dubarekirinê di nav helbestê de wizeyê bêşnor heye. Ev wizeya wê ji wê çendê derdikeve; dema dubarekirin dibe senterê xirvekirina watayên cuda cuda, ango

¹⁴¹ Mihemed Xalid 'wad elhyse, *El-Bîna Elfenî Fî Ş'ri 'Mer Ebu Rîşe*, Rîsale Macsitîr, Kulye el-Adab, Cam'e el-Şerîq elewsed, 2011 ,r. 76.

¹⁴² Mihimed 'lwan Salman, h.b. ,r. 200.

¹⁴³ Mihmud Zamdar, h.b. ,r .55.

¹⁴⁴ 'Bdulqadir 'lî Zeruqî, *Esalîb Eltîkrar fî Dîwan (Serhan Yeşrib Elqehwe fî Elkaftirya)ILî Mehmd Derwêş (Miqarne îslubye*, Rîsale Macsitîr, Kulye el-Adab, CAM'E alhac xisir, 2012, r. 12.

dubarekirin dişê bigihîje pileyeke resenatiyê, her wisa dubarekirin dişê bibe payeke berz û helwyistekê hişyar jê bê wergirtin, hişyarî jî pêk tê.⁽¹⁴⁵⁾

1- Divê peyvên dubarekirî pêwendiyêke bihêz bi wateya giştî ya teksta helbestê ve hebe.

2- Divê pêgiriye bi hemî wan regezan ewên helbest bi giştî ji aliyê yasayên çêjdarî û estetîkî ve bike.

3- Divê dubarekirina wan regezan ewên di nav helbestê de hatin, yên havî nebin bo wergirî û bo guhî jî giran nebe.

Dubarekirin şêwazeke zor guncaw e bo derbirînên kîr ên helbestvanî û heluyist û rastgoyîya wî. Her wisa rêyeke bê gîrobûn e ji bo gihandina peyama helbestvanî û dişê watayê dîyar bike ji bo pileyeke resentiya bilind. Bi wî mercî helbestvan zalbûneke tamam li ser hebe “dubarekirin cextkirin e li ser watayan û rijdbûn e li ser tezekirina dîtineke dîyarkirî. Dubarekirin dişê rehendeke sitrankî jî bide teksta helbestê, ji ber ku dubarekirin rîtmê di helbestê de diafirîne. Zêdebarî wê çendê ku dubarekirin dişê watayên sifkatyê jî bide, ewên rexne li hindêk barûdoxan digirin, yan kesan, yan helwîstin, yan rûdanan, yan sîyasetê, yan reftaran.”⁽¹⁴⁶⁾ Ev boçûn rastiya gewherê dubarekirinê dide dîyarkirin, çunkî dubarekirin dişê wan hemî bûyer û rûdanên mêjûyî û şikandina yan biçûkirina wî beramber bike alavekî derbirînê di nav helbestê de. Helbest bi rêya dubarekirinê watayên hemecor digihîne, evca ew wata rastexwe bin yan jî veşartî bin. “Delaleta dubarekirinê mebest jê têgihandin û ronkirin e di cara yekê de; ladana delaletê ye berev watayeke dîtir ve li dîv pêdiviyên rêrewê di cara duyan de, yan jî mebest jê her du kiryar in di heman demê de. Lewre dubarekirin bi hemî cureyên xwe ve, cureyekî taybet ê rîtmê dirust dike, ku frêzê pêdiviya pê heyî ji bo mebestên hunerî û derûnî.”⁽¹⁴⁷⁾ Helbestvan dema helbesta xwe diafirîne, piştbestneke zor dike ser teknîka dubarekirinê. Evca helbestvan tenê wê piştbestina xwe bixe li ser yek keresteyên zimanî yan komeke keresteyan, ev çend girêdayî ye bi serbora wê dahênanê ve. “Dûbarekrin bi bçuktirîn pêkhat wate deng dest pê diket bo mezintrîn keriste ku ew jî risteye, helbestvan evan bnemayan bi şarezay ya xwe bo xizmeta rîtma navxoyî bi kar di înit, lewra di bihîstna

¹⁴⁵ Nazik Elmelayke, *Qezaya Elş'ri Elm'asêr, Eltib'e Elsanye*, mitb'e dar eltisamin, bexdad, 1965, r. 231.

¹⁴⁶ 'Bdulqadir 'lî Zeruqî, h.b. r. 35.

¹⁴⁷ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 233.

ewê helbestê da dil û derûnê mrovî hest bi xweşîyeka bê snûr di ket.”⁽¹⁴⁸⁾ Her dema helbestvanî lada ji teknîkên dubarekirinê û li dîv mîzaca xwe keresteyên zimanî dubare kirin, puşayek û valahîyeka mezin dirust dike di nav helbesta xwe de, ango ew keresteyên hatine dubarekirin divê guncandinek di navbera wan de hebe. Ku wate mercê dirust bo teknîka dubarekirinê ew e (Helbestvan peyvekê yan destwajekê yan risteyekê bînît û bo çend carekan dúbare bi ket bi merema çend armancên taybet, bi ewî mercî hemî ew dúbarekrin watayên ewan hebin, û li demê dúbarekirina ewan da wataya wan têk neçît).⁽¹⁴⁹⁾ Dubarekirin di nav binyata teksta helbestê de çendîn cure şêwaz hene. Belê bi şêweyekî giştî di şîyan de ye van cureyan dabeşî du beşan bikin, ew jî bi vî şêweyê li xwarê:⁽¹⁵⁰⁾

1- Dubarekirina sade: Ev cureyê dubarekirinê hevbend e bi dubarekirina peyvê, bê ku raçaviya dewrûberî bê kirin tê de hatiye bikaranîn.

2- Dubarekirina lêkdayî: Ev cureyê dubarekirinê hevbend e bi dubarekirina risteyan û girê di nav helbestê de, bê berçavwergirtina derûberê kontekstî.

Teknîka dubarekirinê bi şêweyekî bê sînor di nav helbestê de tê bikaranîn. Ev jî tiştêkî siruştî ye çunkî siruştî teksta helbestê dixwaze wê çendê lewre (ywrî lutuman)î cext li ser wê çendê dike ku (binyatê helbestê bi xwe jî xwedî siruştêke dubarekirinê).⁽¹⁵¹⁾ Ango teknîka dubarekirinê proseke Gring û cêgîr e di nav teksta helbestê de, dubarekirin di helbestê de pêdiviyeye sereke ye û jê nayê dabirîn; belê di janrên pexşanî de dubarekirin bernas nîne. Dubarekirin di helbestê de binemayeke bineret e, her wisa dubarekirin tiştî nagehîne, belku derbirînê jê dike û hêza derbirînê zêde dike. Ji ber wê çendê dubarekirin zimanê wijdanê ye, Roman Jakopsonî pêwendiya dubarekirinê bi helbestê ve daye dîyarkirin. Bi dîtina wî dubarekirin sîmayek e ji sîmayên girîng ên helbestê û dubarekirin pêkhatî ye ji dîvhevhatinê, ku dibin binema bo teksta helbestê. Dubarekirin peyama helbestê guncaw dike, her wisa peyamê dike tiştêkî berdewam. Ev hemî taybetmendiyên navxweyî û kara ne bo helbestê.⁽¹⁵²⁾ Helbestvan jî da ku helbesta wî serkeftî be ji aliyê gişt regezan ve,

¹⁴⁸ Safye mhemed Ehmed, *Şêwazî Şî're Kurdîyekanî Pîrbal Mehmûd*, r. 113-114.

¹⁴⁹ 'Ezîz Gerdî, *Rewanbêjî Le Edebî Kurdîda*, bergî duwem , Cwankarî, weş.wezaretî rageyandin, çapxaney Şarewanî, Hewlêr, 1975, r. 47.

¹⁵⁰ 'Bdalqadir 'lî Zeruqî, *Cemalyat Eltîkrar Ê Dînamye Elm'na fî Elxîtab Elş'ri Nemazic Mîn Ş'r Mihimed Bilqasm Xemar*, miclele eleser, h. (25), 2016, r. 134.

¹⁵¹ Yurîrî Lutuman, h.b. r. 63.

¹⁵² 'Bdulqadir 'lî Zeruqî, h.b.r .39.

dubarekirinê dike pêşeya karê xwe, çunkî ew baş dizane dê çawa kontrolê li ser tekstê helbesta xwe bike, her wisa dê çawa berê rexnegir û vekolerên edebî bo helbesta xwe rakêşe, da ku şîyan û wîzeyaya teknîka dubarekirinê bo wan bê selmandin. “Dubarekirin di rastiye de cextkirin e li ser layenekî girîng di derbirînê de, ku helbestvan girîngiyê zêde pê didin, ji her layenekê dîtir. Çunkî ew ronahiyê dixê li ser xaleke hestiyar di destewajê de, radibe vedîtina çendiyaya girîngiya helbestî. Li vir dubarekirin xwedî delaletê derûnî ya bihadar e. Rexnegirên edebî sûd û mifa jê dibînin dema ku vekolîna karîgeriya derûnî li dev helbestvanî dikin. Her wisa dubarekirin klîlekê dixê destê me da ku bi rêya wê em bişên hizra zaldar li ser helbestvanî dîyar bikin. Bi vê çendê ew dibê yek ji ronahiyên nehestî ew a ku helbest li ser naxê helbestvanî disepîne. Ev wê çendê eşkere dike, da ku xwendevan pê agahdar be.”⁽¹⁵³⁾ Ke wate mebest ji prosa dubarekirinê di nav helbestê de afirandina tekstekê ye ku bi hemî pîveran bibe teksteke edebî ya xwedî delaletê cuda cuda, biyavekê fire rehend ava dike, ku ji hemî layan ve gişgîr e û zalbûna xwe bê qed û bend di nav helbestê de diçespîne.

Yuri Lotmanî girîngiyê mezîn daye dabêşa dubarekirinê di nav teksta edebî de, gelek bi berfirehî behsa pêgeha dubarekirinê kiriye, biyavekî baş ji vekolînên xwe yê rexneyî terxan kiriye bo dubarekirinê. Ji wan bîr û boçûn û binemayên Yuri Lotmanî di pirtûka xwe de ewa bi navê *Pêkhata Teksta Hunerî* derbarê dubarekirinê darjîtînin, evên li xwarê ne:⁽¹⁵⁴⁾

1- Her tekstek tê hejmartin pêkhateyê dirustikrî bo hejmareke dîyarkirî ji regezan, ji ber hindê dubarekirin babeteke di şîyan de nîne em xwe jê dîr bixin.

2- Dema em tekstê bi teksteke hunerî didanîn, wê demê hemî regezên avakerên wê bi rêya rêxistna navxwe ya wê dibin amajeker. Divê em girîmaneya watayê tê de li ser wê çendê bikin ku dubarekirin nabe tiştekî pêçewane bo pêkhata tekstî. Evca polînkirina hemî cureyên dubarekirinê û rêxistna wan di nav tekstê de dibê babeteke pêdivî bo têgehiştina taybetmendiyan sereke yê ku pêkhateya wê tekstê tîne pêş yan wê cuda dike ji tekstên dîtir.

¹⁵³ Feysel Hisan Elhulî, *El-Tîkrar Fî Eldîrasat Elnaqdye Beyne Elesale u Elm'asir*, Rîsale Macisitîr, kulye el-Adab, Cam'e Mote, 2011, r. 70.

¹⁵⁴ 'Bdulqadir 'lî Zeruqî, h.b. r. 22.

Dubarekirin roleke sereke digire di nav binyata teksta helbestê de. “Pranî ya ewan bnemayên bejdaryê di drustibûna rîtma navxoyî û rîtma derekî da di ken bi şêweyekê giştî piştbestinê di kene li ser teknîka dûbarekrinê.”⁽¹⁵⁵⁾ Ku wate dubarekirin di nav helbestê de faktereke zal e bo afirandina rîtmê bi hemî cureyên wê ve. Nexasim rîtma navxweyî ku hatiye tamdan bi teknîkên dubarekirinê. “Dubarekirin ji fakterên girîng e ji bo peydakirina rîtma navxweyî û bihêzkirina wê, zêdebarî wê çendê ku beşdar e ji bo gihîştin berev delaleta rastiya tekstî. Lewre li ser wergirî ferz e ew bi hîrî li dubarekirinê binere û kartêkirina wê ya delalî li ber çav wergire.”⁽¹⁵⁶⁾ Her wisa rîtma navxweyî bi rêya dubarekirinê mewdayê karê xwe berfirehtir dike û asoyên dîr dibire. Gelek ramanên hemecor di nav teksta helbestê de digihîne, nexasim di nav tekstê helbesta nû de. “Dûbarekrin weku bunyat di têksitên nuyda rîtma navxoya têksitî mikom di ket û pêgehekê dengî hest bi guncandinê di ket, û gelek caran jî byavê rîtmê derbazî delaletên cuda cuda di bît, bi taybetî di ewan têkistan da ku dûbarekrin bejdaryê têda di ket, û eve hemî di zivîrî bo şyan û serbura helbestvanî ku ya guncay bît li gel sroştê ezmûna helbestê, bi evî şêwey di şên bêjîn: bunyatê dûbarekrinê di têksitê nuyda bi bîte sistemek di nav gyanê têksitî da, dvêt ewê çendê jî bi zanîn ku hebûna ewî sistemî li ser ezmûna helbestê hat bît û li dîv formekê guncay bi gerît bo amadekirina bunyantê dûbarekrinê, herwesan mezintrîn karîgeryê drust bi ket daku snûrê ziman û rêzman û peyvê derbaz bi ket û bi bîte alavekê rîtmî û delalî.”⁽¹⁵⁷⁾ Helbestvan di helbesta nû de piştbestineke yekcar mezin dike ser dubarekirinê, da ku çêja wê helbestê yekser serinca xwendevanî bo xwe rakêşe, karîgeriya wê ji her layenekî dîtir derûn û wijdana wergirî bihejîne. “Dubarekirin bki ji dîyardeyên helbesta nû ye, çunkî dubarekirin xweşiyêke rîtmî ya taybet dide helbestê.”⁽¹⁵⁸⁾ Di nav helbestê de dubarekirin çendîn pêwendiyên bihêz di navbera hemû elementên bûne eger û hokarên dirustibûna helbestê de peyda dike, ango bi rêya dubarekirinê regez û pêkhatyên helbestê pêwendiyêke rasteqîne û yekser di navbera wan de peyda dibe. Di van xalên li xwarê de ev pêwendî tê selmandin.⁽¹⁵⁹⁾

1- Dûbarekrin bo bi hêzkirina rîtma helbestê ye.

¹⁵⁵ Safye Mihemed Ehmed, *Şêwazî Şî're Kurdîyekanî Pîrbal Mehmûd*, r. 113.

¹⁵⁶ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 131.

¹⁵⁷ Bdalqadir Hme Emîn Mihemed, h.b. r. 205.

¹⁵⁸ Mes'ud Cemîl Reşîd, *Qonaxên Kêşnasîya Hozana Kurdî*, r. 155.

¹⁵⁹ Ezîz Gerdî, *Serwa : Lêkulîneweyekî Şîkarî Berawirde Le Şî'rî Kurdî da*, weş. belawkirdnewey dezgay Aras, çapxaney wezaretî Roşenbîrî, Hewlêr, 1999, r. 32.

2- Dûbarekrin bo bi hêzkirna raman û wênên di nav helbestê ye.

3- Dûbarekrin bo şruvgekirna watayên di nav helbestê da ye.

Li ser helbestvanî pêdivî ye ew bi şêweyekî hunerî serederiyê ligel teknîka dubarekirinê bike, yê agehdar be li ser wê yekê ku dubarekirina her regezêkê dê çi buha û karîgeriyê li dev wergirî peyda bike. Ku wate her dubarekirineke ne guncaw be, dê gelek valahiyên bêraman di nav wê tekstê de dirust bike û rîtma navxwe ya wê tekstê jî nabe faktereke çalak bo bihêzkirina peyama gotara wê tekstê. Lewre ferz e helbestvan dubarekirinê bixe di xizmeta gişt binyata teksta helbestê de, da ku ew tekst gelek raman û delaletên hemecor di nav xwe de hilbigire. Ew tekst bibe dergehêk bo cîhana helbestvanî û wergirî, çunkî helbestvan dê bi rêya wê tekstê hem derûna xwe hem wijdana xwe aram bike û wergir jî dema prosa xwendinê dê aşina û haydarî estetîka wê tekstê be. “Dema dubarekirin bi rengekî dirust û weke pêdivî di cî û dema xwe de bê bikaranîn û bibe parçeyeke pêkhateyî ne ya raportî, dê bişê karê xwe bi rengekî serkeftî encam bide, ku yan dê rîtmê bi hêz bike, yan dê guncana hunerî belav bike, yan dê parçeyên binyata helbestê bigehîne yek yan dê navbirên parçeyên teksta helbestê pêk bîne, yan dê navbirên hemî berhema helbestê pêk bîne. Ev hemî jî karî ji bo binehcihkirina rîtma navxwe ya helbestê dikin, da ku bibe lengerekî dengî, tê de guh hest bi guncandin, rehmandin û pesendkirinê bike.”⁽¹⁶⁰⁾ Eger helbestvanî serboreke domdirêj li gel helbestê nebe û di nav tekstê helbesta xwe de teknîka dubarekirinê bi şêweyekî ne saxlem bi kar bîne, ew dubarekirin bi hîç şêweyekî xizmeta layenê hunerî nake. Berovajî dê bibe egera dûrxistina wergirî ji helbesta xwe, ji layenekî dî ve ew dubarekirin dê wê çendê biselmîne ku helbestvan ne xwedî ferhengeke dewlemend e ji layenê peyvan ve. Ku wate eger dubarekirin di nav teksta helbestê de bi çu watayên kara û ektîf ranebe, ew dubarekirin bi hîç rengekî neşê beşdar be di avakirina heykelê binyata helbestê de. Lewre ferz e helbestvanî ferhengeke pir dewlemend hebe, da ku bi rêya wê dewlemendiyê helbestên wî bibin cîhaneke vekirî bo xwendinên ciyawaz ji bo karê rexnegirên edebî. Vekolîn li delaletên dubarekirinê li cem rexnegirên nû di du sentan de tînin û xwendin; ew jî ev her du delaletên li xwarê ne: ⁽¹⁶¹⁾

¹⁶⁰ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê di Ş'ra Nûya Kurdî da*, r. 124.

¹⁶¹ Feysel Hisan Elhulî, h.b. r. 70.

1- Di vekolîna delaleta dubarekirinê de tê xwendin bi wê saloxdanê ku delalet amajeyê bi wataya ferhengî dide.

2- Di vekolîna delaleta dubarekirinê de tê xwendin bi wê saloxdanê ku delalet di nav binyata dubarekirinê de ye, ew jî ji binyatê zimanî bi dest ve tê.

Maneveya berhemên helbestvanî di nav mêjûya edebiyatê de, ya hevbend e bi wê berhema ewê ew diafirîne, bi şêweyekî hunerî û dahênerane û berovajî ew helbestvan neşê di nav karwanê edebiyatê de bigihîne pileyeke berz û bilind ango hokarê vê maneveya wî hemî bi şîyanên wî ve girêdayî ne ka çawa wî layenê teknîka dubarekirinê di nav helbestên xwe de bi kar aniyê û ev teknîk giş xistiye di xizmeta dewlemenkirina helbestên xwe de. Evca li ser wî pêdivî ye ew gelek hişyar be dema dubarekirinê dike alava bikaranîna avakirina helbesta xwe. “Teknîka dubarekirinê di nav teksta helbestê de hindêk caran başiyên xwe hene û hindêk caran jî xerabiyên xwe hene. Serkeftina helbestvanî yan neserkeftina wî di prosa dubarekirinê de dimîne li ser çendîya kîratiya serbora wî ya helbestî. Her wisa çendîya şîyanên wî çespendina pêkhatiyên amajeyan dide mebestekê û bi destveînana wê bi rêya dubarekirinê. Li vir dîyar dibe ku dubarekirin wizeyeke du layenî ye, çêdibe delaletên kîr bide teksta helbestê, weku hêza karîgeriyê û amajekirinê. Çêdibe jî helbestê bixe asteke nizim û bêbuha. Evca dubarekirin divê pişbestinê bi rehendê peyva dubarekirî bike da ku dubarekirin bi tenê nebe heşo.”⁽¹⁶²⁾ Ev boçûn pesendkirina teknîka dubarekirinê di mewadayeke guncaw de dupat dike. Berovajî vê prosê hişyariyê dide helbestvanan, ku dubarekirin ne tiştekî bi sanahî ye di nav helbestê de, belku şîyanên bêşînor jê re pêdivî ne. Mebesta dubarekirinê di nav helbesta kevin û helbesta nû de bo gihandina peyamekê ye ku arastekirî be bo xwendevanî. Her wisa cextkirin e li ser layenên girîng û hestîyîrîyên helbestvanî. “Eger dubarekirin di nav helbesta kevin de mebest jê bi cihanîna cextkirina beşî be brîka peyvan yan ristên dubarekirî, ev dubarekirin berev rîdana rîtmeke gotarî diçe ku ya arastekrî be bo ji derve Bi evê çendê çî goman tê de nîne ev çend ligel şêweyê bi rê ve diçe, belê dubarekirin di helbesta nû de veguhaztin e bo taybetumendiyeke bineretî di binyata teksta helbestê de bi wî wesfî ku şêwazeke helbestî ye, her wisa ji girîngitîrîn şêwazên derbirîna helbestê ye. Ev yek ne bi tenê girêdayî bi ruxsarê ve, belku ew rîtma bi rêya dubarekirinê dirust bûyî, bizavê dike ku

¹⁶² 'Bdulqadir 'lî Zeruqî, h.b. r. 35.

biçe di nav hest û hilçûnan de, her wisa watayên veşartî eşkere dike.”⁽¹⁶³⁾ Eger mebesta dubarekirinê li cem rexnegirên kevin rehendeke karîger dîyar dike, belê li cem rexnegirên nû bizava dîyarkirina ektîfiya avakirinê girêdayî ye bi pêkhateya teksta edebî ve, bi wê çendê ku dubarekirin bi hev re girêdanê di nav pêkhateyên avaker ên tekstî de cîbicî dike, her wiha guncandinê bo derûna wergirî peyda dike.⁽¹⁶⁴⁾ Bi şêweyekî giştî di nav helbesta kevin û nû de helbestvan bi çendîn şêweyan teknîka dubarekirinê bi kar tînin, ji pêxemet dewlemendkirina pêkhateya rîtma navxweyî ya teksta helbestê ji layenekî ve û ji layenekî dî ve bo derxistina şarazayî û bilîmetiya xwe di vehandina helbestê de helbestvan van cure teknîkan bi kar tînin. Hindek ji wan teknîkan jî evên li xwarê ne:⁽¹⁶⁵⁾

1- Hindek caran peyvekê li dest pêkî yan li nîvekê yan li dumahîkê dúbare di bît.

2- Hindek caran jî li duyv çî gutnek yan amrazek dúbare di bît.

3-Hindek caran jî her êkser destewajeyka helbestê bi tmamî dúbare di bît.

4- Hindek caran jî peyteka helbestê dúbare di bît.

5- Hindek caran jî beşekê peyvê dúbare di bît.

6- Hindek caran jî peyvek parçe parçe dibît û dúbare di ket.

7- Hindek caran jî kupleya helbestê bi tmamî dúbare di bît.

Çawaniya bikaranîna van teknîkan jî di nav helbestê de, ango keresteyên wan ji helbestvanekî bo yekî dî tê guherîn. Ku wate çêdibe helbestvanek di helbesta xwe de pirtir girîngî bi bikaranîna dubarekirina peyvan bide ji keresteyên dîtir, yan jî berovajî, dubarekirin pena bo nayê birin bi tenê bo mebest û armanca gihandinê nebe. Evca eger dubarekirin ne ya mebestdar be yan armanca helbestvanî bi tenê jê dubarekirina tiştan be, dê aloziyeke mezin di siruştaya proseya tekstî de peyda bibe. Ev ji layenekî û ji layenekî dî ve dê bo wergirî û guhdarî bêzariyê peyda bike, çunkî ew regezên ne di cihê xwe de dubare bûne pirtir ji carekê, di guhê wî de dê bê gotin. Ev

¹⁶³ Kerîme Busenndil, *Cemalyat Elixîtab Elş'ri 'Nide (Nuraldîn Derwêş)*, Rîsale Macsitîr, Kulye El-adab, Cam'e Misturî, 2011, r. 12.

¹⁶⁴ Mihimed Mistef Kelab, h.b. r. 70.

¹⁶⁵ Mihmud Zamdar, h.b. r. 57-58.

çend jî dê hejariya ferhengî û zimanê axaftingerî dupat bike. Eger ne divê helbestvanî şêwazeke guncaw û guhartî bi kar anîbûya, da ku di prosa dubarekirinê de serkeftî bûya. “Dubarekirin di teksta helbestê de nûkirinek e ji bo binemayê rêxistinê, li ser asta cihnişînê û cihî jî, di têgeha zimanî de tê dîyarkirin weku taybetmendiyeke pêkvehatinê.”⁽¹⁶⁶⁾ Dubarekirin teknîkeke herî dîyar û berçav e di nav gişt cureyên helbestê de; stûneke sereke ye bo afirandina rîtmî navxweyî. Teknîka dubarekirinê bo helbestvan mîna pencereyekê ye, hemî cihan tê re dibîne, van cihan jî bi şêweyekî ciwan bo xwendevanî wêne dike.

1.3. ERKÊ DUBAREKIRINÊ DI NAV HELBESTÊ DE

Di nav teksta helbestê de dubarekirin gelek erkan cîbicî dike, nexasim eger xwediyê wê tekstê, helbestvanekî xwedî şîyan û dahêner be, ku bişê karîgeriyeke bihêz hem ji layenê naverokê ve û hem ji layenê ruxsarê ve di nav tekstê xwe de berceste bike û karîgeriya hunerî li cem wergirî peyda bike, mewdayê dîtina wî helbestvanî dibe egera bihêzkirina erkê dubarekirinê di nav gişt pêkhatayên helbestê de; belê eger dubarekirin bi tenê tijekirina rûpelan be, yan ristina deng û peyv û ristan be, bê ku helbestvanî meremeke dîyarkirî pê hebe, ew dubarekirin neşê derbirinê ji erkên curbicur bike. “Nayê veşartin ku her dubarekirinek hindêk delaletên cuda cuda yên derûnî û hilçûnî di nav xwe de hildigire ku siruştî rêrewê helbestê disepîne, eger wisa nebe dê bibe dubarekirina komeke tiştên bêraman yan bê erk di avakirina helbestê de.”⁽¹⁶⁷⁾ Ji ber ku dubarekirin bi şêwazeke derbirîna helbestê tê nasîn, lewre di nav teksta helbestê de bi gelek erkan radibe, weku erkên cextkirinê û amajedariyê û avakirina wêneyan. Dema helbestvan keresteyekê dubare dike, ew bo xwendevanî çendîn erkan cîbicî dike; evca mebest jê bihêzkirina rîtmî navxweyî be, çî jî veguhestina haletên xwe yên derûnî be. “Ji ber rol û erkê berçav û dîyar ê dubarekirinê di avakirina rîtmî navxweyî de, weku stûnekê ye rîtmî navxweyî li ser tê avakirin, em dişên bibêjin ku dubarekirin klîla vekirin û eşkerebûna rîtmî navxwe ye.”⁽¹⁶⁸⁾ Dubarekirin ne karekî bi sanahî ye di nav helbestê de, belku ew gelek hestiyar e. Ew erkê ku pê radibe, divê bi hustayane helbestvan bi kar bîne; eger ne çî ciyawazî di navbera teksta wî û teksteke ne edebî de nîne. “Dubarekirin teknîkeke aloz e ji teknîkên hunerî, ji aliyê pêdan û karîgeriyê li ser helbestê, zêdebarî rola wê ya watayî

¹⁶⁶ Yurîrî Lutuman, h.b. r. 85.

¹⁶⁷ Yasrê Hesênî, *Binyatê Rîtmê di Ş'ra Nûya Kurdî* da, r. 123-124.

¹⁶⁸ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 232.

ku rexnegirên kevin digotinê eltewkîd.”⁽¹⁶⁹⁾ Helbestvanên nû gelek huşyar bûn di dariştin û avakirina keresteyên dubarekirinê de. Wan wisa serederî ligel teknîka dubarekirinê dikir ku ji bilî gihandina peyama teksta xwe, hizir di xwendevan û wergirê xwe de jî dikir. “Helbestvanên nû di helbesta nû de dubarekirinê ji ber her du palvederan derûnî û hunerî ve bi kar tînin, ya derûnî çunkî ew ya xwedî erkên çûte helbestvan û wergirî vedigire, ya hunerî çunkî ew bi peydakirina awazeyî û hêmbûna şêwazî radibe.”⁽¹⁷⁰⁾

Buhayên dubarekirinê di nav tekstê helbesta nû de, di du erkên girîng de ye, ew jî:⁽¹⁷¹⁾

1- Erkê estetîkî: Ev cureyê erkî di nav binyata ruxsar û rîtmê de ye, ewa ji encama prosa dubarekirinê bi dest ve tê ji bo pirkirina dewlemendkirina cihî ji pêxemet afirandina livîna rîtmê di nav teksta helbestê de.

2- Erkê pragmatîkî: Ev erk girêdayî niwandina rola rîtmê ye di vedîtina watayê de, her wisa şiyana wê li ser hizra mebestdar li cem helbestvanî bo guhdarî û wergirî.

Dubarekirinê di nav teksta helbestê de çend erk û delaletên hunerî û derûnî hene, ku amajê bi girîngîpêdana babetî didin. Ewa ku cihê girîngîpêdanê be, îcar erênî be yan neyinî be, xêr be yan şer be, ciwan be yan kirêt be, ev girîngîpêdan hestê wergirî zal dibe li ser dubarekirinê. Her wisa erkê dubarekirinê çendiya hejmuna helbestvanî û buha û şiyana wî wêne dike.⁽¹⁷²⁾ Pirtiriya caran babetên ku derbirinê ji layenê çakîyê dikin, helbestvan neşê wan bike jêdera nivîsîna helbesta xwe, belê mercê serkeftina helbestê vebirî ye di bikaranîna teknîka dubarekirinê de. Di şiyana de ye em bi şêweyekî giştî çendîn erkên girîng ên dubarekirinê di nav teksta helbestê de destnîşan bikin, bi vî rengê li xwarê:⁽¹⁷³⁾

1- Erkê amajeyî: Ev cure amajeyên watayê bi xwe ve digire, ku wataya mebestdar di peyva dubarekirî de dewlemend dike. Ev cure di naveroka xwe de, dubarekirineke li ser bineretê amaje û hêmayê ye. Dubarekirin di nav helbestê de bi

¹⁶⁹ 'bdulqadir 'lî Zeruqî, h.b. r. 12.

¹⁷⁰ N'metulla Hamd Nhêlî, *Şêwazgerî, Tyorî u Praktîk*, r. 234.

¹⁷¹ Feysel Hisan Elhulî, h.b. r. 66.

¹⁷² 'Bdalhimîd Cîde, h.b. r. 67.

¹⁷³ Feysel Hisan Elhulî, h.b. r. 78-93.

erkekî amajeyî yê berçav radibe û şêwe û wêneyên wê li dîv armanceke amajeyî zêde dibin, ewên helbest li ser tê avakirin.

2- Erkê derûnî: Rexnegirê edebî vî cureyî bi gelek navan bi nav dikin. Hindek ji wan rexnegiran dibêjin dubarekirina hestî û hindek jî dibêjin dubarekirina ne hestî, ji ber ku haletê hestî û nestî kevine, her wisa tê vekolînkirin li jêr navê egerên derûnî, lewre hindek rexnegir dibêjin dubarekirina derûnî, ku wate dubarekirinê rehendên derûnî hene.

3- Dubarekirina erkî: Ev cure tê hejmartin bineret di dîyardeya dubarekirinê de, çunkî helbestvan pêkulê dikin bi rêya hebûna vî erkî peyamekê bigihînin wergirî. Rexnegir bi berfirehî li ser vî cureyî rawestiyane. Helbestvan peyvekê yan girêyekê yan risteyekê dubare dike ji pêxemet erkekî ku divê dupatîyê lê bike, her wisa helbestvan vê dubarekirinê jî bo gelek mebest û erkan bi kar tînin, wekî cextkirin, hereşekirin, dîrxistin hwd. Ewan rexnegiran pesendiya dubarekirinê bi wê çendê ve mercdar kir ku divê bo mebestekê û mifayekê bigehîne.

4- Erkê rîtmî: Gelek ji rexnegirên rexneya nû vekolîna dubarekirinê kirin di xwendineke rîtmî de, ev jî hatiye danan ji bo awazdarkirina muzîkê bi rêya dubarekirina peyvê yan derbirînê. Ev şêwaz helbestvan pişbestinê pê dikin, dema peyv ji nişkê ve di derûna wî de peyda dibe, ew jî bi şêweyê dubarekirî diafirîne, da ku zengeke xweş di guhî de peyda bike. Hindek caran jî digihîje wê radeyê ku bi enqest peyvê sê caran di dêrekê de dubare dikin.

Dubarekirin bo her sê cemseran (helbestvan û tekst û wergir) çendîn erkên curbicur dirust dike. Helbestvan ji layenê derûnî ve hest bi xweşî û aramiyê dike dema dubarekirinê di nav teksta helbestê de diafirîne. Tekst jî ji layenê hunerî ve dibe teksteke xwedî regezên kara yê avaker, ji ber ku dubarekirin dê rabe bi erkê estetîkiya tekstî. Wergir jî dema wê tekstê dixwîne dê hest bi muzîk û rîtmeke xweş bikin. Keresteyên avakirina dubarekirinê di nav helbestê de ziman e. Lewre dubarekirin bi erkê zindîkirina van keresteyan radibe, çunkî helbestvan gelek caran di nav helbesta xwe de çendîn peyv û destewajan bi kar tîne û ev kereste nemayî ne di nav bîrdanka mirovî de. Ji ber wê çendê dubarekirin bi erkê vecemandina keresteyên zimanî radibe. Helbestvan wî zimanî di nav seqayeke edebî de bi kar tîne û dibe sîfeteke xwedî karîger û taybet. “Dubarekirin di helbestê de roleke karîger dibîne di

bercestekirina şî'riyeta zimanê helbestê de.”⁽¹⁷⁴⁾ Her wisa helbestvan penayê dibin ber teknîka dubarekirinê di nav teksta helbestê de ji ber van du egeran:⁽¹⁷⁵⁾

1- Çespandina şiyana gihandinê, evca karîna wê divê bi plan be, ev jî pêdivî bi şiyânên neasayî heye.

2- Ji bo gihandina wataya divê bigîhîne, ev jî bi tenê bi rêya dubarekirinê bi dest ve tê.

Renge baştirîn rêk bo dest nîşankirina cih û rolê dúbarekrin di zimanê edebî da piştbestin bi nêrînên û vekolînên formalîstên rosî bikeyn, formalîstên rosî bo êkemîn car di mêjûya vekolênên zimanî da bzavkrin li ser bunyatê cyawaz di navbera zimanê edebî yan ku şî'ryetê zimanê rojane, taybetmendiyên zimanê edebî bi den e dîyarkrin, ewan cawazî êxiste di navbera zimanê rojane û zimanê bercestekirinê, bi nêrîna ewan bercestekrin bunyatê drust bûna zimanê edebîye, ewan wesa bercestekrin pênase kir: mebest ewe ku mrov xwe ji yasayên zimanî dîyr bêxît û cawazîyekê di zimanî da dirust bi ket eve jî dû layenan bi xweve di grît⁽¹⁷⁶⁾

- 1- ladan: wate ladan ji yasayên fonolojî yan morfolojî yan sîntaksî yan sîmantîkî yên zimanî.
- 2- zêdekirna yasayan weku gringî dan bi layenê rîtmî û cwankarîya peyvî.

Her li ser bunyatê evê dabeşkirinê dúbarekrin beşek e ji bercestekirinê wate di bîte eger ku cawazî bi kevîte di navbera zimanê asay û zimanê edebî da, belê tiştê gring eveye, dúbarekirin pranya caran ladan nîne, anku dúbarekirin birêtî nîne ji têgdana yasayên zimanî, belku birêtî ye ji zêdekirna hindêk taybetmendîyan li ser yasa û taybetmendiyên zimanê rojane. Yakupsun êkemîn nvîsere ku behsê zêderkirna yasayan û berhemê wê wate hevsengî krîye, bi dîtna wî ku zêdekirna yasayan bi şêweyekî birêtî ye ji hevsengîye, ev hevsengî ye jî bi tnê bi rêka dúbarekirna axiftnê bi dest ve di hêt eve jî kêş û rîtma helbestê bi xwe ve digrît, anku bi derbirîneka dî dúbarekirin bunyatê dirust bûna tevaya ewan dîyardeyane ku di çine li jêr zêdekirna

¹⁷⁴ Befrîn Reşîd Hesên, *Şî'riyeta Zimanê Hozanê di Hozanên (Mihsin Quçanî)* da, Nama Masterê, Kulîja Perwerda Binyat, Zankoya Dihok, 2016, r. 82.

¹⁷⁵ 'Bdulqadir 'lî Zeruqî, h.b. r. 29.

¹⁷⁶ Koroj sefawî, *Ez Zibanişnasî Bê Edebyat Înşaratê*, Buhar, Tehran, 1373, r. 35-42.

yasayan û kêş û rîتما helbestê pêk di înin.⁽¹⁷⁷⁾ bunyatê dirust bûna kêşê dûbarekirne, bo nimûne kêşa 'erûzî jî ji encamê dûbarekirna birkeyên kurt û drêj drust di bît û serwa helbestê jî wek beşek ji rîتما derekîya helbestê her berhemê dûbarekirna kumeka fonîmane bi evî rengî dûbarekrin di zimanê helbestê birêtî nîne ji çend dîyardeyên dest nîşankirî, belku gelek caran di şên bêjîn dûbarekirin û rîتم hev watayên hevin û tevaya dîyardeyên rîتمî grêdayne bi rolê dûbarekrinê ve. Demê em behsê hebûn û rolê dûbarekirin di zimanê helbestê da di keyn pêdvîye prensîpê rêkxistinê bi hête berçav girtin çunkî ew dûbarekirna bercestekirna edebî berhem di înit, cawaze ji ewê dûbarekirna ku di axiftna rojane da heye, gelek corên dûbarekrinê di zimanê rojane da hene, belê evan dûbarekirna çî biha û nirxekê helbestî yan edebî nîne, pêdvîye di her dûbarekirneka helbestî yan edebî da rêjeyeka wekhevî û cawazyê hebît bi rengê wesa xwandevan hest bi core rêkxistnekê bi ket, eger di dûbarekrinê da rêjeya pêdivya wekhevî nebit ew dûbarekirne dê wekî dûbarekrinên axiftna rojane hêne li qelem dan.⁽¹⁷⁸⁾ hevsengî û rêkxistin ewan dûbarekirna bi xwe ve di grît yên serinca me radikêşn anku ew dûbarekrinên bi awayekê rêkxistî li ser rûberê helbestê di hêne dabeşkrin, belê dîyare core dûbarekirne ka di heye ku herdem berhemê hevsengî û rêkxistinê nîne belku berhemê wekhevî ye û rolekê karîger di bercestekirna zimanê helbestê da heye, ev dûbarekirne berhemê wekhevî ne bê ku rêkxistin yan hevsengîya dîyar û cêgîr bi ser ewan da zal bît.⁽¹⁷⁹⁾ wate em di şên ew dûbarekrinên ku li ser bunyatê hevsengî û rêkxistna bê sinîr drust di bin bi rîتما derekî û yên ku berhemê wekhevî ne û rêkxistin û hevsengîyeka dîyar krî bi ser ewan da zal nîne bi rîتما navxwyê ve grê bi deyn.

Her di evî bîyavîda gelek ji rewanbêj zanan û zanayên kevin behsa erkê dûbarekirinê kirîn bo nimûne Cahiz ji zanayên pêşîbû yên ku behsa giringî û başî û xirabîyên dûbarekirinê kirî û bi dîtina wî (dûbarekirin ne tişteke bê ramane eger mebesteka baş hebît anku ne ji bo gotareka sawîlke u şaş bît dûbarekirina keristên zimanî ne karekê valaye eger ji sînuuran derbaz nebit û di bîyavê xirabîya bi karînana dûbarekirinêda cextê li ser metirsîya ewê dûbarekirinê di ket eger hat ya li gel goncay nebit ew dîyalogekê li gel xizmetkara xwe diket piştî ew dîyalog bi dumahîk hatî ewî daxaz ji xizmetkara xwe kir axaftina ewî ya çawabû wê xizmetkarê bersiva wî da û

¹⁷⁷ koroj sefewî, h.b. r. 155-156.

¹⁷⁸ h.j. r.157-158.

¹⁷⁹ h.j.,r.161.

gotê axftina te geleka ciwan bû belê eger te ew dúbarekirinên zêde bi kar ne înan ewî berziv da û got ez ewan dúbarekirinan di kem da ku ew kesê tênegehiştî têbigehît ewê gotê heta ew kesê tênegehiştî têbigehît dê bêzarîyê bo kesê cara yekê têgehiştî peyda ket)⁽¹⁸⁰⁾ eve ewê çendê di selmînî ku her dúbarekirneka ne di cihê xwe da bît dê bite sedemê bêzarîyê li def wergirî Îbin Reşîqî ev zanaye dîyardeya dúbarekirin biş guhve ne havê tîye û bi dîtina wî dúbarekirin şêwazeke ji şêwazên ereban û çî hunerên axaftinê jê bê behir nînin li ser evî bunyatî Îbin Reşîqî dúbarekirin dabeşî sê coran kirîye ew şî bi vî awayê li xarê:⁽¹⁸¹⁾

- 1- Dúbarekirina peyvê bê dúbarekirina watayê ev core dúbarekirne berfirehtirîn dîyarda dúbarekirinê di zimanê erebîda.
- 2- Dúbarekirina watayê bê dúbarekirina peyvan ev core dúbarekirne rêja bi karînana ewê ji hemî corên dîtir kêmtir.
- 3- Dúbarekirina peyv û watayan ev core dúbarekirne ji kêmasîyên dúbarekirinê di hête hijmartin li dor evê xalê Îbin Reşîqî di bêjî ev teknîke şermizarîye.

Ji layê xwe ve Îbin Esîr giringî daye dîyarda dúbarekirinê wate ew jî li ser heman rêça Îbin Reşîqî çuye û bi dîtina Îbin Esîr dúbarekirin ji du beşan pêk dihêt ew jî evên li xarên e:⁽¹⁸²⁾

- 1- Dúbarekirin di peyv û watayêda.
- 2- Dúbarekirin di watayêda.

Bi dîtina wî evan her dû xalan başî û xirabîyên xwe hene. Eger em binêrîne boçûnên her dû zanayan Îbin Reşîqî Îbin Esîr dê bînin ku her dû kan bi tîne tekezî xistîye li ser giringîya dúbarekirina peyv û watayê û gîst keristên dîtir fîramoş û piş guhve havêtîne.

Erkê dúbarekirinê di nav helbestê de rêxistînek e bo darêtna keresteyên zimanî, ew kereste alaveke derbirînî ya rastexwe ye, yê derûna helbestvanî bo

¹⁸⁰ Cahiz, *Elbeyan We Eltubeyin*, (bergé1), dar elkutib elulmîye, 1998, Beyrot Lubnan, r. 79.

¹⁸¹ Îbin Reşîq Elqirwanî, *El-Umde*, (çapa2) tehqîq Ebdulhemîd hindawî mekteb el ezrîye, 2001, r. 92.

¹⁸² Îbin Esîr, *El-Mesal Elzayrf Fî Edeb*, el-katib we elşair, tehqîq Muhyedîn Ebdulhemîd, mekteb el-Ezrîye, 1999, r. 147.

wergirî. Ji layekî dî ve erkê dubarekirinê cextkirin e li ser girîngiya peyama helbestê,
ewa helbestvan araste dikin bo xwendevanî û wergirî.



2. BEŞA SÊYEM

TETBÎQA LI HELBESTAN



Em dê di vê beşê de bizavê bikin wan teknîk û rêyên dubarekirinê yên helbestvan Kamîran Bedirxanî* di dîwana *Dilê Kurên Min* de⁽¹⁸³⁾ bi kar anîne û wan şîrove bikin ji pêxemet wê çendê buha û girîngiya dubarekirinê di avakirina rîtma navxwe ya vê dîwanê de bê selmandin.

2.1. DUBAREKIRINA FONÎMAN

Fonîm weku biçûktirîn yekeya zimanî roleke girîng digire di dirustkirina rîtma navxwe ya helbestê de. Helbestvanî di nav vê dîwana xwe de, bi awayekî gelek berfireh fonîm bi kar anîne. Çunkî ev kereste bincîne ye bo dirustbûna hemû keresteyên dîtir ên zimanî, dubarekirina fonîman sanahîtirîn cureyê dubarekirinê ye. Fonîm di dêra helbestê de, awaz û muzîkeke aram û dilvekir berhem tîne. Ev reng çêdibe bi şêweyê xwe bi xwe bibbe, bêyî hestê helbestvan dirust bibe, yan jî ev çend ji layê helbestvanî ve bo merema cextkirinê bê bikaranîn.⁽¹⁸⁴⁾ Di nav helbestên vê dîwanê de bi şêweyekî serincrakêş fonîm dubare bûne. Vê yekê xizmeteke yekcar mezin gihandiyê rîtma navxweyî, helbestvanî piraniya teknîka dubarekirina fonîman di nav vê dîwanê de berceste kirine.

1- Dubarekirina tak fonîman:

* Diktur kamîran bedirxan navê wî yê dirust (kamîran emîn 'alî bedirxan)e, li sala (1895) hatiye ser dunyayê, (kamîran bedirxan) ji malbateke rewşenbîr û syasetmedar bû, ku bi navê malbata bedirxanyan dhêne bnavkirin, (bedirxan beg) bapîrê (kamîran bedirxan)iyê, dumahîk mîrê mîrîşîna (butan) bû, evê malbatê pêgehekê bihêz û karîger hebûye, di nav kurdanda, piştî ji navçûna mîrgeha (butan) endamên evê malbatê rolegê girîng û karîger hebûye di belavkirina zanist û rewşenbîryê di nav kurdanda, li ser destê evê binemalê yekemîn rojnama kurdî ewa bi navê (kurdistan) li sala (1898) tê belavkirin, kamîran bedirxan zana û rewşenbîrekê bi nav û dengê bû, jibî zimanê dayk çendîn zimanên dîtir bi başî dzaniyî wekî zimanên (turkî, 'erebî, farsî, ferensî, elmanî ...hitd) kamîran bedirxanî çendîn berhemên pir girîng û bi mfa hebûyne ji ewan berheman jî (dîwana dlê kurê min (helbest), elfabêya min, elfabêya kurdî, ...hitd), her wisa evî zanay dû rojname derêxistîne bnavê (roja nu, stêr), li salên (1943), li sala (1978) helbestvan û rewşenbîryê xem xorê gelê xo çûye ber dlovanya xudê mezin, bo pirtir zanyaryan derbarê wîstgehên jyannama (kamîran bedirxan î) binêr e:

- Pêzanê Alîxan, *Profîsorê Kurd Kamîran 'Alî Bedirxan*, govarî karwan, h. 13, 1983.

- Salmê Casmî, *MÎR KAMÎRAN BEDIRXAN JÛYÊKÊ DRÊJ Û XEBATEKA MEZN*, govare havîbun, govare lêkolînên kurdîye, h. 18, 2007.

- Cîhan 'abdulwehab Ehmed, *Kamîran Bedirxan Û Nwêkirdnewey Şî'rî Kurdî*, çapxana Xanî, Dihok, 2011.

¹⁸³ Kamîran Bedirxan, *Dîwan, Dilê Kurên Min*, Têlî Emîn, ji tîpên Latînî guhartîye û lê vekolîye, dezgaya Roşnîbîrî belawkirdnewey Kurdî, Bixda, 1991.

¹⁸⁴ Mixtar Selîm, *El-Tîkrar Ellefzî Fî Ş'r Elneqayz Cerîr Û Elfirzdeq, Nimuzece*, dîrase îslubeyê, Rîsale Macîstîr, Kulye Adab, Cam'e Qasidî Mirbah Werqle, 2010, r. 59.

A- Şêweyê asoyî: Ev cureyê dubarekirinê ji dubarebûna fonîmên tak bi awayekî asoyî pêk hatiye, ango xirvekirina fonîmên tak e. Ev teknîk erkekî girîng digêre di binyatên rîtma navxweyî de, bo nimûne:

(çû <u>keke</u> <u>kiçik</u>) (r.136)	fonîma (k) çar caran dubare bûye.
(<u>ava</u> <u>sar</u> <u>dixwaze</u>) (r.137)	fonîma (a) çar caran dubare bûye.
(ç <u>em</u> <u>xweş</u> <u>diherike</u>) (r.137)	fonîma (e) çar caran dubare bûye.
(<u>denişt</u> a <u>deşt</u> a <u>Mûşê</u>) (r.41)	fonîma (ş) sê caran dubare bûye
(<u>kulîlk</u> , <u>kitik</u> , <u>berx</u> , <u>bizin</u>) (r.142)	fonîma (k) çar caran dubare bûye.
(<u>sor</u> , <u>spî</u> , <u>kesk</u> , <u>ala me</u>) (r.142)	fonîma (s) sê caran dubare bûye.
(<u>kurmancî</u> <u>zimanê bav</u> û <u>kal</u> e) (r.142)	fonîma (a) çar caran dubare bûye.
(<u>sor</u> , <u>spî</u> , <u>kesk</u> û <u>dibiştan</u>) (r.144)	fonîma (s) çar caran dubare bûye.
(<u>rez</u> , <u>dehl</u> û <u>rêl</u> û <u>qelî</u> <u>sêl</u>) (r.145)	fonîma (l) çar caran dubare bûye.
(<u>dewlemend</u> <u>dibûn</u> <u>bûne</u> <u>jar</u>) (r.147)	fonîma (e) çar caran dubare bûye.
(<u>heke</u> <u>jî</u> <u>keyne</u> <u>bi pîne</u>) (r.148)	fonîma (e) pênc caran dubare bûye.
(<u>dergehê</u> <u>xwe</u> <u>vekirî</u>) (r.150)	fonîma (e) çar caran dubare bûye.
(<u>mekteb</u> <u>hêlîna</u> <u>me</u> <u>ye</u>) (r.150)	fonîma (e) çar caran dubare bûye.
(<u>hej</u> <u>welatê</u> <u>xwe</u> <u>bike</u>) (r.152)	fonîma (e) çar caran dubare bûye.
(<u>geş</u> <u>bûye</u> <u>tu geştir</u> <u>be</u>) (r.152)	fonîma (e) çar caran dubare bûye.

(bixebite bimeşe) (r.152)

fonîma (e) çar caran dubare bûye.

fonîma (b) sê caran dubare bûye.

(şah e mezin e bi nav û deng e) (r.153)
dubare bûye.

fonîma (e) pênc caran

(rewş kerme delalê kurdan) (r.153)

fonîma (e) çar caran dubare bûye.

(ew şûr û qelem bi hev re gêrand) (r.153)

fonîma (e) çar caran dubare bûye.

(ma jê re kerem bu genc kehnî) (r.153)
dubare bûye.

fonîma (e) pênc caran

(gelek xweş û sipehî ye) (r.154)
bûye.

fonîma (e) pênc caran dubare

(ne wek cemê min her reş e) (r.154)

fonîma (e) şeş caran dubare bûye.

(welatê me bêkes e) (r.155)

fonîma (e) çar caran dubare bûye.

Bi dubarebûna van hemû fonîman bi şeweyê asoyî, ji bilî bihêzkirina rîtma navxweyî, her wisa van fonîman çendîn wate û delaletên cuda cuda di nav xwe de hilgirtine. Eger em bi şeweyekî hûrbîn li dubarekirina van fonîman binêrin dê bo me êşkere be ku helbestvanî senga teknîka dubarekirinê xistiye li ser fonîma (e). Ku wate vê fonîmê taybetmendiyeke girîng û gewherî li cem helbestvanî heye, lewre bûye îlhama wî ya sereke di afirandina rîtma navxweyî de, her wisa bûye alaveke kara bo derbirînên helbestvanî. Piraniya wan peyvên fonîma (e) di nav de heye, ew peyv hilgirên komeke sîfetên çak û dilxoşker in bo hemû mirovayetiye, bi wê çendê bo me wisa diyar dibe ku helbestvanî helwesteke çak û dilsozane heye bo hemû pirsan.

B- Dubarekirina tak fonîman bi şeweyê asoyî û stûnî: Bi rengê giştî helbestvanî bi awayekî serkeftî û hunerî teknîka dubarekirina fonîman bi şeweyê asoyî û stûnî di nav vê dîwana xwe de bi kar anîne. Bi endazeyeke dahênerane ev sîstem encam daye, belê tenê em dê wê helbestê hilibijêrin ya ku pirtir ev teknîk di

nav de berceste bûye. Ew helbest jî nûnertiya piraniya helbestên vê dîwanê dike ku helbesta “Siltan Selaheddîn” e:

(Şah e, mezin e bi nav deng e

Dîroka dinê wî, bi reng e

Siltan, mezin e û kurd e ew mîr

Navê wî nemir û qet nebe pîr

Şah e mezin e çira li dinya

Zanîn û huner bi şûr û de'wa

Rewş û kerem e, delalê kurdan

Rewşa du dinê, delalê du waran

Dewsa keremê ji nû ve şakir

Ava hunerê vejand û rakir

Bê dad nebû û dil neêşand

Ew şûr û qelem bi hev re gêrand

Rawende ye ew ji êla rawend

'Edla wî nehşit cefa û merbend

Misir û 'ereb û cîhana efrenc

Texsîr dikir bi 'edil û bê renc

Destê wî tejjî 'edil û ruhî

Ma jê re kerem bû genc û kehî

Dermanê elem birîn û jarî

Destê wî tejî bi alîkarî

Destê wî tejî hedîs û quran

Zanîn û huner û ruhna firqan

Kulma wî tejî ji jîn û derman

Tirba wî ye rih û canê kurdan) (r.53)

Di nav vê helbestê de hersê fonîmên (e, n, a) bi rêjeyeke mezin beşdarî kirine di dirustkirina rîtmî navxweyî de. Vê yekê ciwanî û estetîkiyê bêtê daye vê helbestê. Çêj û lezeteke xos di xwendina wê de heye, çunkî ev her sê fonîm bi harmoniyê awazdar bûne havênê binyatnana prosa teknîka dubarekirinê. Fonîma (e) pirtir ji heftê carî hatiye dubarekirin, fonîmên (n,a) pirtir ji çil carî hatine dubarekirin. Ku wate ev çend jî pirtir dê bibe paldereke bihêz bo dewlemendkirina rîtmî navxweyî. Her wisa ev rêjeya mezin a van fonîman di nav vê helbestê de, mîna belgeyê ye ku helbestvanî viyayê bi vî şeweyî cextiyê li ser nav û dengiya Siltan Selaheddînî bike. Ji layekî dî ve fonîma (e) saloxdana pesn û sîfetên Siltan Selaheddînî dike, ku fonîma (e) pirtir di nav wan peyvên de berceste bûye ewên bi kesayetiya Siltan Selaheddînî girêdayî ne, mîna “şah e, mezin e, nav û deng e, kurd e, tejî 'edil, derman, kerem hwd.” Bi rengê giştî em dişên bibêjin ku ev berfirehbûna fonîman helbestvanî bi herwe bi kar neaniye, belku wî çendîn mebest û armanç pê hebûne, lewre pena biriye ber vê şewazê, ew jî pêxemet girîngîpêdana rîtmî navxweyî û kurdîbûn û mezinatiya Siltan Selaheddînî ye.

2- Dubarebûna cot fonîman:

Bo teknîka dubarekirina cot fonîman me sîd û mifa ji rêkxistin û sîstema nivîser Mihemed Bekir Mihemedî wergirtiye.⁽¹⁸⁵⁾ Kesê navborî di teza xwe ya

¹⁸⁵ Mihemed bekir Mihemed, *Pexşane Şîrî Kurdî*, Çapxaney Wezaretî Perwerde, weş. blawkirdnewey Aras, Hewlêr, 2004, r. 83-85.

doktorayê de ev şewaz praktîze kiriye. Me jî ev weku baştirîn û bihêztirîn jêder dîtiye bo vekolîna xwe.

A- Dubarebûna cot fonîmên hevdeng ên yekgirtî: Ev şewe dubarekirina fonîman ew e ku du fonîmên hevdeng çî wekî hev yan berovajî dubare bibin. Ev yek muzîk û rîtmeke xweş didin helbestê.

1- Dubarebûna cot fonîmên hevdeng ên wekî hev:

(kekê min ê dilovan

Çîrokekê bibêje) (r.140)

(k+e / k+e)

(k+ê / k+ê)

Di nav her du peyvên (kekê, çîrokekê) de, teknîka dubarebûna cot fonîmên hevdeng ên wekî hev heye. Helbestvanî bi endazeyeke hunerî ev fonîm di nav de berceste kirine û rîtma navxweyî bi dubarebûna wan fonîman hatiye afirandin.

(êş, arian û jan) (r.137)

(a+n / a+n)

Bi dubarebûna her du fonîmên (a,n) helbestvanî arasteya rîtma navxweyî berev derdeserî û nexweşiyên ve biriye.

(li nav kefên ava sar) (r.141)

(a+v / a+v)

Her du fonîmên (a,v) şiyane rîtma navxweyî bi wizeyeke bihêz biafirînin.

(bêdengiya bi reng û zad) (r.144)

(e+n / e+n)

(n+g / n+g)

Bi dubarebûna her çar fonîmên (e, n), (n, g) di nav her du peyvên (deng û reng) de, teknîka dubarekirina cot fonîmên hevdeng bi baştirîn şêwe hatiye dirustikirin û dewlemendiyeke mezin daye rîtma navxweyî.

(pal û newal çi xweşk in) (r.144)

(a+l / a+l)

Bi dubarebûna her du fonîmên (a, l), helbestvanî bi şêweyekî gelek karîger û serincrakêş rîtma navxweyî afirandiye.

(bes govend û dil xweşî

Tê de her kes kamîran) (r.146)

(e+s/ e+s)

Dubarebûna fonîmên (e, s), awaz û selîqeyeke xweş daye vê helbestê. Helbest tevda avakirî ye bi dîlaneke pir bikêf û şadî. Dema mirov vê dêra helbestê dixwîne her yekser mirov digel xwe de dibe cîhaneke fentazî û pir muzîk. Rîtma navxweyî bi rengêkî ciwan hatiye afirandin.

(tev grîn û tev brîn) (r.149)

(r+î / r+î)

(î+n / î+n)

Bi dubarebûna van her çar fonîman rîtmeke navxwe ya bi şêweyekî xemgîn hatiye avakirin, çûnkî ev her du peyv derbirînê ji nexweşî û azaran dikin.

(bibezîn zû, lez werin) (r.150)

(e+z/ e+z)

Her du fonîmên (e, z), rîtma navxwe ya helbestê bi şêweyekî dilxweş û lezgîn afirandiye, di dema xwendina wan de zeng û muzîkeke xweş di guhên mirovî de deng vedide.

(welatê min ê delal) (r.150)

(e+l / e+l)

(l+a / l+a)

Helbestvanî ji hişekî gelek hişyar û bilîmetane şiyaye di nav her du peyvên (welat û delal) de, her çar fonîmên (e, l, l, a) dubare bike, zeng û awazeke dilgirtî bide vê helbestê û rîtma navxweyî bi şêweyekî ciwan û karîger biafirîne.

(hêsanî ye hêdî ye) (r.152)

(h+ê / h+ê)

Her du fonîmên (h, ê), şiyane rîtma navxweyî bi şêweyekî serincrakêş biafirînin.

(tirba wî ye rih û canê kurdan) (r.153)

(a+n / a+n)

Dubarebûna her du fonîmên (a,n), muzîkeke sozdar dirust kiriye û rîtma navxweyî bi dubarebûna van fonîman hatiye afirandin.

(şev reşe û tarî ye) (r.155)

(ş+e / ş+e)

Bi dubarebûna her du fonîmên (ş, e), rîtma navxweyî hatiye afirandin, dema xwendina van her du peyvên yekser mirov hest pê dike ku helbestvan ji layê derûnî ve ne aram e. Lewre her du peyvên ku derbirîne ji nexweşiyên dikin, bûne jêdera dirustbûna cot fonîman.

(zanîn û hner ruhna firqan) (r.153)

(a+n / a +n) (h+n/ h+n)

Bi dubarebûna her çar fonîmên (a, n), (h, n), helbestvanî rîtma navxweyî bi şêweyekî karîger û ciwan afirandiye.

(derman li ku, derd li ku) (r.155)

(d+e / d+e)

Bi dubarebûna her du fonîmên (d, e), helbestvan şiyaye rîtma navxweyî bi şêweyekî tijî jan û xemgîn biafirîne.

(text jî çûye bext jî çûye nema al) (r.157)

(x+t / x+t)

Bi dubarebûna her du fonîmên (x, t), rîtma navxweyî bi şêweyekî reşbîn û perîşan hatiye afirandin.

2- Dubarebûna cot fonîmên hevdeng ên berovajî:

(min bajar navê bes lêva avê) (r.145)

(v+a / a+v)

Bi dubarebûna her du fonîmên (v, a) yên berovajî, rîtma navxweyî bi şêweyekî karîger hatiye afirandin.

(al û welat jî zanîn) (r.148)

(a+l / l+a)

Dubarebûna her du fonîmên (a, l) yên berovajî, wizeyeke bihêz daye avakirina rîtma navxweyî.

(bihara min, bahîza min, hemî reş) (r.156)

(h+a / a+h)

Bi dubarebûna her du fonîmên (e,a) yên berovajî, bi ciwantirîn şêwe şiyane bibin egerê afirandina rîtma navxwe ya helbestî.

B - Dubarebûna cot fonîmên hevdeng dabirayî:

1- wekî hev:

(zer bû ew rke

Ji zêr bû zîf) (r.136)

(z+r / z+r)

Bi dubarebûna her du fonîmên (z, r), zengeke melîl û perîşan di nav van du peyvan de deng vedide, her wisa rîtma navxweyî bi dubarebûna wan hatiye afirandin.

(perîşan im û jar im) (r.146)

(a+m / a+m)

Bi dubarebûna her du fonîmên (a,m) yên dabrayî, helbestvanî seng û dewlemendî daye rîtma navxweyî.

(mirîn nîne bo giyanê armancan) (r.157)

(m+n / m+n)

Bi dubarebûna her du fonîmên (m, n) yên dabrayî, helbestvanî şiyaye vejeneke bihêz bide rîtma navxweyî.

(birîndar û bê derman im) (r.138)

(d+r / d+r)

Bi dubarebûna her du fonîmên (d, r) yên dabrayî, helbestvanî rîtma navxweyî bi seng û buhayeke zor girîng afirandiye.

(çira xuy_n gerim çima dil nerm) (r.141)

(ç+a / ç+a)

B dubarebûna her du fonîmên (ç, a) yên dabrayî, helbestvan şiyaye di baştirîn halet de rîtma navxweyî biafirîne.

2- Berovajî:

(welat bav e, bira û dê) (r.142)

(e+a / e+a)

Bi dubarebûna her du fonîmên (e, a) yên berovajî yên ne wekî hev, rîtma navxweyî bi şêweyekî hunerî û serincrakêş hatiye afirandin.

(lê roja me bizêr e

Jartirê me şêr e) (r.149)

(r+j / j+r)

Bi dubarebûna her du fonîmên (r, j) yên berovajî yên ne wekî hev, rîtma navxwe ya helbestê bi ciwantirîn şêwe hatiye afirandin, muzîk û zengeke xweş jê dirust bûye.

2.2. DUBAREKIRINA PEYVAN

Dubarekirina peyvan di nav helbestê de, pêkhateyeke mikum û xursitî ye. Helbestvan penayê dibin ber dubarekirina peyvan, da ku bi awayekî rêkxistî sîstema teknîka dubarekirinê bikin havênê avakirina helbesteke xwedî binyateka hunerî ya berz. Dubarekirina peyvê di helbestê de bi xaleke bineret tê hejmartin. Gelek pêvegirêdayî ye ji layê delalet û hizrên tê de hatine derbirîn.⁽¹⁸⁶⁾ Ev teknîk zor berbelav e di nav helbestê de. “Dubarekirina peyvê asantirîn cureyê dubarekirinê ye

¹⁸⁶ 'Bid Nur DAWld 'mran, *El-Binye Elîqa'ye Fî Ş'ri Elciwahrî, Etruhe Diktura*, Kulye el-Adab, Cam',e Kufe, 2008, r. 187.

û ji teknîkên dubarekirina ristê berbelavtir e. Ev cureyê dubarekirinê zanayên kevin gelek li ser rawestiyane. Yasayên sereke yên bo vî cureyê dubarekirinê ew e ku peyva dubarebûyî pêwendiyêke bihêz bi wataya giştî ya dewrûberê tê de hatî hebe; eger ne, wê peyvê çî girîngiya xwe nabe.”⁽¹⁸⁷⁾ Dubarebûna peyvan di helbestê de paldereke herî bihêz a dirustibûna rîtma navxweyî ye. Ku wate peyv jî weke pêkhatiya zimanî roleke kara û cêgîr heye di avakirina rîtma navxwe ya helbestê de. “Piraniya caran jî rîtma navxweyî ya girêdayî bi hilbijartina peyvan ve û ew peyv serbixwe tîn hilbijartin.”⁽¹⁸⁸⁾ Helbestvanî bi awayekî serkeftî sûd û mifa ji dubarekirina peyvan dîtiye û di nav vê dîwana xwe de bi kar aniye. Ji bo serêxistina layenê hunerî cihêkî taybet daye vê teknîkê. Ev teknîk bi du şêweyan di nav helbestê de tê bikaranîn:

1- Dubarekirina peyvan bi şêweyê asoyî: Mebest jê ew e helbestvan çend peyvan bi şêweyê asoyî di nav dêra helbestê de dubare bike. Evca ev dubarekirin li dûv hev bin yan jî ji hev qetiyayî bin, helbestvanî di vê dîwana xwe de bi gelek şêweyan ev teknîk bi kar aniye. Bo nimûne di helbesta “Yadê” de, helbestvanî teknîka dubarekirina peyvan bi şêweyê asoyî berceste kiriye. Peyva (yadê) li dûv hev du caran dubare kiriye. Rîtim û delaletêke kûr bi helbestê bexşîye. Ku wate rîtma navxweyî bi dubarekirina peyva (yadê) bi şêweyê hunerî afirandiye. Her wisa sernavê vê helbestê jî bi xwe ji peyva (yadê) pêk hatiye. Lewre di xwendina wê de mirov yekser bi layenê huneriyê vê helbestê karîger dibe, dema dibêje:

(yadê, yadê megrî

Xwedê mezin, pyare) (r.139)

Ku wate helbestvanî bi dubarekirina peyva (yadê) aliyê rîtma navxweyî û erkê cextkirina peyama helbestê bihêz kiriye.

Di helbesta “Gornistan” de helbestvanî çar caran peyva (sed) bi şêweyê asoyî bi kar aniye, di her nîve dêrekê de du caran dubare bûye, dema dibêje:

¹⁸⁷ Fihid Nasir 'aşur, eltîkrar fi ş'ri mihmud derwêş, eltib'e ula, elmesise el'ribye lîldrasat û elneşir,60. 2004,r.

¹⁸⁸ Mes'ud Cemîl Reşîd. rulê tewrên helbjartin û rêzkirî di çêkirna rîtma hozana klasîkya kurdîda,r.131.

(sed grîn û sed kuyan

sed meqam û sed sitran) (r.141)

Destnîşankirina hejmaran di nav vê helbestê de, ji ber ku nexweşî û aloziya di jiyana helbestvanî de zor bûye, lewre neçar bûye ku derbirînê ji xema xwe bike bi rêya dubarekirina peyva (sed) çar caran, rîتما navxwe ya helbestê bi rêya peyvên xemgîn afirandiye. Ku wate dema xwendevan vê helbestê dxwîne, bi şêweyekî rastexwe beşdar dibe ligel xema helbestvanî. Ev ji layekî, ji layekê dî ve, ev dubarekirin hilgira delalet û watayên curbicur e, ku rêjeya zor a xemên helbestvanî berçav dike.

Di helbesta “Neman” de, helbestvanî du caran peyvên (mêr, jin) bi şêweyê asoyî dubare kiriye:

(mêr bê jin in, jin bê mêr) (r.148)

Teknîka dubarekirina peyvan di vê helbestê de li ser binemayê pêçewaneyî hatiye vehandin, belê helbestvanî ev cure teknîk xsiyete li jêr xizmeta dewlemendkirina layenê hunerî yê binyata teksta helbestê. Bi şêweyekî estetîkane du caran di dêreka helbestê de her du peyvên (mêr, jin) dubare kirine, rîتما navxwe ya helbestê bi baştirîn şêwe ava kiriye, dema mirov vê dêra helbestê dxwîne hest pê dike digel seqayekê muzîkî yê xembar, çunkî ev her du peyv derbirînê ji nexweşî û azaran dikin.

Di helbesta “Xebat” de, çar caran peyva (werin) dubare bûye ku vê dubarerkirinê jî rastexwe pêwendiya bi barê derûnî yê helbestvanî ve heye; çunkî helbestvanî çar caran li dûv hev peyva *werin* dubare kiriye:

(werin, werin dibistan

Hêlîna me dibistan

Werin, werin mektebê) (r.150)

Helbestvan bi rêya dubarkirina peyva (werin) şiyaye hem rîtma navxwe ya helbestê dewlemend bike û hem bayex û girîngiya dibistanê bide diyarkirin. Helbestvan ji dil û can gazî mirovan dike da ku bên dibistanê, ji ber ku ew cihê zanîn û zanistê ye, û rêyeke gelek gunçaw e bo nemana nezanîne di nav milletan de. Ku wate dubarekirina peyva (werin) çar caran li dûv amajeyeke ron û eşkere ye bo cextkirina helwest û viyana helbestvanî bo layenê perwerdeyê û fêrkinê; çunkî ew baş dizane ku derdê nezanîn û nexwendewariyê, rêgirên herî sereke ne di rêya pêşketina milletan de. Loma helbestvan ji naxekî sotî hawar û gazî dike gişt mirovan ku bêne cihê zanist û zanîne da ku li ser binemayeke tendirust zanistê wergirin.

Di helbesta “Bavo” de, helbestvanî du caran peyva (dinê) dubare kiriye, rîtma navxwe ya helbestê gelek bi ciwanî afirandiye:

(kesk bûne mêrg û giya

dinê bi rewş e dinê şa) (r.151)

Helbestvanî cextkirineke mezin xistiye li ser peyva (dinê), her wisa bi awayekî serincrakêş û qeşeng salixdana dinyayê kiriye.

Di helbesta “Lo... Lo” de, helbestvanî peyva (xebat) du caran dubare kiriye, dema dibêje:

(binivîse!! Û bixwîne !!

Xebat, xebat felat e) (r.152)

Dubarekirina peyva (xebat) du caran li dûv hev cextkirin e bo girîngiya xwendin û zanîne, ji ber ku helbestvanî berî peyvên (xebat) her du peyvên (binivîse û bixwîne) bi kar anîne, peyva (xebat) li vir derbirîne ji buhayê xwendinê dike, her wisa bi awayekî ciwan û serincrakêş rîtma navxweyî afirandiye, wata û delaletên cuda cuda dane vê helbestê.

Di helbesta “Canê Min Têşe” de, helbestvanî du caran peyva (nemrin) bi kar aniye, dema dibêje:

(kurd nemrin nemrin)

Wek kulîlkên adarê) (r.155)

Peyva (nemrin) dupatkirine li ser maneveya milletê kurd dike ku milletekî zîndî ye li ser rûyê erdê. Helbestvan bi şêweyekî hostayane şiyaye rîتما navxwe ya helbestê biafirîne, çunkî peyva (nemrin) du caran li dûv hev dubare kiriye, ev şêwaza dubarekirinê jî derbirînê ji helwesta helbestvanî dike li beramberî milletê xwe.

Di helbestê “Welat û Dilê Min” de, helbestvanî bi baştirîn şêwaz teknîka dubarekirina peyvan bi şêweyê asoyî dirust kiriye. Rîتما navxwe ya helbestê bi dubarekirina van peyvan dirust kiriye û tekst pê xemilandiye. Xwendevan ligel xwendina van peyvan hest bi muzîkeke xemgîn dike, ji ber ku ew peyvên helbestvanî di nav vê helbestê de bi kar anîne, piraniya wan derbirînê ji nexweşî û azarên helbestvanî dikin, bo nimûne dema dibêje:

(Dinê tarî, dinê êvar û reş e

Bihara min, bahîza min, hemî reş

Di culî de, di deştê de tenê me

Qey rondik im, qey ez şîna dinê me

Xweş bihar e, lê xerîbî jarî ye

Min çî kir ku dinê li min tarî ye

Min çî kir ku zaroyên min mirine

Û ronahî ji çavên min birine

Bê xanî me, bê tîfak im, bê welat

Min bûk nedît, zaro nedît, nedît al

Porên min gewr, ez bîr bûme, bûme kal

Welatê min biken, tişteki bêje

Lalbûna te çima hewqas dirêj e

Çima hewqas tu bêdeng î û bênav

Bila bibin, goriyên te se û tav

Welatê min biken, biken megrî!!) (r. 56-57)

Weku diyar e di nav van derbirînên helbestê de, helbestvanî du caran peyvên (dînê û biken) bi kar anîne. Peyva (nedît) sê caran dubare kiriye, her wisa peyva (min) şeş caran dubare kiriye. Ji encama dubarebûna van peyvan rîtma navxweyî afirandiye, delaletêke bi azar û xembar daye vê helbestê, ev delaleta xembar jî ji kûratiya derûna wî derketiye. Çunkî bi awayekî jan peyva (min) şeş caran dubare kiriye û her careke dubarekirî jî saloxdana bextreşîya xwe dike.

2- Dubarekirina peyvan bi şeweyê stûnî: Helbestvanî ev teknîk bi şeweyekî berfireh di nav helbestên xwe de bi kar anîye. Di bikaranîna van peyvan de awaz û rîtmeke aram û dilxweş bi helbestên vê dîwanê bexşîye.

Di helbesta “Dibistan” de, sê caran peyva (dibistan) dubare bûye, dîsa divê em wê çendê jî ji bîr nekin ku sernavê vê helbestê bi xwe jî ji peyva (dibistan) pêk hatiye. Helbestvanî viyaye bi vê rêyê, wate bi bikaranîna peyva (dibistan) hevgrînekê di navbera giştî pêkhatayên helbestê de dirust bike, ji pêxemet avakirina rîtma navxwe ya helbestê bi awayekî serincrakêş pêşkêşî xwendevanî bike, dema dibêje:

(diçim ji bo dibistan

Dibistan pir xweşik e

Bi hogir û hevalan

Bi kitêb û mamoste

Bi çîroka newalan

Em hemî hej wê dîkin

Ji bo zanîn kanî ye

Tê de kenîn lehîstok

Dibistan xweş xanî ye)

Helbestvan gelek pabend e bi dibistanê ve, ango pêwendiyêke bêsînor di navbera wî û dibistanê de heye. Ev şeweyê girîngpêdanê jî girêdayî hezjêkirin û cextkirina wî ye bo dibistanê, her wisa helbestvanî du caran peyvên (ez, xwe) bi kar anîye. Ji bilî ku rîtma wê ya navxweyî bi renekî serkeftî encam daye, her wisa amajeyêke ron û eşkere ye bo hejmûna desthilata helbestvanî li ser vehandina helbestê, dema dibêje:

(Ez dixwazim mêr bibim

Xwariniya xwe dixwim

Sibe her tişt gulistan

Ez kitêbên xwe dibim) (r.136)

Di helbesta “Derman” de, helbestvanî çend peyvek bo helbesta xwe jê girtine û her mabeyn mabeyn dubare kirine. Bi vê çendê rîtmeke bi azar bi vê helbestê bexşîye, dema dibêje:

(Havîna dilê min

Ava sar dixwaze

Bihare û dinê

Bi govend û saz e

Heyv û stêr bi ruhî

Miqaman dibêjin

Sînga min tijî ye

Derdên min dirêj in

Dinê dibiriqe, lê

Eniya min tarî

Çem xweş diherike

Dil bê alîkarî

Ne girîn û ne qîr

Birîna min kûr e

Bê kef im dimeşim

Çiqas ev rê dûr e

Pora min gewr bûye

Dest û zendên min sar

Ne tenê dil û kezeb

Hestî jî birîndar

Destê dijminan de

Welatê min qurban

Jîn çî bû ji min re

Êş, aryan û jan

Dil, sîng şewitîne) (r.37)

Ew peyvên helbestvanî dubare kirin di vê helbestê de, bi rengê rastexwe hemiyar pêwendî bi mirovî ve heye, ango ew peyv beşek in ji pêkhatiya mirovî bi xwe, ev peyv bi xwe jî bi şêweyekî normal bi rîtmê ve dibendin. Ku ev peyv bi vî awayî ne: Peyva (min) neh caran dubare bûye, peyva (dil) çar caran dubare bûye, peyvên (sîng û dest û dinê) du caran dubare bûne. Dema xwendevan vê helbestê dixwîne her yekser guhên wî bi awazeke xemokî tîjîkirin. Çunkî helbestvanî ew peyv xistine qalibekî bêhêvîtiyê, ango helbestvanî bi rêya van peyvan ew xema di naxê wî de heye darêjîtiye. Helbestvan şiyaye rîtmê xwedî delaletê bi êş û jan jî dubarekirina van peyvan biafirîne. Helbesta “Derman” helbestek e bi muzîkeke xembar hatiye vehandin hejiyan û nalebariya derûna helbestvanî tê de reng vedide. Ku wate helbestvanî gişt kiryarên vê dubarekirinê bo mebesta avakirina rîtma navxwe ya helbestê bi kar aniye.

Di helbesta “Yadê” de, helbestvanî gelek peyv bi şêweyê stûnî dubare kirine. Di pirosa dubarekirinê de helbestvan serkeftî bûye, piraniya ewan peyvan jî derbirinê ji xema sereke ya helbestvanî dikan. Her peyveke helbestvanî dubarekirî rasterast peywendî bi derûna wî ve heye. Her wisa her peyveke wî dubarekirî çend mebest û armançek li pişt hebûne, hindêk ji wan armançan bo zengînkirina layenê estetîkiyê teksta helbestê bûye, hindêkên dî jî pêwendî bi rîtma navxwe ya helbestê ve hebûye, dema dibêje:

(deyka min delal e

Xweyî ji min re ew e

Ser landika min de bû

Negot sar e, ne şev e

Te hej kurê xwe dikir

Ya deyka dil şewat

Di kavî xurbetê

Bê nan û av, bê welat

Ez sêwî bûm, tu tenê

Bê kesîya dinê de

Bi sîngekî kor û jar

Ma ji min re kê şîr da

Yadê, yadê megrî

Xwedê mezin, piyare

Deyka min a delal

Perîşanî ne are

Çiqas zehmet min da te

Bi girîn û nexweşî

Mezin bibim dê bibe

Jîn ji te re dil xweşî) (r.39)

Di nav vê helbestê de peyva (min) şeş caran dubare bûye, peyvên (deyk, te) sê caran dubare bûne, peyvên (delal, dil, mezin) du caran dubare bûne. Xwendina van peyvan mirov hest bi rîtmêke serincrakêş dike, ji layekî dî ve dil û derûna mirovî ligel van peyvan hest bi xem û azarên helbestvanî dikin. Ku wate bi rêya dubarekirina van peyvan helbestvan şiyaye bi baştirîn şêwe xizmeta avakirina rîtma navxwe ya helbestê bike. Ew haletê derûniya ew tê de bigihîne xwendevanî, da ku ew jî hest bi hilçûn û azarên wî bike.

Di helbesta “Dengê Dê” de, helbestvanî pena biriye ber teknîka dubarekirina peyvan, da ku ewa di mejî û derûna wî de heye, bi baştirîn şêwe bigihîne xwendevanî

ku bi vê rêkê karîgeriya hunerî dirust kiriye. Rîtma navxwe ya helbestê weku amraz û regezeke karîger û bihêz di nav helbestê de afirandiye, dema dibêje:

(Kurmancî zimanê bav û kal e

Tirba xwe de dê bi wî dinale

Kurmancî ye deng û şûra pêşîn

Kurmancî ye deng û şûra paşîn

Sor û gewr û kesk bi rengê kurdî

Bi kurmancî tenê bi dengê kurdî

Bavê min û dadka spî pur

Banê me dîkin ji tarî ya gur

Kurmancî zimanê bav û kal e

Tirba xwe de dê bi wî dinale) (r.142)

Peyva (kurmancî) cihekî taybet di nav vê helbestê de vegirtiye û bûye havênê dirustibûna rîtma navxwe ya helbestê. Dema xwendevan vê helbestê dixwîne, yekser dikeve li jêr karîgeriya dubarekirina peyvê, nexasim ku peyva (kurmancî) pênc caran dubare bûye. Peyva (deng) sê caran dubare bûye, peyvên (ziman, bav, kal, sûr, dinale, şûr, kurdî, tirb, xwe û wî), du caran dubare bûne. Bi renegekî giştî piraniya wan peyvên helbestvanî dubare kirine, derbirînê ji ramana kurmancî dîkin, ango helbestvanî bi bilîmetane peyvên (ziman, bav, kal, sûr dinale, şûr û kurdî û tirb), bi kar anîne da ku hevguncandinekê di navbera wan peyvan û peyva (kurmancî) de, dirust bike.

Di helbesta “Defter” de, helbestvanî bi tenê senga dubarekirina peyvan xistiye li ser her du peyvên (zanîn, mekteb)ê. Ev her du peyv sê caran hatine dubarekirin, dema dibêje:

(Qelem, kitêb û defter

Mekteb, ruhî û rêber

Em hej zanînê dikin

Hûn jî qasê me bikin

Werin brano mektebê

Xwe pavêjn edebê

Zanîn xweş e û çak e

Mekteb delal û pak e

Hugir, heval û xebat

Zanîn, mêrîfî, malbat) (r.144)

Bi dubarebûna van du peyvan, helbestvan şiyaye awazeke xweş û karîger di nav helbestê de dirust bike, ji pêxemet wê çendê da ku rîtmeke navxwe ya ji hêja bide helbestê, giyan û cesedê xwendevanî ligel yekem xwendina vê helbestê hest bi xweşiyêke bêşnor bikin. Ev her du peyv bi rengekî rastexwe derbirîne ji naverok û peyama helbestvanî dikin. Ango pêwendiyêke xursitî di navbera van peyvan û sernavê helbestê de heye, ev ji layekî, ji layekî dî ve dubarekirina van peyvan cextkirin e li ser buha û girîngiya zanîne li cem helbestvanî.

Di helbesta “Du Bira” de, bi rengekî estetîkî û hunerane helbestvanî teknîka dubarekirina peyvan bi kar anîye, dewlemendiyêke yekcar mezin daye rîtma navxwe ya helbestê. Dema xwendevan van peyvên dubarekirî dixwîne, dil û derûna wî hest bi xema sereke ya helbestvanî dikin, anga xwendevan bê gîrobûn dikeve li jêr karîgeriya van peyvên dubarekrî. Ku wate ezmûna helbestvanî di dubarekirina peyvan de, desthelî û şaraziya wî diyar dike û hejmûna wî disepîne li ser xwendevanî. Dema dibêje:

(Çend sed kurmanc birçî ne

Çend sed kurmanc brîndar!

Çend sed kurmanc bi grîn!) (r.147)

Helbestvanî bi regekî dahênerane sê caran peyvên (çend, sed, kurmanc) li dûv hev dubare kirine, bê ku henaseya xwe hilbikêşe. Ev çend delaleteke rasteqîne ye ji naxê helbestvanî beramber wan nexweşî û azarên milletê wî ketiye tê de. Ev rengê dubarekirinê pêdivî bi şarezayeke mezin heye, çunkî dubarekirina peyvên sê caran li dûv hev eger çî ramanên kûr û xwedî derbirînên fireh rehend nebin, wê demê dê lengiyeke eşkere bikeve di binyata teksta helbestê de û dê valahî û lawaziyê bixe di layenê ciwankarî û estetîkiya wê helbestê de. Serencam dê dubarekirineke sist û xaf jê berhem bê, belê di prosa dubarekirina van peyvên di nav vê helbestê de, helbestvanî bo xwendevanê xwe selmandiye ku wî çendîn armanc û mebest pê hebûne dema ev dubarekirin encam dane, ew jî afirandina rîtmî navxwe ye û bizavek e ji layenê helbestvanî ve da ku xwendevanî jî beşdarî xem û azar û hilçûniyên xwe bike .

Di helbesta “Zanîn” de, helbestvanî senga dubarekirina peyvên bi tenê xistiye li ser peyva (zanîn). Peyva (zanîn) li cem helbestvanî amrazeke herî diyar e bo rizgarkirina mirovan ji gişt nexweşîyan. Peyva (zanîn) bi regekî rêkxistî û hunerî cihekî berfireh di nav helbestê de vegirtiye, rîtmî navxwe ya helbestê bi awayekî serincrakêş afirandiye:

(Perîşanî ne xem e

Dewlemendî zanîn e

Bi vê dinya geşkirin

Jê re ruhnî anîne

Bi zanînê, kêrhatî

Hemî camêrên dinê
Xelk û bajar û deştan
Kurtalê de em tenê
Dewlemendî zanîn e
Al û welat jî zanîn
Bi zanînê rayê min
Binyatê wan tê danîn) (r.148)

Helbestvanî bi rêya dubarekirina peyva (zanîn), gişt teksta helbestê xemilandiye. Muzîkeke dilxweş bi ser helbestê de berdaye, rîtma navxwe ya helbestê bi rêya dubarebûna peyva (zanîn) bi pênc caran bi şêweyekî serkeftî hatiye afirandin.

Di helbesta “Xebat” de, helbestvanî bi şiyar û serbora xwe şiyaye çendîn peyvên jêgirtî û girêdayî peyama sereke ya helbestê, bi rengê dahênerane dubare bike, da ku hêza rîtma navxweyî bê sepandin di nav gişt rûberê helbestê de:

(Keknon werin xebatê

Sibe bûye rojhelan

Bi zanîn û mektebê

Ava dibe ev welat

Werin, werin, dibistan

Dergehê xwe vekir

Werin her roj zêdetir

Bi zanînê, bi kêrî

Werin lawînon mektebê

Mekteb hêlîna me ye

Bibezin zû, lez werin

Zanîn evîna me ye

Roj kaniya ruhî ye

Mekteb kaniya zanîn

Dê û bavên me hemî

Keç û lawên xwe anîn

Werin, werin mektebê

Hêlîna me dibistan

Bi xwendin û zanînê

Ava dibe kurdistan (r.150)

Helbestvanî her şeş peyvên (werin, zanîn, mekteb, me, xwe, dibistan) bi rengekî serincrakêş û hunerane, bo çendîn caran dubare kirine, da ku avahiya helbestê bi teknîka dubarekirina van peyvên bê nexşandin; buha û girîngiya rîtma navxweyî bi dubarebûna van peyvên bê destnîşankirin û afirandin; karîgeriya hunerî li ser xwendevanî bihêle dema vê helbestê dixwînin. Ku wate helbestvanî bi şeweyekî dahênerane ev her şeş peyv dubare kirine, ji aliyekî din ve mebesta helbestvanî ji dubarekirina van peyvên cextkirin e li ser buhayê perwerde û fêrkirinê. Peyvên (werin, me) çar caran dubare bûne. Peyvên (zanîn, mekteb) pênc caran dubare bûne. Ku wate helbestvanî pirtir dakokî û senga dubarebûna peyvên xistiye li ser peyva (zanîn û mekteb) da ku di hatina zarokan bo mektebê de, hişyarî û zanistî û zanînê bi dest xwe ve bînin, lewre di pey re bi rêjeyeke kêmtir peyvên (me, werin) bi şeweyê stûnî dubare kirine. Peyvên (dibistan û xwe) jî du caran dubare bûne.

3- Dubarebûna peyvana li dumahîka helbestê:

Ev teknîka dubarekirina peyvana li dumahîka helbestê di nav dîwana helbestvanî de, bi awayekî bertesk hatiye bikaranîn. Bi derbirîneke dî vê teknîkê neşiyaye mewda û cihekî taybet vegire di serbora helbestvanî de. Ev teknîk tenê di haletekî de hatiye bercestekirin. Teknîka dubarekirina peyvana li dumahîka helbestê gelek watayan bi xwe ve digire. Nexasim eger ew dubarekirin mebestdar be û bi hişyarî helbestvanî bi kar anîbe, ne ji bêhişiya helbestvanî be, belku bi hişekî dahênerane ew kiryar bê encamdan, dê gelek xwendin û derbirînên cuda cuda bo bêne kirin. Rîtma navxwe ya helbestê dê di guhê wergirî de deng vede û bibe eger ku serinca wergirî bo layenê helbesta xwe rakêşe da ku bişê bi vê rêyê peyama û mebesta xwe bigihîne wî û wî ji tekstê helbesta xwe razî bike. Çunkî bi dumahî hatina helbestê wergir dê gelek bi wê helbestê karîger be. Ev teknîk di helbesta “Dilê Çûkê” de hatiye bikaranîn:

(Lê çûkê nexwar

Xwarin û şîf

Bes digot her ro

Bi dengêkî şewat

Ez gorî te me

Ax welat !! Welat) (r.136)

Dubarekirina peyva (welat) li dumahîka helbestê bi du caran, nîşana wê çendê ye ku helbestvan ji dil û can hej axa xwe dike û belge ye li ser girêdana wî bi axa wî ve, lewre kiryara dubarekirina peyvana li dumahîka helbestê de afirandiyê. Her wisa bo aramkirina derûnî û haydarkirina xwendevanî bi viyan û hezjêkirina welatî, ev çende bi kar aniye, ji layenekî dîtir ve teknîka dubarekirinê bi erkê cextkirina gotara

helbestî rabûye û rîتما navxweyî bi dubarebûna vê peyvê li dumahîka helbestê bi şêweyekî karîger hatiye afirandin, xweşiyeke dî daye vê helbestê.

2.3. DUBAREKIRINA RISTEYAN

Riste weku mezintirîn pêkhatiya zimanî, erkekî girîng di afirandina teknîka dubarekirinê de dibîne, helbestvan penayê dibine ber da ku peyama xwe bi risteyeke tamam bigihînin wergirî, her wisa dubarekirina risteyan di nav helbestê de çendîn erkan cih bi cih dike, ji wan erkan jî:⁽¹⁸⁹⁾

- 1- Cextkirina watayê û cêgîrkirina wê di guhê xwendevanî de.
- 2- Beşdariyê di avakirina rîتما navxweya helbestê de dike.
- 3- Ciwaniyê hemereng di axaftinê de zêde dike.
- 4- Bi eşkerekirina haletên derûnî radibe, ewên ku helbestvan tê de dijî.

Helbestvanî di nav helbestên vê dîwana xwe de, cihekî yekcar mezin terxan kiriye bo dubarekirina risteyan. Ew riste jî di nav xwe de, gelek watayên curbicur digihîne, ango ev teknîk xwedî pêgeheke taybet e li cem helbestvanî û girêdayî layenê delalî û ramanên tekstî ye.

Di helbesta “Delalê” de, helbestvanî senga dubarebûna ristina xistiye li ser risteyekê, ew riste jî li cem helbestvanî buhayekî yekcar mezin heye, lewre bûye cihê girîngpêdana helbestvanî:

(Germiya xwîna te ji çavên te xuya

Delala min tu dar î ser berf û çiya

¹⁸⁹ Dahu Asye, h.b. r. 93.

Lê çavên te yên kesk mêrg û parêz hene

Lê dengê te yê nerm girînên zîz hene

Dilê min hêlîn e zend û destên min text

Jiyan û xweşiyê, tu yî armanc û bext

Dîroka sibehetî, bin lîngê te de mir

Nijde wêr û zîv te dil û can talan kir

Ez bibim destê te de piyale û piyan

Tu bibe ji min re detûmîr û sermiyan

Ser û serek bibe em jî peyanên te

Tu 'ewr û 'esman bibe em çiyayên te

Germiya xwîna te ji çavên te xuya

Wek heyvê delalê !! Bi ser berf û çiya) (r,140)

Di nav vê helbestê de helbestvanî risteya (germiya xwîna te ji çavên te xuya) du caran dubare kiriye, carekê li destpêka helbestê û careke dî berî helbesta xwe bi dumayik bîne. Ev bo me wê çendê diselmîne ku helbestvanî viyaye du mebestan di nav vê risteya helbestî de bigihîne. Ew jî dupatkirin e li ser girîngî û buhayê naveroka babetî, her wisa afirandina rîtma navxweyî ye bi teknîkeke hunerî ya berz. Her wisa bi dubarebûna vê risteyê li destpêka helbestê û berî helbest bi dumahîk bê careke dî dubare bûye xweşiyêke bêwêne di xwendina wê de heye.

Helbestvanî di helbesta “Nûbihar e” de, arasteya dubarekirina risteyan berev du arasteyan biriye, ango helbestvanî du araste weku alavekî cêgîr û karîger bo xizmeta avakirina rîtma navxwe ya helbestê destnîşan kirine û ew bûne regezeke guncaw û kara di nav prosa teknîka dubarekirinê de:

(Nûbihar e nûbihar e

Deşt û çiya mêrg û dar e

Kanî û çem xweş û sar e

Tum kenîn e tum geşî ye

Xem û hêstir çavreşî ye

Gul bi bûk in bi bûk in

Pal û newal çî xweşik in

Berx û kulîlk hê kiçik in

Tum kenîn e tum geşî ye

Xem û hêstir çavreşî ye

Bêdengî ye bi reng û zad

Heyv rohinya xwe daçeqand

Gul û bilbil hev ramîsand

Tim kenîn e tim geşî ye

Xem û hêstir çavreşî ye

Ji zozanê bilûrvan e

Ji lawikên dil û can e

Ev nûbihar Kurdistan e

Tum kenîn e tum geşî ye

Xem û hêstir çavreşî ye (r.144)

Bi dubarekirina risteya (nûbihar e), di destpêka helbestê de rîtma navxweyî bi şêweyekî ciwan û karîger hatiye afirandin ku serinca wergirî bo vê helbestê rakêşe. Her wisa ev teknîk amajeyeke eşkere ye bo cextkirinê li ser peyama helbestvanî ku girêdayî vejîn û elindeke nû ye. Risteya (nûbihar e) du caran li dû hev di destpêka helbestê de hatiye bikaranîn, piştî çendîn derbirînan helbestvanî careke din risteya (nûbihar e) dubare kiriye, her wisa sernavê vê helbestê bi xwe jî ji risteya (nûbihar e) pêk hatiye. Vê yekê muzîkeke xweş û karîger xistiye di nav van ristan de, her wisa helbestvanî viyaye bibêje xwendevanî ku ev bihara hatî ji hemî biharên berî xwe cuda ye û nûkirinek tê de heye. Her wisa her du risteyên (tim kenîn e tim geşî ye) (xem û hêstir çavreşî ye) şiyane bi awayekî karîger teknîka dubarekirinê di nav gişt rûberê teksta helbestê de berceste bike. Helbestvanî bi şêweyekî dahênerane rîtmeke xweş bi rêya van risteyan bi ser helbestê de berdaye, her yek ji van risteyan çar caran dubare bûne, vê yekê tam û çêjeke bêsinor daye vê helbestê.

Di helbesta “Nema” de, panoramaya dubarekirina risteyan hêz û wizeyeke bêsinor daye rîtma navxwe ya helbestê. Teknîka dubarekirina risteyan mîna ronahiyekê ye helbestvanî berdaye di nav gişt layenên tarî yê vê helbestê de. Vejeneke bihêz daye binyata teksta helbestê:

(Qey kurd mirin nema nêr

Ne mizgeft ma û ne dêr

Mêr bê jin in, jin bê mêr

Ne mizgeft ma û ne dêr

Mirin bo min xweştir e

Jiyana min hêstir e

Ji çavên te reştir e

Jiyana min hêstir e

Ava ferat bê keser e

Ne pê maye û ne ser

Bûk mirine bûne zer

Ne pê maye û ne ser

Ava dîcle girîn e

Agirî wek birîn e

Xencera xwe derîne

Agirî wek birîne

'Evdilrehman mir û ket

Çavê botan mir û ket

Rohna kurdan mir û ket

Çavê botan mir û ket

Guzge, şernex şîn û reş

Ne çav rohnî ne dil geş

Em heft bûne mane şeş

Ne çav rohnî ne dil geş

Bedlîs li ku, li ku Wan

Xerpût li ku û Botan

Gur tijî ne ji xortan

Xerpût li ku û Botan

Welatê jûr û jêrîn

Tev girîn û tev birîn

Welatê Xanî û Zîn

Tev girîn û tev birîn

'Ezmanê me bi stêr e

Lê roja me bi zêr e

Jiyana min hêstir e

Ji çavên te reştir e

Mirin bo min xweştir e

Ji çavên te reştir e (r.148-149)

Helbestvanî bi şarezane yarî bi risteyan kirine. Bi şêweyekî hunerî ev kiryar bo çendîn caran di nav vê helbestê de dubare kiriye. Ristên (jiyana min hêstir e) (ji çavên te reştir e) sê caran dubare bûne. Ristên (ne mizgeft ma û ne dêr), (mirin bo min xweştir e), (ne pê maye û ne ser), (agirî wek birîn e), (çavê Botan mir û ket), (ne çav rohnî ne dil geş) ,(xerpût li ku û Botan), (tev girîn û tev birîn) du caran dubare bûne. Bi dubarebûna van gişt risteyan hejmûna rîtmî navxweyî bi ser binyata helbestê de hatiye sepandin. Ku wate bi teknîka dubarebûna van risteyan dê karîgeriya hunerî bi awayekî kara bo wergirî û xwendevanî bê veguhastin. Her wisa ev şêwazê berfirehbûna risteyan di nav helbestekê de, delalet e li ser cextkirina peyama helbestvanî bo wergirî û xwendevanî, ango helbestvanî bi vê şêwazê viyaye ew xema di dil û derûna wî de heyî, bi ciwantirîn şêwe bidarêşe û bi van derbirînên xwe buhayekî estetîkî bide teksta helbesta xwe. Her wisa helbestvanî viyaye wê reşbînî û bêhêvîtiya xwe li hember gelek pirs û diyardeyan bo xwendevanî ragihîne û naxê xwe yê tije jan û azirî nîşanî wî bide.

2.4. DUBAREKIRINA BAZINEYÎ

Ev cureyê dubarekirinê ew e ku dema helbestvan li destpêka helbesta xwe û li dumayik wê risteyekê yan dêreke helbestê yan derbirîneke helbestê pirtir dubare bike. “ Gelek caran jî ev dúbarekirne wekî êk û yeksan nîn, belê dupat kirne li ser gyanê dúbarekirinê bo gehandna delaletên têksitî.”⁽¹⁹⁰⁾ Ev dubarekirin weke bazinekî li dora helbestê tê alandin, bi rêya vê teknîkê rîtma navxweyî bi baştirîn şêweyê tê dirustikirin û raman û delaletên kûr bi helbestê tî dayîn. Helbestvanî di nav vê dîwana xwe de ev teknîk bi awayekî rêkxistî û hunerî bikar aniye. Bi rêya vê teknîkê helbestvanî derbirîn ji xweşî û nexweşiyên xwe kirine, helçûnên xwe yên derûnî bi vê teknîkê darêjtîne û gihandine xwendevanî.

Helbestvanî bi rêya dubarebûna bazineyî di helbesta “Heyv û Stêr” de, bi awayekî dahênerane teknîka dubarekirina di nav vê helbestê de afirandiye. Diyar e ev kiryar amajeyeke êşkere ye ku helbestvanî divê du armancan di demekê de bi dest ve bîne û li cem xwendevanî peyda bike. Ew armanc jî girêdayî layenê derûnî û hunerî ne. Wate ji aliyê hunerî ve payeberziya xwe nîşanî wergirî û xwendevanî bide û ji aliyê derûnî ve, tişta ew hest pê dike û diazrîne di mejî û dil wî de bi rêya teknîka dubarekirinê li cem xwendevanî jî peyda bike:

(Îşev şev e, şev bi şev e

Dê digirî tirba xwe ve

Heyv derket stêra xwe ve

Dil ketî me û sîng jar im

Bê welat û bê bajar im

Erdê xwe re ez heyran im

Birîndar û bê derman im

¹⁹⁰ 'Bdulqadir Hme Emîn Mihemed, h.b. r. 221.

Ji kurdan re ez qurban im

Dil ketî me û sîng jar im

Bê welat û bê bajar im

Bê xweyî me ez tenê me

Yek ji camêrên dinê me

Ji bêbextî ez ketî me

Dil ketî me û sîng jar im

Bê welat û bê bajar im

Îşev şev e, şev bi şev e

Bavê min tê gura xwe ve

Heyv derket stêra xwe ve

Dil ketî me û sîng jar im

Bê welat û bê bajar im) (r.138)

Weke ya eşkere di vê helbestê de helbestvanî riste û derbirînên (Îşev şev e, şev bi şev e), (Dê digirî tirba xwe ve), (Heyv derket stêra xwe ve), (Dil ketî me û sîng jar im, (Bê welat û bê bajar im) bi teknîkeke herî berz mekanîzmaya dubarekirina bazineyî bi kar aniye. Vê teknîkê bal û şaperên xwe berdane li ser vê helbestê. Bi ciwantirîn şêwazên dubarekirinê ev kiryar hatine encamdan. Helbestvanî bi şarezane kiryara bercestebûna teknîka dubarekirina bazineyî di nav helbesta xwe de dirust kiriye. Wizeyeke yekcar mezin daye rîtma navxweyî, ji ber ku binemayê zalbûn û serkeftina rîtma navxweyî dubarebûna regezan e bi şeweyekî rêxistî, lewre em dê bibînin ku helbestvanî bi rêxistneke hunerane ev riste û derbirînên helbestî li dor helbesta xwe alandiye. Bi vî awayî estetîkiyeke bêwêne pêşkêşî xwendevanî kiriye.

Helbestvanî di helbesta “Kitêba Min” de, bi endazeyeke hunerî ya herî berz teknîka dubarebûna bazineyî bi kar aniye. Ew riste û derbirînên helbestvanî bo vê teknîkê dirustkirî ne, bi rengê giştî bo serêxistina layenê rîtmî navxwe ya helbestê bûye. Ev ji layekî ve, ji layekî dî ve ew riste û derbirînên helbestê rastexwe derbirînê ji naveroka helbestê dikin, layenê wê yê delalî jî dewlemend û berfirehtir lê dîke:

(Kitêba min sipehî ye

Kitêbeke pir mezin

Tê de her tişt dibînim

Kulîk, kitk, berx, bizin

Ez gelek hej wê dikim

Rûpelên wê çeleng in

Çîrokên wê xweşik in

Û resmên wê bireng in

Kitêba min dibêje

Welat bav e, bira û dê

Her gav hinek dixwînim

Çiqas kêfa min pê tê

Kitêba min dibêje

Sor, spî, kesk, ala me

Ez ê yekê bikirim

Sibê ji bo mala me

Kitêba min spehî ye

Kitêbeke pir mezin

Tê de her tişt dibînim

Kulîk, kitk, berx, bizin) (r.142)

Riste û derbirînên (kitêba min sipehî ye), (kitêbeke pir mezin), (tê de her tişt dibînim), (kulîk, kitk, berx, bizin) mîna bazinekî li dor helbestê hatine alandin, rîtmeke xweş bi helbestê bexşîye. Helbestvanî bi renekî estetîkî siruştê jîngeha xwe di nav van riste û derbirînên helbestî de bi awayekî siruştane wekî filmekî dîkomentariê pêşkêşî xwendevanê xwe kiriye. Rîtma navxweyî bi şeweyekî siruştî afirandiye.

Helbestvanî di helbesta “Dilê min” de, bi şarezatiya xwe şiyaye dubarekirina bazineyî ji pêxemet hevgirêdana helbestê bi kar bîne, ango teknîka dubarekirinê bo zalbûna dubarebûna bazineyî di nav vê helbestê de berceste kiriye:

(Min bajar navê	bes lêva avê
Rez, dehl û rêl	û qelî sêl
Keriyên bizin	nêriyên mezin
Keç û şivan	û bilûrvan
Jinên rewş û reng	bê dil û bê can
Keçên 'eşîr	bi can û şîr
Pantur û çaket	dilê min raket
Şal û şepik	kumkî kişik
Sor, spî, kesk û zer	aştî, yext, şer
'erdikê bi av	bi heyv û tav

Gulkevan û ga	her kes bav û bira
Ne mîr ne axa	kurdistan za
Çavên stêr zêrîn	ne jûr ne jêrîn
Welat bû yek	kurd xwişk û kek
Dar, çiya, kenîn	ne ax!! ne enîn!!
Millet rabû	welat şa bû
Min bajar navê	bes lêva avê
Rez, dehl û rêl	û qelî sêl) (r.145)

Riste û derbirînên (min bajar navê, bes lêva avê, rez, dehl, rêl û qelî sêl) roleke kara û girîng gêrane ji pêxemet avakirina teknîka dubarebûna bazineyî di nav vê helbestê de û mîna bazinekî li dor helbestê hatiye alandin. Rîtma navxwe bi şêweyekî karîger di nav helbestê de afirandiye, ji ber ku ev teknîk yekser kar li guhê xwendevanî dike û xwendevan bi vê teknîkê dilxweş dibe dema helbestê dixwînin.

Helbestvanî di helbesta “Dengê Dê” de, şiyaye teknîka dubarekirina bazineyî encam bide bi dewlemendkirina rîtma navxwe ya helbestê:

(Kurmancî zimanê bav û kal e
 Tirba xwe de dê bi wî dinale
 Kurmancî ye deng û şûra pêşîn
 Kurmancî ye deng û şûra paşîn
 Sor û gewr û kesk bi rengê kurdî
 Bi kurmancî tenê bi dengê kurdî
 Bavê min û dadka spîpor

Banî me dikin ji tariya gur

Kurmancî zimanê bav û kal e

Tirba xwe de dê bi wî dinale) (r.142)

Weku diyar e riste û derbirîna (kurmançî zimanê bav û kal e/ tirba xwe de dê bi wî dinale) mîna bazinekî li dora vê helbestê hatiye alandin û bûye egerê zalbûna rîtmî navxweyî di nav helbestê de. Mebesta helbestvanî ji vê teknîkê hevgerêdana helbestê ye li ser binemayeke rêkxistî û hunerî, her wisa bo serincrakêşana xwendevanî bo tekstê helbesta xwe, helbestvanî ev teknîk bikar aniye.

2.5. DUBAREKIRINA DENGVEDANÊ

Mebest ji dubarekirina dengvedanê ew e; dema helbestvan dêreke helbestê yan jî risteyê di nav helbesta xwe de bo çendîn caran dubare bike bi vê kiryarê dengvedanekê di helbestê de peyda bike û ev dubarekirin bibe “tewerekî sereke û melbendî ji tewerên teksta helbestê.”⁽¹⁹¹⁾ Teknîka dubarekirina dengvedanê mîna teknîkên dîtir bûye cihê girîngpêdana helbestvanî, di nav vê dîwanê de.

Di helbesta “Tevda” de, helbestvanî senga dubarekirina ristan tenê xistiye li ser risteya (ma çi ye?) de. Ev riste weke kernevalekê helbestî wê dubarekirinê berçavî xwendevanî dike û di encamê de dengvedaneke mezin xistiye di nav binyata helbestê de. Her careke ev riste bi teknîka dubarekirinê rabibe, komeke delaletên cuda cuda di nav xwe de dihilgire û vê yekê hêz û wizeyeke karîger daye rîtmî navxwe ya helbestê. Ku wate erkê dubarekirina vê risteyê di nav helbestê de dahênana karabûna giştî buhayên jiyara rojaneya milletê kurd e. Ji ber ku li dûv her dubarekirineke vê risteyê, helbestvanî wêneyê karkirinê kiriye binemayê helbesta xwe, ev şeweyê dubarekirinê armanc bexş e bo xwendevanî da ku rastexwe bikevine li jêr karîgeriya layenê rîtmî navxweyî û wê mebesta helbestvanî divê bi dest ve bîne li cem wî, dakukîkirin û cexitkirin e li ser delaleta wê risteyê:

(Tranq, tranq û tranq !!

¹⁹¹ Yasrê Hesenî, *Binyatê Rîtmê Di Ş'ra Nûya Kurdî* da, r. 134.

Ma çi ye?

Hêsinger dixebitin

Xiş, xiş û xiş

Ma çi ye?

Ax, gîsin dilebitin

Gir, gir û gir !!

Ma çi ye?

Rê hesin diçê û tê

Teq, teq û teq !!

Ma çi ye?

Pale ne, çêdikin rê

Ting, ting û ting !!

Ma çi ye?

Pembo û kevanjen

Xir, xir û xir

Ma çi ye?

Protin, axê dikin den

Lê, lo, lê, lo !!

Ma çi ye?

Gundî zeviyê de ne

Were... Here !!

Ma çi ye?

Gundî zadê xwe tîne

Dengekî xweş !!

Ma çi ye?

Dengê zaro, dibistan..

Dixebitin!

Ma kî ne?

Em in kurên Kurdistan) (r,143)

Ku wate helbestvanî neh caran pena biriyê ber dubarekirina risteya (Ma çi ye?) di vê helbestê de, rîتما navxweyî bi endazeke herî berz a hunerî afirandiye û dengvedaneke karîger xistiye di nav helbestê de.

Di helbesta “Lo... Lo” de, risteya (lo kekê min megrî) bûye havênê dirustbûna dengvedaneke bihêz û karîger bo helbestê, helbestvanî her ji destpêka helbestê ev riste weke stûneke sereke û mikum bi kar aniyê, da ku serinca xwendevanî bo helbesta xwe rakêşe û rîتما navxwe ya helbestê bi baştirîn şêwe afirandiye, çunkî ev riste bi erkê serkêşiya xirvekirina gişt regezên avakerên helbestê rabûye, dengvedaneke xweş daye vê helbestê:

(Lo kekê min megrî

Dinê wisa namîne

Em jî rojekê dê rabin

Paşiyên me kenîn e

Bi ronahî em zexm in

Bi qelem û kitêban

Em dê qutin hêsinî

Bi zanîn û mekteban

Lo kekê min megrî

Deh milyon in dinê de

Hej welatê xwe bike

Dimirin jînê de

Ronahî ye rohnî ye

Geş bûye tu geştir be

Bixebite bimeşe

Şev reş e tu reştir be

Metirse ji badevan

Hêsanî ye hêdî ye

Dilê tirsonek sîngên gewr

Tu car ne girt ne diye

Lo kekê min megrî

De milyon in dinê de

Hej welatê xwe bike

Dimirin jînê de

Binivîse!! Bixwîne!!

Xebat, xebat felat e

Lo kekê min megrî

Deyka te welat e!!) (r,152)

Eger em temaşeyî vê helbestê bikin dê bo me eşkere be ku helbestvanî bi renekî efsûna wê teknîka dubarekirina dengvedanê di nav vê helbestê de bi kar aniyê. Risteya (lo kekê min megrî) bi çar çaran şiyaye dengvedaneke estetîkî di nav helbestê de berceste bike. Ev helbest xwedî awaz û zengeke dilxweş e, ji ber ku risteya (lo kekê min megrî) roleke kara gêraye ji bo avakirina teknîka dubarekirinê bi awayekî serincrakêş, her wisa bi rêya vê dubarekirinê helbestvanî bi hezeke yekcar mezin şiyaye derbirinê ji viyan û hejêkirina xwe bike beramber welatê xwe.

Di helbesta “Gata Kurekî” de, risteya (dibihîsim) bûye jêdera herî sereke ya dirustibûna rîtma navxwe ya helbestê. Helbestvanî ev riste bi hêza karîgeriya hunerî dîtîye, lewre her mabeyn mabeyn em dê bibînin ev riste weku alaveke aktîf hatiye dubarekirin. Di gel her dubarekirinekê de hindê wata û delaletên cuda cuda hildigire û dengvedaneke mezin dixê di nav gişt vê helbestê de, xwendevan bi xwendina vê helbestê hest bi awazeke dilgirtî dike, çunkî risteya (dibihîsim) wekî bihîstina zengeke aram e ku giyan û derûna xwendevanî pê şad dibe:

(Dibihîsim ku dinê

Gelek xweş û spehî ye

Welat bi gund û bajar

Aşitî û avahî ye

Dibihîsim ku kulîlk

Ke'be cihekî bilind e

Û gorna pêxember

Dibihîsim ku 'ezman

Tijî strî û rohnî ye

Dibihîsim ku dinê

Tijî rêl û kehnî ye

Dibihîsim ku dinê

Ne wek cemê min her reş e

Dibihîsim ku bihar

Bibûn û reng û geş e

Dibihîsim ku rohnî

Zanîn rewş e û dîtin) (r.154)

Risteya (dibihîsim) bi renekî estetîkî temamê avahiya vê helbestê xemlandiye, ev riste heft caran dubare bûye, wizeyeke bêsinor daye rîتما navxweyî. Ku wate risteya (dibihîsim) şiyaye bibe dînemoyê zalbûna rîتما navxweyî di nav teksta helbestê de.

Helbestvanî di helbesta “Bavo” de, tenê pişbestna xwe xistiye li ser dubarekirina risteyekê. Ew jî risteya (lê bavê min li ku ye) ye. Ev riste bi endazeke mikum û xursitî rîتما navxwe ya helbestê bi ciwantirîn şêwe afirandiye, binyateke hunerî ya yekcar serincrakêş û ciwan di nav helbestê de dirust kiriye, ev riste mîna dengvedanekê ye bo temamê helbestê:

(Xweş û hoynik buhar e

Bi gulinexwîn û bi dar e

Tev gulan û adar e

Lê bavê min li ku ye

Dikenin pal û çiya

Kesk bûne mêrg û giya

Dinê bi rewşa dinê şa

Lê bavê min li ku ye

Gund dikin qesra ava

Ne şer maye ne de'wa

Rojhelat û rojava

Lê bavê min li ku ye

Mal û xanî bi mêvan

Kerî bi pez bi şivan

Tejî bûk bûn daran

Lê bavê min li ku ye

Fêqî çêbû ne xav e

Deşt nemirî bi av e

Dinê geş e bi tav e

Lê bavê min li ku ye (r.151)

Ev şêwazê dubarekirinê erkê cîbicîkirina layenê sozdariya helbestvanî di nav peyama sereke ya helbestê de digihîne, çunkî helbestvanî bi rengekî dahênerane ev riste bo çendîn caran di nav helbestê de dubare kiriye. Ev girîngîpêdana helbestvanî bo dubarebûna risteyekê bo selmandîna şivanên xwe yê hunerî ne bo wergirî, da ku wergir hizir li wê çendê bike ku helbestvan dişê bi hemû şêweyan teknîka dubarekirinê di nav helbestên xwe de berceste bike. Risteya (lê bavê min li ku ye)

pênc caran hatiye dubarekirin, dema wergir vê helbestê dixwîne ev riste mîna muzîkeke xweş di guhên wî de tê jenîn û dengvedan.



ENCAM

Piştî dumahîkanîna vê vekolînê em gihîştine van encamên li xwarê:

1- Kamîran Bedirxanî bi renekî giştî teknîka dubarekirina fonîman di nav vê dîwana xwe de bi kar aniye. Rîtma navxweyî bi dubarebûna vê teknîkê bi baştirîn şêweyî hatiye afirandin. Rêja herî diyar ji teknîka dubarekirina fonîman jî dubarekirina tak fonîman e bi şêweyê asoyî û stûnî, di helbesta “Siltan Selahedîn” de, me ev çend selmandiye. Li dût vê teknîkine dîtir tên.

2- Helbestvanî mifa ji piraniya cureyên teknîka dubarekirina peyvan wergirtiye û ew di nav helbestên dîwana xwe de berceste kirine. Mîna dubarekirina peyvê bi şêwîn (asoyî, stûnî, dumahîka helbestê); belê teknîka dubarekirina peyvan li dumahîka helbestê, neşiyaye rûberekî berfireh ji helbestên vê dîwanê vegire. Rîtma navxweyî bi dubarebûna van gişt peyvan, bi şêweyekî rêkxistî hatiye afirandin.

3- Helbestvanî teknîka dubarebûna ristan di nav vê dîwanê de, bi şêweyekî serincrakêş dubare kirine. Derencam dewlemendiyek daye avakirina rîtma navxweyî, di helbesta “Neman” de, rêjeyeke yekcar mezin ji ristan dubare bûye.

4- Yek ji şêwazên herî diyar ên helbestvanî di teknîka dubarekirinê de encam dayî, dubarekirina bazineyî ye, ku helbestvanî di piraniya vê teknîkê de pirtir ji çend riste û derbirînên helbestê bo xizmeta avakirina bazineyî bi kar aniye. Rîtma navxweyî zal bûye di nav wan helbestên ev teknîk di nav de hatiye bikaranîn.

5- Helbestvanî bi awayekî hestiyane teknîka dubarekirina dengvedanê di nav vê dîwana xwe de bi kar aniye, zeng û dengvedaneke bihêz xistiye di nav binyata wan helbestan da. Çendîn wata û delaletên cuda cuda bi wan helbestan bexşiyê, hêz û vejeneke karîger daye rîtma navxweyî.

6- Helbestvanî di piranîya kiryara teknîka dubarekirinê de bo çendîn caran ew kiryar encam daye û ramanên kûr û berfireh bi helbestên dîwana xwe bexşîne.

7- Helbestvan yê serkeftû bûye di piroza teknîka gişt ew keristeyên zimanî yên dúbarekirîn. Wate ji encamê ewan teknîkan helbestvanî kêr û kasî ne êxstîye di nav hebestên dîwana xwe da. Ewe jî cextîyê di dete helbestvanîya wî û şarezaya wî di afrandina helbestê da.



ÇAVKANÎ

1- Pirtûk

A - bi zimanê kurdî

-Bîmar, Bdalirzaq, Kêş û Mosîqay Helbestî Kurdî, Çapxaney Dar Elhirye, Bixdad.1992.

- Balekey, Yadgar Resul, Sîmakanî Tazekirdnewey Şî'rî Kurdî (1898-1932), Dezgehê Spîrêz yê Çap û Weşanê, Dihok, Çapxana Wezaretê Perwerdê, Hewlêr, 2005.

- Bedirxan, Kamîran,(dîwan), Dlê Kurên Min, Têlî Emîn ji Tîpên Latînî Guhartîye û lê vekolîye, Dezgay Roşnibîrî Belawkirdnewey Kurdî, Bexda, 1991.

- Ehmed, Cîhan 'Ebdulwehab, Kamîran Bedirxan û Nwêkirdnewey Şî'rî Kurdî, Çapxana Xanî, Dihok, 2011.

- Ehmed, pexşan 'Elî, Şêwazî Şî'rî Goran, Melbendî Kurdolocî, Çapxaney Renc, Slîmanî, 2009.

- Emîn, Husên Xazî Kake Gelaleyî, Rewtî Nuykirdnewey Şî'rî Kurdî le Başûrî Kurdistan(1980-1991) Çapxaney Hacî Haşm, Hewlêr, 2010.

- Emîn, Husên Xazî Kak, Nwêkirdnewey Şî'rî Kurdî Le Salî 1932-1949 Le Kurdistanî 'Îraqda, Nawendî Blawkirdnewe, Hewlêr, Çapxaney Rojhlat, Hewlêr, 2008.

- Ehmed, Safye Mhemed, Şêwazî Şî're Kurdîyekanî Pîrbal Mehmûdweş. Yeketî Nûseranî Kurd Melbendî Gştî, Çapxaney Roj Helat, Hewlêr, 2014.

- Ehmed, Safye Mihemed,Ladan Le Şî'rî Hawçerxî Kurdîda, weş.Ekadîmay kurdî, Çapxana Hacî Haşm, Hewlêr, 2013,.

-Ebdulla, Helîma Xorşîd, Berawirdeyeka Kêşnasî Di Navbera 'Erûza Kurdî û Farsî (Dîwanên Melayê Cizîrî û Hafz Şîrazay) Wek Nmûne, Çapxana Xanî, Dihok, 2011.

-Ebdulrehman, Lihon Qadir, Dwalîzmî Dijyek le Honrawe Lîrîkîyekanî Mewlanay Romî û Mewlewî Tawegozîda, Nawendî Roşenbîrî û Hunerî Endêşe, Çapxaney Rcaiyî, Taran, 2014.

- Gerdî, 'Ezîz, Kêşî Şî'rî Klasîkî Kurdî û Berawirkirdnewey Legel 'Erûzî 'Erebî û Kêşî Şî'rî Farsîda, Lêkulîneweyekî Şîkarî Berawirde, Çapxaney Wezaretî Rewşenbîrî, Hewlêr, 1999.

- Gerdî, 'Ezîz, Rewanbêjî le Edebî Kurdîda, Bergî Duwem , Ciwankarî, Wezaretî Rageyandin, Çapxaney Şarewanî, Hewlêr, 1975.
- Gerdî, 'Ezîz, serwa, Lêkulîneweyekî Şîkarî Berawirde le Şîrî Kurdîda, weş.dezgay aras, çapxaney wezaretî roşenbîrî, hewlêr, 1999.
- Hsên, Cebare Ehmed, Îstatîkay Deqî Şîrîy Kurdî (Kurdistanî 'îraq 1950 – 1970), le Blawkirdnewey weş. Çap û Pexşî Serdem, Slîmanî, 2008.
- Hesenî, Yasrê, Binyatê Rîtmê di Ş'ra Nûya Kurdî da, (Devera Behdînan 1970- 1991) weş. Dezgehê Siprêz, Dihok, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 2007.
- Îsma'îl, Erselan Payz: Sîmay Şîrî Kurdî Dway Raperîn (1992-2002) be Nmûney Şî'rekanî Rojnamey Kurdistanî Nwê. weş.dezgay Çap û Pexşî Serdem, Slêmanî, 2002.
- Îbrahîm, Mihemed 'Ebdulkerîm, Pêkhatey Zimanî Şîrî le Rwangey Rexney Edebîy Nwêwe, Ezmûnî Şa'îranî Heştayyekanî Hewlêr Wek Nmûne, weş. Twêjînewe û Belawkirdnewey Mukiryani, Çaphaney Mukiryani, Hewlêr, 2012.
- Îzdidîn, Saman, Binyatî Hunerîy le Şîrî Letîf Helmet da, Çapxaney Kemal, Slêmanî, 2010
- Mihemed,Mihemed Bekir, Pexşane şîrî kurdî,çapxaney wezaretî perwerde, blawkirdnewey aras , hewlêr, 2004.
- Mhemed, Mihemed Bekir, Kêş û Rîtmî Şîrî Folklorî Kurdî, Dezgay Çap û weş.Aras, Hewlêr, 2004,.
- Mehmûd, Azad Ehmed, Bunyatî Ziman le Şîrî Hawçerxî Kurdîda, (Çapa2). weş.Ekadîmyay Kurdî, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012.
- Mihemed, Şaxewan Ferhad, Kurtîle Şîrî le Edebî Hawçerxî Kurdîda be Nmûne Deqekanî (Qubadî Celîzade, Letîf Helmet, Dilşad 'Ebdulla), weş. Yekêtî Nûseranî Kurd, Çapxaney Roj Helat, Hewlêr, 2014.
- Mihemd, 'Bdulqadir Hme Emîn, Binyatî Karnameyî le Deqî Nwêy Kurdîda, weş. Melbendî Kurdolocî, Slîmanî, Çapxaney Tîşk, 2008.
- Nihêlî, N'metulla Hamd, Plên Rexneyî Kumeka Vekulînaayî di Têksitîda, weş. Êketya Nvîserên Kurd tayê Dihokî, Çapxana Hawar, 2005.
- Nihêlî, N'metulla Hamd, Şêwazgerî, Tyorî û Praktîk Vekulîneke di Byavê Hozanêda, weş. Dezgehê Spîrêz, Dihok, Çapxana Hacî Haşim, Hewlêr, 2007.

- Reşîd, Mes'ud Cemîl, Rulê Tewrên Telbjartin û Rêzkirnî di Çêkirna Rîtma Hozana Klasîkya Kurdîda (Dîwana Melayê Czîrî) Wek Nmûne, weş.Ekadîmyay Kurdî, Çapxaney Hacî Haşm, Hewlêr,2014.
 - Reşîd, Mes'ud Cemîl, kêş û serwa di hozana kuraîada,dezgehê nalbend, dihok, 2017
 - Reşîd,Mes'ud Cemîl, Qonaxên Kêşnasîya Hozana Kurdî, Çapxana Xanî, Dihok, 2015.
 - Resûl, 'zedîn Mistefa, Edebyatî Nwêy Kurdî, Mitbe El'lîm a'îlî, Arbîl, 1989.
 - S.m.bundî, li Dûr Rîtmê, Wer. ji Rusî.'Ebdî Hacî, Wer. ji 'Erebî. Mes'ud Cemîl, weş.Çap û Belavkîrnê li Dihokî, Çapxana Parêzgeha Dihokê,2013.
 - Ustin Warîn û Rînî Wêlîk, Tîwrya Wêjeyî, wer. 'erebî.'Arf Hîto, weş. Êketya Nvîserên Kurd Tayê Dihokî, Çapxana Hawar, dihok, 2008.
 - Zamdar, Mihmud, Le Banîjey Şî'rewê, Komeley Roşnibîrî Kurdî, metb'e Crîde El'raq, Bixdad, 1981.
 - Xeznedar, M'ruf, Kêş û Qafye le Şî'rî Kurdî da, Mitbe Elufa, Bixdad, 1962.
- B- bi Zimanê Erebî:
- 'Aşur, Fihid Naêr, Altikrar fi Ş'ri Mihmud Deruyş, Eltib'e ula, Elmesise El'ribye Lîldrasat û Elneşir, 2004.
 - 'Bdalirhmin, Tbirmasîn, Elbinye El îqa'ye Elqside Elm'aêr fi Elczar, dar Elifcir Linişr û Eltuzî', Elqahre.bê sal.
 - 'Bdalqadir Eburîşe û Hesên Lafî Qizeq, Metxil îla Tihlîl Elnes Eledebî, Teb'e Elrab'e, dar Elfikir, 'Man,2008.
 - Cahiz, Elbeyan we Eltubeyin, (beré1) ,dar Elkutib Elulmîye, Beyrot Lubnan.1998.
 - Cîde, bdalhimîd, Elîtcahat Elcedîde fi Elş'ri El'rbî Elm'asêr, Eltib'e Eluwla,1980.
 - Dîb, Kemal Ebu, fi Elbinye Îqa'ye fi Elş'ri El'rebî, Neheu Bedîl Cisrî 'Rus Elxilîl û Miqdme fi 'lim Îqa' Elimqarin, Eltib'e Elsanye, dar El'lim Elimelayîn, Bîrut, 1981.
 - Elmusî, Xelîl, Qîret fi Ş'rye Elş'ri El'rbî Elhedîs (Mirhiltha laha û Alrumanisye), Eltib'e ula, dar Îbin Kesîr, Dmişq, 2001.
 - Elwertî, S'îd, Loxe Eş'ri El'rbî Elhedîs (Muqamatha Elnifsye û Taqatha Elîbda'î, Elteb'e Elsalîe, dar Elnesise El'ribye lîltîba'e û elneşir, Bîrut, 1984.

- Elbehrawî, Seyd, El'rus û Îqa' Elş'ri El'rbî, Mhawle Elîntac M'r îfe 'lmye, Dîrasat Edebye, Elheye Elmsiryê El'ame Elkîtab,1993.
- Elbehrawî, Seyd, Musîqa Elş'ri 'Nide Ş'ra Ebullu, kulye Eladab, Cam'e Elqahre.bê sal.
- Esîr, Îbin, Elmesel elzayr fî edeb, elkatib we elş'aîr, tehqîq muhyedîn ebdulhemîd, mekteb elezrîye, 1999
- Elqirwanî, Bin Reşîq, Elumde, Tebe2. Tehqîq. Ebdulhemîd Hindawî, Mekteb el ezrîye, 2001.
- Elucî, 'Bdalirhmin, Alîqa' fî Elş'ri Xeselî, Eltib'e Eluwla, dar Elhesad Lîlnişr û Eltuzî', Dîmişq,1989.
- El'yaşî, Mihimed, Neserye îqa' alş'ri al'rbî, elimtib'e al'êrye, tunis, 1976.
- Elmelayke, Nazik, Qezaya Elş'ri Elm'asêr, Eltib'e Elsanye, Mitb'e Dar Eltisamin, Bexdad, 1965.
- Fesil, Selah, Elneserye Elbînaye fî Neqîd Eladebî, Eltib'e Elsanye, dar Şiwon Elseqafye El'ame, Bexdad, 1987.
- Haşmî, 'Luy, Felsefe Îqa' fî Elş'ri El'rbî, Etib'e Elulî, Elmuesise El'ribye Lîldîrasat we Elneşir, Bîrut, 2006.
- Kuhîn, Cun, Binye Ellxe Elş'rye, Tircime: Mhimd Elwecî û Mhimd El'mrî, dar Tubqal lîlnişr, Elmixrib, teb'e eluwlî, 1986.
- Lutuman, Yurîrî, Tehlîl Elnes Elş'rî, Mihad Elneqdî, Tircime: Mihimd Ehmed Fituh, Eltib'e Ula, Elnadî Eledebî Elseqafî, Cide, 1999.
- 'Laq, Fath, Mefhum Elş'ri 'Nde Riwad Elş'ri El'rbî Elhir, Menşurat Îthad Elkîtab El'rib, Dîmeşq, 2005.
- Mibark, Mibark, M'cim Elmusteilhat Elelsinisye, dar Elifkir Ellbnanî, Bîrut, 1995.
- Suyîf, Mêtfa, Elusis Elnesysye Lîlbda' Elfeinî fî Elş'r Xase, Dar Elm'arif, elqahîre,1959.
- Salman, Mihimd 'Lwan, Elîqa' fî Ş'ri Elhdase Dîrase fî Elîqa, Dar El'lim û Elyîman llnişir û Eltuzî', Eleskindiryê, 2008.
- Talîs Eristu, Fen Alş'r, Tircime: 'Bdalirhmin Bduy, Altib'e Alsanye, Dar Elpqafe, Bîrut, 1973.

- Ubeyd, Mihemd Sabir, Elqesyîde El'ribye Elhidîse Byîne Elbunye Edelalye û Elbinye ElÎqa'ye, Minşurat Îthad Elkutab El'rib, Dîmeşq, 2001.
- Warîn, Wistin û Wîlk, Rînye, Nezrye Eledeb, Tircme: Mhîyedîn Êbhî, Elimclis Ellîlî lir'aye Alifnun û Eledeb û El'lum Electuma'ye, Dimeşq, 1973.
- Wehbe, Micdî û Elmuhindis, Kamil, M'cim Elmustelhat El'erbîye fî Elulxetî û Eledeb, elteb'e Elsanye, Mekteb Libnan, Bîrut, 1984.
- Xanî, Mihimd, Elmstilhat Eledîbye Elhidîse Dîrase û M'cim Înglîzî- 'Rbî, Eltib'e Elsalse, Elşîrîke Elmêsrye El'alemye Lînişr, 2003.

C- bi Zimanê Farisî:

- Dad, Sîma, Ferhingî Îstîlâhat Edebî, Çap pincim, Întişarat Mirwarîd, Tihran, 1390.
- Sefewî, koroj, Ez Zibanîşnasî Bê Edebyat Înşaratê, Buhar, Tehran, 1373.
- Zade, 'Bdilmicîd Hsînî, Mebanî Hunirhay Tecisimî, Qisimit Ewil, Şirkit Çap Kitabhay Dersî Îran, Tihran, 1382.
- Tezên Master û Doktorayê:

A- bi Zimanê Kurdî:

- Hesên, Befrîn Reşîd, Şî'rîyeta Zimanê Hozanê di Hozanên (Mihsin Quçanî) da, Nama Masterê, Kulîja Perwerda Binyat, Zankoya Dihok, 2016.
- Miuhemed, Dilşad 'Elî, Binyatî Helbest le Hunrawey Kurdî da, Namey Diktora, Kulîjî Adab, Zankoy Selaheddîn, 1998.

B- BI Zimanê Erebî:

- Asye, Dahu, Elîqa' Elm'newî fî Elsure Elş'rye (Mihmud Derwêş) Nimusecen Rîsale Macsîfîr, Kulye Eladab, Cam'e Hesîbe Bin bu 'Lî, 2009.
- 'Bude, Hisîn, Eltibî'e fî Elş'r El'rbî Elm'asêr, Rîsale Macsîfîr, Kulye Eladab, Cam'e Elbesre, 1984.
- Busenndil, Kerîme, Cemalyat Elxîtab Elş'rî 'nid (Nuraldîn Derwêş), Rîsale Macsîfîr, Kulye Eladab, Cam'e Misturî, 2011.
- 'Bude, Hisîn, Altibî'e fî Elş'ri El'rbî Elm'aêr, Rîsale Macsîfîr, Kulye Eladab, Cam'e Elbesre, 1984

- Derwêş, Hamid Salim Elirewaşde, Elş'rye fî Elneqîd El'rbî Elhedîs (Dîrase fî Elneserye û Eltetbîq), Utruhe Dikturae, Kulye Eluxat , Cam'e Mote, 2006.
- Elhulî, Feysel Hisan, Lîtkrar fî Eldîrasat Elnqedye Beyne Elesale û Elm'asir, Rîsale Macisitîr, Kulye Eladab, Cam'e Mote, 2011.
- Elhyse, Mihemed Xalid 'Wad, Elbîna Elfenî fî Ş'ri 'Mer Ebu Rîşe, Rîsale Macsitîr, Kulye Eladab, Cam'e Elşeriq Elewsed, 2011.
- Fethula, Şahu Sîd, Delalat Elbîna Elîqa'î fî Elş'r, Dîrase Muqarne fî Eledeb El'rbî û Elfarsî û Elkurdî, Rîsale Macsitîr, Kulye Elluxat, Cam'e Elsilîmanyê, 1999.
- Hemade, Mihemed Kemal Silêman, Elxîtab Elş'rî 'nid Îbin Hemdîs Elseqlî (Dîrase Îslubye), Rîsale Macsitîr, Kulye Eladab, Cam'e Elîslamye - Xeze, 2012.
- 'Lî Zeruqî, 'Bdulqadir, Esalîb Eltîkrar fî Dîwan (Serhan Yeşrib Elqehwe fî Elkaftirya) lî Mehmud Derwêş (Miqarne Îslubye, Rîsale Macsitîr, Kulye Eladab, Cam'e Elhac Xisir, 2012.
- 'Mran, 'Bid Nur DAwId, Elbinye Elîqa'ye fî Ş'ri Elciwahrî, Etruhe Diktura, Kulye Eladab, Cam'e Elkufe, 2008.
- Rihmanî, Qidur, Binye Elxîtab Elş'rî fî Elfituhat Elmekye Lîbin 'Rbî, Rîsale Macîstir, Kulye Eladab, Cam'e Elcezayr, 2006.
- Rebu, Nî'me, Zahîre Eltîkrar fî Elş'r Elhir 'nid Nazik Elmelayke mîn Xîlal Kîtabiha Qezaya Elş'r Elm'asir, Rîsale Macsitîr, Kulye Eladab, Cam'e Qasidî Miryah – Werqe, 2015.
- Selîm, Mixtar, Eltîkrar ellefzî fî Ş'r Elneqaîz Cerîr û Elfirzdeq, Nimuzece, Dîrase Îslubye, Rîsale Macîstir, Kulye Adab, Cam'e Qasidî Mirbah Werqe, 2010.
- Weqad, Mes'ud, Elbinye Elîqa'ye fî ş'r Feduy tuqan, Rîsale Macsitîr, Kulye Eladab, Cam'e Werqe, 2004.
- Weqad, Mes'ud, Cemalyat Elteşkîl Elîqa'ye fî ş'r 'Bdilwehab Elbeyatî, Dîrase fî Elcizur Elcemalye Lîlîqa', Etruhe Diktura , Kulye Eladab, Cam'e Elhac Lîxzir Batîne, 2011.

3- Kovar

A- bi Zimanê Kurdî:

- Alîxan, Pêzanê, Profîsorê Kurd. Kamîran 'Alî Bedirxan, Govarî Karwan, Hijmare 13, 1983.

- Bekir, Mihemed, Mihemed, Edgarekanî Nwêkirdnewe le Şîrî (Rehmî Hekarî)da, Govara Zankoya Dihok, Berbenda Duwê, Hijmara Şeş, Çirya Êkê, 1999.
 - Bekir, Mihemed, Mihemed, Harmonya (Rîtim) û (Wata) yê, di Hozana (Czîrî)da, Govara Peyv, Hijmara 31, Êketya Nvîserên Kurd Tayê Dihokê Derdîxît, 2004.
 - Casmî, Salmê, Mîr Kamîran Bedirxan Jîyekê Drêj û Xebateka Mezn, Govara Havîbun, Govara Lêkolînên Kurdîye, Hijmare18, 2007.
 - Balayî, Fehmî, Rîtim di Helbest û Şewekaryê da, Govara Havîbûn, Hijmare 18, ji Navenda Havîbûn ya Lêkulîn û Weşanên Kurdî li Berlîn der di kevît, 2007.
 - Îsmâ'îl, Fehîma, Rîtim Dinavbera Hunerî û jyanê da, Govara Peyv, Êketya Nvîserên Kurd Tayê Dihokê Derdêxît, Hijmare 23, 2002.
 - Hesenî Yasrê, Dînamîkya Runahî û Taryê di Avakirna Rîtma Ş'rî da (Sitran û Bevir û Agir) Wek Nimûne, Govara Peyv, Hijmara(65), Êketya Nvîserên Kurd Tayê Dihok derd êxît, 2012.
 - Qeredaxî, Enwer, Îqa' û jîyan, govara karwan, Hijmare 64, Çapxaney (Dar Elhirye) Bexdad, 1988.
- B- bi Zimanê Erebî:
- Elsekir, Hatim, Elîqa' Eldaxlî, Micele Eleflam, El'ded (5), Bexdad, 1990.
 - Hnî, 'Bdulletîf, Nesîc Eltîkrar Beyne Elcemalye û Elwezîfe fî ş'r Elşuheda Elcezaîrîn Dîwan Elşehîd Elrebî' Buşame Nimuzecen, Micle 'Lum Elluxe El'ribye û Adabuha, El'ded (4), Minşurat Cam'e Elwadî,
 - Kelab, Mihimed Mistef, Binye Eltîkrar fî ş'r Edunîs, Micle Elcam'e Elîslamyê Lîlbhus Elînsanye, Elimceled Elsalis û El'srun, El'ded(1), 2005.
 - 'Lî Zeruqî, 'Bdalqadir, Cemalyat Eltîkrar û Dînamyê Elm'na fî Elxîtab Elş'rî Nemazic mîn Ş'r Mihimed Bilqasm Xemar, Micele Eleser, El'ded (25), 2016.



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**KAMÎRAN BEDİR XAN’IN *DİLÊ KURÊN*
MIN ADLI DİVANINDAKİ
ŞİİRLERİNDE İÇ RİTMİN
OLUŞTURULMASINDA TEKRAR
TEKNİĞİ**

HARIWAN MOHAMMED AHMED

15711019

Danışman

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Mardin 2017